


HELWEST

Kovara Çand û Edebiyata Kurdi


RONESANSA KURDI

Di vê hejmarê de
nivîsên nivîskarêne Kurd
Şahîn B. Soreklî
Hesenê Metê
Aram Gernas
Lokman Polat
Zana Farqînî
Latîf Ozdemîr
N. Zaxûranî
Ehmed Şerîfî
Senar Şahîn
Adîl Duran
Suleyman Demîr
û gelekêne din hene.



Nivîsa Demîr Ozlu
Nivîsa li ser August
Strîndberg , Jiyan û
berhemêne Puşkîn,
Danasîn û analîza
pirtûkêne Kurdî
Danasîna kovar,
pirtûk, rojname û
nivîskarêne Kurd
Li ser roman û ro-
mannivîserêne Kurd
Li ser edebiyata
Kurdî hevpeyvîn
Edebiyat û Zanyarî

DÎMENEK JI RONAKBÎRIYA KURDI



HELWEST

Kovara Çand û Edebiyata Kurdî

Utgivare
Modern Kultur Förlaget

Xwedî
Weşanên Çanda Nûjen

Ansvarig/Berpirsiyar
Birêvebirê kovarê
Lokman POLAT

REDAKSIYON

N. Zaxûranî
Gabar Çiyan
Dawê Xanê
L. Polat
K. Ronî

Hejmar : 4

Sal : Hezîran - 1996

Çap : Baran Trykerî

Abonetî

Salek : 170 Kr.

Postgîro : 9 13 31 — 9

ISSN — 1400 - 9404

Berpirsiyariya her nivîsê, ya
nivîskarê wê ye.

Navnîşan / Adress:

Tensta Alle 43 - 2tr.
16364 Spånga /Sweden
Tel / Fax:08-7618433

NAVEROK

- * 2 - Kovarek Akademîk.....
- * 5 - Ronesansa Kurdî.....
- * 10 - Ronakbîriya Kurdî.....
- * 21 - Rewşenbînî
- * 26 - Nivîskarî.....
- * 29 - Zanyarî û Metod.....
- * 30 - Edebiyat û Zanyarî.....
- * 35 - Romannîvîser.....
- * 38 - Nivîsa Demîr Ozlu.....
- * 42 - Hozan Dilpêt Jêlî.....
- * 44 - Ziman û Zarav.....
- * 57 - Hevpeyvîn.....
- * 84 - Agust Strînberg.....
- * 89 - Li ser Puşkîn.....
- 94 - 110 - Danasîna Pirtûkan.....

Dhejmara 5an de, dê redaksiyona kovarê hinek ji xurt bibe. Çend nivîskar dê li redaksiyonê zêde bibin. Em ji niha ve, xêrhatina wan nivîskarên hêja dikin û ji hemû endamên redaksiyonê re sipas dikin.

Wan bi nivîsên xweyî cûrbecûr kovara Helwestê bi rengîn kirin. Wan bi besdariya nav redaksiyona kovara Helwestê, barê Redaksiyona kovarê hîn sivikirî kir in, Redaksiyonê xurtir kirin û herweha kovar ji dê ji alî naveroka xwe ve dewle-mendit bibe. Di hejmara 5an de, dê xwe nûh kirinê bingehîn hebin. Li benda hejmara 5an bin.

Hetanî hejmara 5an hûn bimînin di xweşiyê de.

HELWEST DIBE KOVAREK AKADEMÎK

Bi vê hejmarê ve kovara Helwest salekî xwe qedand, kete sala duyem. Di sala duyem de (ji hejmara pêncan pêve) kovara Helwest dê bibe kovarek akademîk a çand û edebiyata Kurdi. Ji bo çand û edebiyata Kurdi kovarek akademîk pêwîst e. Kovar tiştên rojane nanivîsinin, tiştên ku di kovarê edebî de tê weşandin heger nivîsên îlmî-zanîstî be 50 sal paşê ji bi hêsanî dikare bê xwendin, wek referans dikare bê nişandan.

Em dê li ser çand, edebiyat, folklor, huner, dîrok, fel-sefe û zimanê Kurdi nivîsên lêkolînî yên îlmî-zanîstî biweşînin. Ji bo fêrbûn û zanebûna çandî, edebî, nivîsên li ser çand û edebiyatê, nivîsên ku mirov bixwîne û jê tiştan fêr bibe, em dê biweşînin. Li ser pirs û pirsgirêkên ronakbîriyê (rewşenbîriyê) nivîsên bi kalîte dê bêne weşandinê. Li ser rewşa edebiyata Kurdi, li ser helbest, çîrok û romanê Kurdi dê gelek nivîsên baş bêne weşandinê. Li ser berhemên Kurdi yên edebî dê analîza bêne kirin. Di her hejmarî de, dê danasîn û analîza pirtûkan bête kirin. Folklora Kurdi gelek dewlemend e. Em dê çend nivîsên li ser zanyariya folklorîk, biweşînin.

Nivîskar û lêkolînvanên kurd, divê alîkariya kovara Helwestê bikin ku em bikaribin kovara Helwestê bi rastî ji bikin kovarek akademîk ya çand û edebiyata Kurdi. Ji bo kovarek akademîk divê çawan be?, em li benda pêşniyazên xwendevan û nivîskarên Kurd in.

Edebiyat bi xwe îlim e, zanîstî ye. Pêşveçûna îlmê edebiyata Kurdî bi kar û xebata akademîk ve girêdayîye. Divê ev kar û xebat bê kirin. Nivîsên teorîk yên li ser çand û edebiyatê divê bêne weşandin. Nivîskar Xelîl Sîpan (ku di hêla nivîsên teorîk de gelek jîr e) jî bi nivîsên xwe ve dê di her hejmarê de başdarê nav rûpelên kovara Helwestê bibe.

*
* *

Nivîskar Şahîn B. Soreklî, li ser ziman nivîsek îlmî-zanîstî nivîsiye û ji Avusturâlîyayê ji kovara Helwestê re şiyandîye. Em vê nivîsê di vê hejmarê de diweşînin. Em li benda nivîsên wî yên din in. Ji bo kovarek bi naveroka xwe dewlemend, kovarek îlmî-zanîstî, pêwîstî bi nivîsên wek nivîskar Şahîn B. Soreklî û hwd, bi gelek nivîskaran heye.

*
* *

Dî van demêñ dawîn de, di masmedîa Kurdan de li ser rewşa ronakbîran (rewşenbîran) gelek munaqeşe tête kirin. Di MED TVê de du panel hate çekirin. Di rojnameya "Ozgur Politika" de li ser vê babetê her roj nivîs tête weşandin. Hinek nivîs baş in, lê gelek nivîs jî bêqalîte ne, nivîsên bêsewîye ne. Di vê hejmara kovara Helwestê de nivîsek li ser babeta ronakbîriyê (rewşenbîriyê) heye. Nivîskar N. Zaxûranî, li dîtinêñ hinek nivîskarêñ rojnameya Ozgur Politika'yê rexne digre. Nivîskar A. Gernas jî lêkolînekî zanîstî li ser ronakbîriya Kurdî kiriye. Ew di oïrsa ronakbîriyê de rastî û çewtiyan datîne holê. Nivîsa A. Gernas nivîsek balkêş û gelek girîng e. Em dê nivîsên li ser pirsa rewşenbîriyê di hejmarêñ pêş de jî biweşînin.

*
* *

Lî ser babeta "Ronesansa Kurdî" jî munaqeşe têne kirin. Li gor hinekan ronesansa Kurdî heye, li gor hinekan jî tune ye. Nivîsa li ser "Ronesansa Kurdî" ji bo munaqeşeyan destpêk e. Divê li ser Ronesansa Kurdî jî munaqeşe bê kirin.

*
* *

Di cîhana nivîskarên Kurd de, vêca nivîskar Ehmed ŞERÎFÎ cîh girtiye. Ew ji Kurdistana rojhilat e. Niha di **Mehabatê** de dijî. Me bi wî re li ser rewşa edebiyata Kurdî hevpeyvînek jî çêkir. Em dê vê hevpeyvînê di pirtûka “**Rewşa Edebiyata Kurdî - Cild : 1**” de biweşînin.

*
* * *

Di vê hejmarê de du hevpeyvîn hene. Hevpeyvîna yekem bi nivîskarê rojnameya **RONAHÎYÊ** Latîf Ozdemîr re ye. Hevpeyvîna duyem jî bi nivîskar û berpirsiyare rojnameya **AZADIYA WELAT**, Zana FARQÎNÎ re ye.

*
* * *

Di hejmara şan de, dê redaksiyona kovarê hinek jî xurt bibe. Çend nivîskar dê li redaksiyonê zêde bibin. Em ji niha ve, xêrhatina wan nivîskarê hêja dikin û ji hemû endamên redaksiyonê re sipas dikin. Wan bi nivîsên xweyî cûrbecûr kovara Helwestê bi rengîn kirin. Wan bi beşdariya nav redaksiyona kovara Helwestê, barê Redaksiyona kovarê hîn siviktir kir in, Redaksiyonê xurtir kirin û herweha kovar jî dê ji alî naveroka xwe ve dewlemendir bibe.

Di hejmara şan de, dê xwe nûhkîrinên bingehîn hebin. Li benda hejmara şan bin. Hetanî hejmara şan hûn bimînin di xweşiyê de.

Kovara HELWEST

RONESANSA KURDÎ

AGAHDARIYEK KURT

Rojnameyên Kurdan yên ku li Stenbolê têne weşandinê, ji alî mehkemê (Dadgehê) ve têne qedexekirin û ji alî polîs ve jî têne civandinê. Min vê nivîsa li jêr 2 sal berê nivîsandibû û ev nivîs di rojnameya hefteyî JIYANA NÛ de hatibû weşandin. Lê ew hejmar ji alî dadgehê ve hatibû qedexekirin û komkirin. Ji bo ku îro jî hêj gelek kes li ser pîrsa Ronesansê munâqeşe dîkin –hinek dibêjin ronesansa Kurdî heye, dest pê kirîye, hinek jî dibêjin na, ronesansa Kurdî tune ye, an jî dest pê nekiriye– min hewce dît ku ez vê nivîsa xwe ya kevn carekî din ji nûh ve biwesînim. Tiştên ku min du sal berê nivîsiye, li gor min îro jî rastiya xwe didomîne. Min nivîsê qet neguhart. Di wê demê de min çawan nivîsibû, min nivîsê weha hêst e. Nivîsê pêşkêşê xwendevanan dikim.

Lokman POLAT

RONESANSA KURDÎ DI KÎJAN MERHALEYÊ DE YE?

Ronesans çiye? Pêvajoyek çawan derbas kirîye? Li Ewropayê Ronesans kîngê û çawan derketiye? Hunera Ronesansê li ser cîvakê ci tesîr(hînkarî) kirîye? Ji bo guherandina cîvakê rolêk çawan leyistiye û li Kurdistanê (Kurdistana Bakûr) Ronesansa Kurdî kîngê dest pêkiriye û nûha Ronesansa Kurdî di kîjan merhaleyê de ye?. Ez dê di vê nivîsa xwe de bi kurtayî bersîva wan pîrsên jorîn bidim û li ser Ronesansa Kurdî şîrove bikim. Ez dixwazim ewil bi Ronesans çiye dest pê bikim.

RONESANS ÇÎYE?

Ronesans ji bo cîvakê wek tîrêjên rojê, ronahiyeck e. Ji bo pêşveçûna cîvakê Ronesans rolek gelek girîng leyistiye. Ronesans di hêla îlmî, felsefî û hunerî de şiyarbûnêk e, zanîstî ye. Ji nûve wejîn e. Ronesans li Ewropayê ji dema feodaliyê derbasbûna dema cîvaka burjuvaziyê ye. Ronesans hejandina dêrê(kilise) û bi cîhanîna pêvajoya netewebûnê ye. Di bingehê

Ronesansê de însaniyetî(humanîzm) heye. Vatîniyên însan xwe bi zanînkirin e, xwe pêştebirin e. Divê însanê nûh pirralî û zana be. Bibe xwediyê ramanê azadî, bibe zimanzan, bibe hunermend û hwd.

Destpêka pêvajoya Ronesansê û hetanî iro hat xwiyakirin ku, aqilê însan(mirov) dikare her tiştî bipişkifinê. Wejîndina însanên nûh, baweriya însan bi însaniyetiyê(bi mirovahiyê) qihîm kir. Bi kurtî Ronesans hisyarî ye, ji nûh ve vejîn e, ronahî ye.

HUNERA RONESANSE

Di hêla hunermendiyê de Ronesans rolek gelek girîng leyistiye. Li riyê dînyayê(Cîhanê) gelek huner hebûne. Hunera dewra berê, hunera Yunan, hunera Roma û gelekê din. Wan huneran, hemûyan jî dewra xwe qedandine ketine nav rûpelên dîrokê. Lê, hunera Ronesansê, ev bûye 600 sal ku hêj jî dijî. Hunera Ronesansê vê berdewamiya xwe ji lêgerîna huviyeta nûh, yanê ji xwenûhkîrnê re deyindare. Lewra huner, bi zanîstiya îlmî, bi teknolojiyê, bi felsefe û bi ramanê va girêdayî ye, bi dînamîzma cîvakê ve girêdayî ye. Loma jî weha dûr û dirêj dijî û berdewam dike.

Hunera Ronesansê di sedsala XIV.(çardeh) de, li İtalya'yê, li herêma FloraNSA'yê ji alî Gioto Bendone dest pê dike. Û paşê bi alîkariya Leonardo, Michelangelo, Raphael, berfireh dibe.

Di hêla wêneçêkirinê(resim), mihendîsiyê, mîmariyê, heykelçêkirinê û teknîkê de gelek pêşveçûn dibe. Zanîstî, îlim pêşve diçe. Di hêla jeolojiyê de lêkolînên girîng têt kirin. Hunermend Michelangello di hunera wêneçêkirinê de îradeyek nûh derdixe holê.

Ronesans li welatên bakûrê Ewropa û yên din jî belav dibe. Di Holanda û Almanya'yê de hunera Ronesansê pêşve diçe, tevgera reformê dest pê dike. Hunera Ronesansê di şoreşa Fransa'yê de rolekî girîng dileyize. Di wê demê de Romantîzm dest pê dike. Werhasil ji destpêkê ta iro hunera Ronesansê her tim xwe nûh dike, pêşve diçe û loma jî tê jiyandinê.

RONESANSA KURD

Di dema me de Kurd di pêvajoyek gelek girîng de derbas dibin. Kurd di her warî de Ronesanek dijîn. Di hêla siyasî û çandî de pêşveçûnên baş hene. Di hêla ziman, çand, huner û edebiyatê de Kurd dema xwe ya Ronesansê dijîn. Ev jiyandin di hêla lêgerîn û lêkolîna ziman, çand, wêje û dîrokê de xwe bi hawakî vekirî dide nîşandan.

Têkoşîna gelê Kurd her diçe geş dibe, berfireh dibe. Kurd hem dîroka xwe dijîn û hem jî dîroka xwe çêdikin û dînivîsinin. Li ser dîroka Kurdan, berê bi gelempêrî yên biyanî, nivîskarê Ewropî pirtûk divîsandin. Lê, di dema me de, vêga ew nivîskarê ku ji nav gelê Kurd derketine, dîroka gelê Kurd dînivîsinin.

Di hêla lêkolîna dîrokî de, Kemal BURKAY, Hasan YILDIZ, Nacî KUTLAY, Rohat, Huseyin BEYSULEN, Torî, Etem XEMGÎN, İsmail GULDAŞ, Cemşîd BENDER, Osman AYTAR, M. KALMAR, Botan AMEDÎ, Şerefxan CİZİRÎ, M. MIHOTOLÎ, Osman AYDIN û Malmisanij, wek nimûne, lêkolînvan û dîrokzanen Kurd in.

Li ser zimanê Kurdî jî gelek lêkolîn têt kirin, nivîs û pirtûkên hêja têt weşandinê. Ev kar û xebat ji bo pêşteçûna ziman rolek girîng dileyize. Rojname û kovarê Kurdan jî di vê hêlê de vatîniyêng gelek girîng tînin cîh.

Ji bo romana Kurdî a nûjen jî, di serî de birêz Mehmed UZUN xebatек gelek hêja û girîng dike. Ji bo avakirina berhemên edebî, ji bo pêşveçûna nivîsên edebî, ji bo çîrok û romana Kurdî, di serî de Mehmed UZUN, Firat CEWERÎ, M. BAKSÎ, Nacî KUTLAY, HESENÊ METÊ, Lokman POLAT, Xemgîn Temê, Ahmed Huseynî û bi sedan nivîskarê Kurd yên din xebatêng gelek girîng dikin. Berhemên baş derdixin holê.

RONESANSA KURDÎ DI KÎJAN MERHALEYÊ DE YE?

Ronesansa Kurdî, îro di merhela duyem de ye. Merhaleya yekem ji sala 1974'an dest pê kiriye. Di sala 1980'yî de pêsiya wê hatiye birandin. Merhaleya duyem di sala 1988'an de dest pê kiriye, lê di salên 1990'i de gihîştiye kemala xwe.

Min li jor jî nivîsandibû; Ronesans ji bo cîvakê wek tîrêjên rojê, ronahiyek e. Ronesans, xwendin e, zanîn e jî. Xwendin û zanabûna siyasî, îlmî, aborî û felsefî bi saya weşanên Kurdî hatiye fêrkirinê. Rojname û kovarê Kurdî yên ku di nabeyna salên 1974 û 1980'yî de hatibûn weşandinê, di hêla li xweyî derketina huviyetta mîllî (Netewî), ji bo pêşveçûna ziman û çanda Kurdî, ji bo pirs û pirsgirikên netewayî, ji bo xweyî lêderketina doza Kurd û Kurdistanê, gelek vatîniyêng girîng hanîn cîh.

Dojnama “Roja Welat” û “Ciwanêن Şoreşger û Demokrat” de, di kovara “Riya Azadî”, “Rizgarî”, “Têkoşîn”, “Kawa”, “Pêşeng”, “Ala Rizgarî”, “Xebat” û “Azadî” de, delek nivîs û lêkolînên balkêş hatin weşandinê. Xwendevanê Kurd wexta ku van weşanên Kurdan dixwenden zanabûna xwe pêste dibirin, çand û dîroka xwe fêr dibûn. Di hêla ziman da jî kovara “Tîrêj – Ev kovar xwerû bi zimanê Kurdî bû” – û kovarên Kurdan yên ku li jor min navê wan nivîsand, beşen wan yên Kurdî (Ew kovar hemû bi du zimanan, bi Kurdî û Tirkî derdiketin.) ji bo xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî gelek kar û xebatên hêja kirin.

Roman û destanên Kurdî di wê demê de derketin. Li ser dîroka Kurd û Kurdistanê, li ser rewşa cîvakî û aborî ya Kurdan gelek lêkolîn û pirtûk hatin weşandinê. Sînet û çanda Kurdî, wênekariya Kurdî ber bi pêşve çû. Şûûra mîllî, hisêñ Kurdi, dîtin û ramanên welatperwerî û şoresgerî ji nûh ve jîn da, di nav gel de belav bû, bi berfirehî pêste çû.

Gava mirov li dîroka Kurdistanâ bakûr mîze dike, di hêla şiyarbûna netewayî û weşandina weşanên Kurdî de Ronesanek hatiye jiyan din. Jiyan dina vê Ronesansê ji bo guherandina cîvakê rolêk girîng leyistiye. Potansiyelêk berfireh çekiriye.

MERHALEYA DUYEM

Ronesansa Kurdî, merhaleya duyem li ser vê potansiyela berê û bi tesîra şerê çekdarî di sala 1988'an de dest pê kiriye. Di destpêka merhaleya duyem de şerê çekdarî rolekî girîng û sereke leyistiye, tesîrek mezin kiriye. Her çiqas şerê çekdarî di sala 1984'an de dest pêkiriye jî, di sala 1988'an de gihîstiye kemala xwe. Li ser cîvakê tesîre mezin kiriye. Di vê pêvajoyê de cîvakê hisê tirsonekiyê ji ser xwe avêtiye. Gel ji malên xwe derketiye, li doza xwe ya netewayî xwedî derketiye, li dij dagirkeran meşen girseyî çekiriye, serîhildaye. Tesîra şerê çekdarî ji bo şikandina zincirên tirsê jî rolêk girîng leyistiye. Ronakbîrên Kurdan jî di vê demê de tawa tirsbûniyê ji ser xwe avêtine û dengê xwe bilind kirine.

Destpêka weşanên Kurdî, bi hawakî eßkere di sala 1988'an de dest pê kiriye. Di vê salê de cara yekem kovara “Medya Gunesî” dest bi weşanê kiriye. Ev kovar bê tirs, bi cesaret li ser pirsa Kurdî sekiniye, û hinek

rûpelê xwe ji bi Kurdî weşandiye. Dure kovara “**Ozgur Gelecek**” “**To-plumsal Dîrlîş**” û “**Vatan Gunesî**” dest bi weşanê kirin. Di nav wan kovaran de kovara herî qels û tirsonek kovara “**Ozgur Gelecek**” bû. Vê kovarê hêj ji zimanê “**Ezop**” bi kar daniyan, ji Kurdistanê re digot «Dogu ve Guneydogu». Kovara “**Vatan Gunesî**” di hejmara xwe ya yekem de li dij bi karanîna zimanê “**Ezop**” derket û ji welatê me re bi navê wê yê eslî, yanî Kurdistan got.

En pirr di salên 1990 û 1994'an de, kovar, rojname û pirtûkên Kurdî hatin weşandinê. Ji pênc sedî (500) zêdetir pirtûk hatin weşandinê. Kovarê xwerû bi zimanê Kurdî “**Rojname**”, “**Welat**”, “**Zend**”, (û nûha ji “**Welatê Me**”) di vê demê de hatin weşandinê. Rojnamên rojane “**Ozgur Gundem**” û “**Ozgur Ulke**”, Rojnamên hefteyî; “**Newroz**”, “**Azadî û Dengê Azadî**”, “**Jiyana Nû**”, “**Realîte**” Kovarê bi zimanê Kurdî û Tirkî; “**Serketin**”, “**Hevdem**”, “**Stêrka Rizgarî**”, “**Ozgur Halk**”, û “**Rewşen**”, derketin.

Di hêla hunerê de gavêne pêş hatin avêtin. Ji bo lêgerîn û lêkolîna dîroka Kurd û Kurdistanê, kar û xebatêna baş hatin kirin, berhemên gelek girîng hatin afirandin. Ji bo çand û edebiyata Kurdî, xizmetêna baş hatin kirin û hêj ji têt kirin. Hunermendiya wêneçêkirinê ji alî “Yekitiya Hunermendan-Komel” û hunermendêna MKM'yê va gelek pêste diçe. Kar û xebatêna ku li Ewropa ji alî Kurdan ve têt kirin—Ku ez di vê nivîse de qet li ser nesekiniyam— pêvajoya pêştaçûna Ronesansa Kurdî hîn ji dewlemendtir dike. Di vê demê de hunermendêna Kurd hîn zêde bûne, hunera Kurd hîn dewlemend bûye.

Pêvajoya merhaleya duyem a Ronesansa Kurdî hêj berdewam dike. Merhaleya sêyem ji, dê di Kurdistanek azad de dest pê bike.

Lokman POLAT

DÎMENEK JI RONAKBÎRIYA KURDÎ

A. GERNAS

Di van demêñ dawî da gengeşîyeke xurt li ser mijara ronakbîr û ronakbûnê tête kirin. Munaqêsekirina vê mijarê tişteke xuristî ye, lewra di jîyana civata Kurd da pir tişt serûbin dibin. Di bingeha me ya çandî û civakî da guhurînên bi lez çê dibin; bûyerên ku li welatê me diqewimin, siyaset û şerê ku li hember gelê me tê ajotin û guhurînên bingehîn ên li dinyayê diqewimin, pêvajoyeke nû anîye meydanê. Nûjenbûna kevnîyê bi her awayî xwe dide pêş û ev nûjenî di hemû warêñ jîyanê da bi zordayîneke bêşewat zerpa xwe nîşan dide. Di zaniyarîyê da cîh ji zanîneka bi rik ra tuneye, herwisa cîh ji siyaset, avahîya çandî û civakî ya kevneşopî ya bi rik ra jî tuneye. Ya meriv xwe nû dike yan jî ji hevdemîyê dûr û paşdamayî dimîne û bi vî awayî hukumdarîya xelkê ya li ser xwe hêsan dike.

Di nûjenbûnê da rola ronakbîran gelek zêde ye. Di welatê paşdamayî û kolonî da di destpêkê da xwende û ronakbîr pêşengîya vê nûjenîyê dikan; bi fikir û ramanê xwe yên dûrdîtî, rê nîşanî xelkê didin û ji xelkê xwe ra bing-eheke ramanî û ideolojîk peyda dikan. Herwisa di warê çandî, edebî, hunerî û civakî da jî rêberîyê dikan, xelkê rohnî dikan, hest û sekolojîyeke neteweyî peyda dikan. Gelo rewşa ronakbîrên welatê me wêneyeke çawa derdixe pêşberî me û şirovekirinên ser ronakbîr, rola wan, cîh û xebatê wan di nav gel da bi ci awayî têñ pêşkêşkirin? Di vê nivîsarê da em ê li ser vê mijarê bisekinin.

Berî her tiştî têgihîştina me ya derbarî ronakbîr û ronakbûnê ci ye, li welatê me û li dinyayê rave û tarîfîn derbarî vê mijarê da bi çawayî têñ kirin?.. Bi maneya xwe ya rastî û hevdemî, dema ku însan bi xwe ra dikeve muhasebeyek û xwe dide ber van pirsîyarîyan : Ez ci me, li dinyayê û li welatê min cîhê min ci ye; û ez kî me, ez ci dikarim bo pêşeroja gel û welatê xwe bikim, wezîfeyêñ dikevin ser milê min ci ne?.., ji bo ronakbîrî gavê pêşî tê avêtin. Pirsîyarîyen weha li ba merivêñ nezan û nexwenda gelek bi derengî dest pê dike, lewra fam û feraset û zanebûna wan têrî van pirsîyarîyan nake. Ji bo vê yekê di warê sîyasî û ramanî da kemilandinek lazim e. Lê merivêñ xwenda û zana zû bi rewşa gel û welatê xwe dihisin û loma jî zû şîyar dibin.

Ev pirsîyarî di civatê Ewrûpî da, di nîveka sedsala nozdehan da (bi mana xwe ya rastî) dest pê kir. Li welatê paşdamayî û kolonî jî, ev pêvajo gelek giran hetta wek rêveçûna kûsî meşîya. Di warê pêşketin û zanînê da ferqîyeke weha mezin normal e, lewra meriv nikare vê pêvajoyê ji avahîya civakî cuda bifikire. Eger civatek bi îradeya xwe ya azad, bê zordarî, qedexe û satengî dînamîkên ronakbûnê karibe peyda bike, bêguman pêvajoya ronakbûnê bi lez û efektîv dibe. Bi gotinekî din, eger di wenatekî da bi awayekî fireh berhemên aborî, siyasî, civakî û çandî; bingehêke perwerdeyî û sazîyên rêvebirî hebe, şertên zanebûn an jî ronakbûneke kîtlewî heye. Û di şertên weha da him pêşketin gelek zû dimeşe him jî bi bingehêke qewî û bi lez profesyonelî dikeve şûna amatorî. Li vê derê pirsekî dertê pêşberî me. Li welatê paşdamayî û kolonî da şert û sazîyên welatê azad ya qet tunene yan jî gelek qels in. Gelo wê çaxê em ê li benda hinekan bin da ku ji derva werin û van şertan bi cih bînin? Bersîv gelek zelal e, na, ne pêwîst e. Pêwîst nîne, lewra li ser îradeya azad zordarî heye, rê hatine girtin, astengî û qedexeye hene, li pêşîya pêşketinê dîwaran qalind û bilind hene. Wê demê em ê azadkirina îradeyan, vekirina rîyan, pûçkirin û rakirina astengî û qedexeyan, hilweşandina dîwaran piralî fam bikin û munaqeşeya vê pêvajoyê bikin. Herwisa em ê munaqeşeya pêvajoya ronakbûna civata Kurd û ronakbîrên Kurd bikin, lê rast munaqeşe bikin, û bigîhêne encamekê.

Di nav me Kurda da carna îddîayêni wisa bêbingeh dertêni pêş ku, bi rastî piyê meriv bi erdê va diziliqe. li gor van îddîayan, ronakbûn û ronakbîr piştî salêن heşte (1980) bi hewldan û pêşengîya hinekan derketiye holê; gelê Kurd xwe û pênasa xwe bi saya hinekan nas kiriye... Gelo ev rast e? Na, ne rast e û ji rastîyê pir dûr e. «ddîayêni weha înkariya tarîxa me ye, înkariya rastîyâ welatê me ye. Ne rast e, lewra tevgera ronakbûnê bi dehan sal berî heşte dest pê kiriye û gihaye serdema me ya îroyîn. Eger em tenê tarîxa xwe ya nêzîk raçav bikin, em ê bibînin ku tevger û hewldana ronakbûnê digihîje destpêka sedsala bîstan, hetta digihîje dawîya sedsala nozdehan, ango weşandina rojnameya "Kurdistan". Bêguman wek gelek welatêni din, li Kurdistanê jî destpêk gelek qels bûye. Hejmara ronakbîrên ku dest bi xebata azadîya Kurdistan kirine, bi tilîyan hatine jimartin. Herçiqas rojnameya "Kurdistan" li dervayî welat dercûbe jî, bandora wê li ser çenek xwendevan û însanîn perwerdekirî bi xurtî çêbûye û zêtir li metropolên Tirkîyê xebatên çapemenî û rêkxistinî dest pê kiriye. Ronakbûn û şîyarî pêşî di nav xwendevanê zanîngehêni *stenbol* û Enquerê da dest pê kir û berbi Kurdistanê hat û fireh bû. Eger em li xebat û hewldanêni jêrê binihêrin, wê baş xuya bibe ku îddîayêni jorê bêbingeh in :

HELWEST — Kovara Çand û Edebiyata Kurdî

- 1908 - Şark ve Kürdistan (Rojhilat û Kurdistan) (Rojname- İstenbol)
1908 - Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi (Rojnama Alîkarî û Pêşketina Kurd), İstenbol
1908, 1909 - Kürdistan (Rojname), İstenbol.
1909 - Amîd-i Sevda (Amîda Reş) (Kovar - İstenbol)
1909 - Peyman (Rojname - Diyarbekir)
1913 - Roji Kurd (Kovar - İstenbol)
1913 - Yekbûn (Kovar - İstenbol)
1913 - Hetawî Kurd (Kovar - İstenbol)
1918 - Jin (Kovar - İstenbol)
1919 - Kurdistan (Rojname - İstenbol)
1929, 1930 - Ağrı (Rojname - Ağrı)
1948 - Dicle Kaynağı (Çavkanîya Dîclê) (Rojname - İstenbol)
1950 - Şark Mecmusai (Kovara Rojhilate) (Kovar - İstenbol)
1950 - Şarkin Sesî (Dengê Rojhilate) (Rojname - İstenbol)
1950 - Demokrat Doğu (Rojname)
1953 - Ağrı (Ağrı) (Kovar - Enqere)
1955 - Henek (Kovar - Enqere)
1956 - Cudî (Kovar)
1957 - Dersim (Kovar)
1958 - Îlerî Yurd (Welatê Pêşketî) (Rojname - Diyarbekir)
1962 - Sîlvan Sesî (Dengê Sîlvan) (Rojname - Farqîn)
1962 - Dicle - Firat (Rojname - İstenbol)
1963 - Keko (Kovar - Enqere)
1963 - Deng (Kovar - İstenbol)
1963 - Roja Newe (Rojname - İstenbol)
1965 - Körmişkan (Kormışkan) (Kovar - Enqere)
1965 - Çira (Kovar - Xarpêt)
1966 - Yenî Akiş (Herikîna Nû) (Kovar - Enqere)
1966 - Dengî Taze (Kovar - İstenbol)
1966 - Hawar (Kovar - Enqere)
1967 - Uyanış (Şiyarbûn) (Kovar - Enqere)
1969 - Dîrlîş - Mardîn'în Sesî (Vejin - Dengê Mêrdînê) (Kovar - Enqere)
1969 - Ezîlenler (Yên Bindest) (Rojname - Dersim)
1969 - Doğu (Rojhilat) Kovar - İstenbol)
1969 - Mezra Botan (Kovar)
1970 - Şêresîyar (Rojname - Bayezid)
1970 - DDKO Haber Bültenî (Bultena Xeberan a Komela Kulturî ya Rojhilat a Şoresger),
Enqere.

Wek ji mînakan jî tê xuyan, heta salêñ heftê bi dehan rojname û kovar hatine derxistin (ku me li vê derê cîh neda hemuyan). Bêguman ev xebatêñ hêja ne tenê di warê çapemenî da, herwisa di warê rêkxistinî da jî xwe nîşan daye :

- "Kürt Teavun ve Terakkî Cemiyeti" (Komela Hevkâri û Pêşketina Kurd) (1908),
"Kürt Neşri Maarif Cemiyeti" (Komela Wesanî Çandî ya Kurd) (1910),
"Kürdistan Teşrîk-i Mesaî Cemiyeti" (Komela Hevkâriya Kurdistan) (1912),

"Kürt Talebe Hêvî Cemîyetî" (Komela Hêvî ya Xwendevanê Kurd) (1912),
"Kürt İşad ve İrtika Cemîyetî" (Komela Rênaşî û Pêşketina Kurd) (1912),
"Kürt Tamîm-i Maarif ve Neşriyat Cemîyetî" (Komela Daxuyanî ya Weşanê Çandî ya
Kurd) (1918)
"Kürdîstan Cemîyetî" (Komela Kurdistan) (1918),
"Kürdîstan Teali Cemîyetî" (Komela Pêşketina Kurdistan) (1919),
"Kürt Kadınlar Teali cemîyetî" (Komela Pêşketina Jinê Kurd) (1919),
"Kürt Millî Firkası" (Partiya Neteweyî ya Kurd)(1919)"
"Kürt Teşkilat-i İctîmaîye Cemîyetî" (Komela Rêkxistina Civakî ya Kurd) (1920),
"Xoybûn" (1927) vb.

Ez e li vê dere serhildanê ku ji sala 1906 dest pê dîkin û heta 1940'î ber-
dewam dîkin (serhildanê sedsala 19'an bi bîr tînim lê nagirim nava vê
nivîsarê) jî, bidim xuyan û vegekim ser mijara me ya esehî :

- Serhildana Babanzade Abdûrahman Paşa (1906)
- Serhildana Şeyh Abdûlselam Barzanî (1908)
- Serhildana Dersîm (1908)
- Serhildana Bedlîs (1914)
- Serhildana Dersîm (1916)
- Serhildana Koçgîrî (1919 - 21)
- Serhildana Şêx Saïd (1925)
- Serhildana Agîrî (1926)
- Serhildana Dersîm (1936)

Qet şik tune ku hewldan û cehdên çapemenî, rêkxistinî û serhildanî ya ji
bo Kurdistanêke serbixwe yan jî xudmuxtardar hatine kirin. Di vê rîyê da bi
sedan ronakbîr çûne ber darên sêpê û hatine daleqandin, ketine zîndanan û
çûne nefsiyan. Digel ronakbîran bi dehhezaran Kurd jî hatine qetilkirin û
hercar Kurdistan hatiye kambaxkirin. Mixabin ku ew xebatêن hêja bi ser ne-
ketine, lê em baş dizanin ku pêşîya hêza gelê Kurd ji alî dewleta kolonyalîst
ya Kemalîst bi barbarî hatiye birîn, her hewldan bi xwînê hatiye fetisandin,
qedexeyek hişk hatiye meşandin. Digel astengîyen hovîtîya dewleta Tirk,
rewşa Kurdistanê ya paşdamayı, jîyana eşîrî û hevbeşkirina feodalî jî asteng
û rîbirêng girîng bûne. Lê tevî hemû kîlûkêmasî ala berxwedanê ya neteweyî
li erdê neketiye, xebat û pêvajoya ronakbûnê berdewam kiriye. Heta ku ev
pêvajo giha salê 1960'î ronakbîren Kurd, mîrateke dewlemed jî me ra
hîştin û ala berxwedanê teslîme nîşîn serdema me ya îroyîn kirin. Em ema-
nethilgirêne wê pêvajoyê ne.

Di navbera salê 1960 - 70 da ronakbûna gelê Kurd kete lêgerînê nû.
Xebatên rêkxistinî yên di TİP, DDKO û KDP da bi lez mezin û fireh bû.
Jixwe dema ku dewleta Tirk a dagirker vê rewşê dît, di 12 Adara 1971'an da
bi hukmê eskerî yê faşî pêşîya vê pêşketinê birî. Lê bi encama xwe, derba
eskerî û hukmê faşî agirê hilbûyî netefand û nikaribû bitefanda. Lewra ser-

demeke nû dest pê kiribû, qalikên kevneşopî hatibûn şikandin û loma jî, piştî 12'ê Adarê rêkxistin, hewldan û ronakbûnên hevdem ên ku mora xwe li pêvajoya îroyîn xistin, pir zû fireh û mezin bûn û di dîroka Kurdistanê da cara yekem pirsa neteweya Kurd xiste rojeva Tirkiyê û dinyayê. Ev pêşketin û mezinbûna bi lezûbez, li ser bingeha xebat û hewldanê kevn pal da û fireh bû. Serdema kevn, ango sedema 1906 - 1970, him wek tarîx him jî wek tecrûbe û zanîn jî me ra gelek mîratên hêja hîştine. «nkarkirina vana, jibîrkirina alîyên wan ên baş û kérhatî û ligel vê jibîrkirinê bi tenê destnîşankirina şaşî û xeletîyan ne karekî aqilane ye. Lewra gelek tiştên girîng ên ku şaşî û xeletî nîşanî me didin hene, ji ber vê yekê dema ku meriv li ser mijarekî radiweste û xebatekî dinerxîne, divê nerxandin dualî be, bi şaşî û rastîyên xwe bête nerxandin.

Encama ku em ê jî vê şirovekirinê derxin ev e, tarîx yekparce ye û em nikarin li gor kêfa xwe tarîxê şirovebikin. Em nikarin li gor hesabêñ xwe yên şexsî û rêkxistinî tarîxê ji cîhekî kêfi dest pê bikin û li ku derê kêfa me bixwaze bibirin an jî beşek ji tarîxê tune hesab bikin. Di tarîxê da çawa serdemêñ serketî hebin wisa jî serdemêñ kêmketî hene. «ca fam û feraseteke tarîxê ya ku li serdemêñ serketî xwedî dertê û serdemêñ kêmketî încar dike yan jî tune hesab dike, ne famêñ kérhatî û jîrîkî ne. Famêñ weha bi zirar in û perdeyek reş dikşînin ser tarîxa neteweyekê...

Salêñ heftêyî

Wek min li jor jî got, ji bo Kurdan ronakbûna hevdemî ya ku ji rêkxistinîya îroyîn ra bû bingeh piştî salêñ heftêyî qewimî. Di vê serdemê da Kurd cara pêşî bi bîr û bawerîyên hevdemî xwe girêdan û ji bo pirsa Kurd û Kurdistanê xeta îdeolojîk û polîtîk afirandin. Rewşa civakî û aborî a Kurdistanê bi ramanê hevdemî hatin tehlîlkirin û hedefîn zelal hatin danîn. Ramanê sosyalîst û zaniyarî di nav gelê Kurd da hatin belavkirin. Kurd rêkxistinêñ xwe yên serbixwe û cuda ava kirin. Ligel rêkxistinêñ sîyasî komeleyên demokratîk, sendîka û rêkxistinêñ meslegî li her derî bejin avêtin. Pirsa Kurd û têkoşîna wî ya azadîyê ji heft salî heta heftê salî bû malê herkesî, di rojevê da rûnişt. Bi zimanê Kurdi rojname, kovar û pirtûk hatin weşandin. Bi sedan kadirêñ zana û têgihîştî gihan. Pirsa Kurd û Kurdistanê ji nav lepêñ çend xwendevan, ronakbîr û serokeşîran hate derxistin û ev pirs bû malê hemû çîn û tebeqeyêñ civata Kurd û bi lez kete rengeke gelêrî. Ronakbîrêñ me yên ku bi tilîyan dihatin jimartin, bi ronakbîrêñ nû xurt bûn û ev hejmar gîhişt sedan, hezaran.

Ronakbîrêñ ku em behsa wan dîkin, li ser bingehêke welatparêz xurt bû û pêş ket, bi raman û perspektîfên cuda be jî rizgarîya gelê Kurd ji xwe ra kir armanc û di vê rêyê da gelek êş û kovan dît. Bi gotinekî din, ronakbîrîya Kurdistanê ya piştî salêñ heftê di eslê xwe da li gor pirsa neteweyî ya Kurd pêşve çû (em, "ronakbîrêñ" ku bi eslê xwe Kurd bûn lê xwe ji bo ronakbîrîya Tirk amade kirin li dervayî mijara xwe digrin). Hema bêje temamîya ronakbîrêñ Kurd zanîngehêñ xwe bi xwe afirandin. Mal, kolan, qehwexane, meydan, komele û rêkxistinêñ nehêñi bû hêlinâ wan ên perwerdeyî û têkoşînê. Ji ber vê yekê jî, axlemîya ronakbîran di xeteke polîtik da xwe gi-handin. Bi sedan, bi hezaran ronakbîr an jî berendamên ronakbîrêñ îroyîn di rûnê xwe da qijilîn û xwe bi xwe gihadin û perwerde kirin. Zanîna xwe ji pirtûkan, ji munaqşeyan, ji jîyana rojane û ji têkoşîna hember zulm û zordarîyê wergirtin. Tiştêñ ku hîn bûn, bi hewldan û hunerêñ xwe di jîyana rojane da çespandin...

Li welatêñ ku pirsêñ neteweyî û pênasî tunebûn, însan bal û dêna xwe didan ronakbîrîyê û ji bo vê yekê jî berê xwe didan çalakîyên çand, edebiyat, huner, muzîk, tiyatro, sînema, sîyaset, bazirganî, karîyerêñ meslegî û hwd, lê li welatê me berê xwe dan ronakbîrîyeke yekreng û yektip. Tu gazinekî min ji bo vê yekê tune, ji ber ku ronakbîr û xwendayê me yêñ nûgihayî, tevî ku gevîl zîrekîyêñ wan ên taybetî yêñ karîyerêñ cuda û kesane hebûn, tevî ku karibûn bigihana meqam û cihêñ bilind jî, bi zanebûn berê xwe dan vê yekrengîyê. Anglo Kurdistîyê hilbijartin û loma jî gevîlên xwe yêñ taybetî li cîhekî hêştin û ronakbîrîya xwe kirin xeteke sîyasî. Şert û zurûfîn Kurdistanê jî wana mecbûrî vê hilbijartinê dikir, ya wê Kurdistî û şanazîya neteweyî bihata hilbijartin yan jî nekurdîtî û bêxîretî. Loma jî, ev hilbijartin bû sedemeke sereke ya ronakbîrîya yekreng û sîyasî. Lê îro em dibînin ku hinek vê rastîyê nabînin an jî naxwazin bibînin û bi rexne û xerezêñ bêbingeh êrişî ronakbîrêñ Kurd dîkin; wana biçûk dixînin û ji ber ku wek wan nafîkirin û nalîvin, wana dîkin hedefa tîrêñ xwe, nav û bernavkêñ bêrê û dijminhî li wan datînin. Ev êriş û dijminahî, ji xeynî zirarê tu feydeyek nade gelê Kurd!..

Salêñ heştêyî

Beşek ji ronakbîrêñ piştî salêñ heştê ji salêñ pêncî û şêstî têñ, yêñ mayî û beşa fireh jî di salêñ heştêyî da gihan. Bi gelempêrî, dînamîkên pêşewa yêñ piştî salêñ heştê dîsa ev ronakbîr in. Hêj jî di rêvebirîyê da, rêkxistinî da, perwerdegarî û berhemêñ nivîskî da giranîya xwe datînin. Bêguman komeke

ronakbîrên nû û ciwan jî tevî vê koroyê dibin û ev koro roj bi roj mezin û fi-rehtir dibe. Ev pêşketin serê me bilind dike, hêvî û gumanêñ me yên pêşerojê rohnîtir û zelaltir dike.

Piştî salêñ heştê bi zulm û barbarîya dewleta Tirk, êris û terora wê Kurdistan bi hejmareke mezin ronakbîrên xwe winda kir. Bi sedan di işkenceyan da, li kolanan bi bêbextî ji alî kontrgerilla û mît û sîxurêñ dewleta Tirk hatin şehîdkirin. Bi sedan ronakbîr ketin hevs û zîndanan, dîsa bi sedan mecbûrî derketina dervayî welêt bûn. Hejmara ronakbîrên ku derketin dervayî welêt ji yên hundir zêtir bû, lê piranîya ronakbîrên ku derketin derva, vala nesekinîn û ji bo nasandina pirsa Kurd û Kurdistanê xebateke hêja kirin, pişt dan têkoşîna welat. Li ser zimanê Kurdî, edebîyata wî, çand û tarîxa wî, muzîk û folklorâ wî berhem dan. Hetta meriv kare bi rehetî bêje ku, xebatêñ bingehîn ên li ser zimanê Kurdiya nivîskî ji alî ronakbîrên dervayî welêt hate meşandin û pêşvebirin. Bêguman di xebatêñ dervayî welêt da di warê sîyasî, diplomatîk, rêzkinîn û teknîk da, nasandin û aktuel-kirina pirsa Kurd li dinyayê rola sereke ya rekxistinêñ Kurd e. Ez bi taybetî vê rastîyê destnîşan dikim û vedigerim ser mijara vê nivîsarê.

Em iro ketine pêvajoyeke wisa ku, êdî ligel ronakbîrên me yên kevn li her alî ronakbîrên nû aj didin û hêviya me xurt dikin. Êdî Kurd ronakbîriya yekreng li paş xwe dihêlin û berê xwe didin mijarêñ cuda, gevîl û marîfetêñ xwe yên pêşketî bi kar tînin û piralî berheman diafîrinin. Ev wêne û pêşketin di serî da bi saya berxwedana rêkxistinêñ Kurd û welatparêzêñ wî, bi saya hewldan û rikeke xîretkêş giha iro. Di vê xebatê da kêm zêde keda herkesî heye, yek ji yê din kare zêtir be jî. Ev tiştekî xuristî ye. Lê tişte xeter ew e ku, hinek dixwazin hemû ked û xebatê heyî ji xwe ra bikin mal, yên dervayî xwe bêpar bihêlin, tarîxê bi xwe dest pê bikin!.. Fam û ferasetek weha, fameke topavêti ye û pêkenok e, lewra bi înkariyê dilive. Gelê Kurd ji sîyaseta înkârî ya dewleta Tirk pir kişandiye, pir eş û kovan dîtîye. Ji ber vê yekê înkârî ji ku derê bê bila were, bi kîjan navî dibe bila bibe, bêbingeh e û mehkûmê pûçbûnê ye.

Tarîfa ronakbîr û tevlihevîyek

Tevlihevî dibêm, ji ber ku derbarî tarîfkirina "ronakbîr" da raveyêñ ecêb têne kirin. Li gor hinekan, tenê nivîskar karin bibin ronakbîr; li gor hinekêñ din, çarçeve bi sîyasetvanan tê sînorkirin; li gor hinekan jî, kesen ku pesnê şerê çekdarî didin, li ser gerîlla dinivîsin û ligel wî rêkxistinê cîh digrin karin bibin ronakbîr. Hinekêñ din jî, ketine komplekesake wisa ku ji bo

ronakbîrên Kurd tu tarîf û cih nabînin. Nabînin, ji ber ku ew di serê xwe da hin şexsîyetên navdar ên wek Gorkî, Tolstoy, Gogol, Sartre, Çernîşevskî, Çêxov, Pûşkîn û hwd xeyal dikin û li texlîdên wan digerin. Û wisa xuyaye ku rastî wan texlîdan nayêن û loma jî bi dilsarî û çoksikestî nêzî vê mijarê dibin...

Dema ku meriv van tarîfan yek bi yek bigre dest, tev jî kêm in û ji ber ku kêmîn berê wan berbi şâşyan in. Lewra heryek ji wan, tenê beşek ji rastîyê tînin ziman. Lê hemû tîpêن ku hatine destnîşankirin dikarin bikevin tarîfa ronakbîr û zêdetir jî. Tarîfa ku li hemû dinyayê hatiye pejirandin li meydanê ye û gelek zelal e. Herkesê ku bixwaze dikare bi ser vê mijarê vebe û bigihîje bawerî û qinyatek. Tarîfa fershengî ya ronakbîr weha te kirin: "Kesên ku bi zaniyarîya dema xwe kemiliye..." Di felsefa klasîk da, "kesên ku xwedî zanînek, perwerdeyîyek û fam û feraseteke kifşkirî ne". Di felsefa modern da jî, "Perwerdeyî, zanîn û fam û feraseteke kifşkirî têr nake ku meriv bibe ronakbîr. Kesên ronakbîr xwedî zanîn, raman û tewrên kemilandî yên hevdem in. Ev jî, eger meriv bigihîje bîr û bawerîyeke hevdem û zaniyarî û dîtineke dinyayî, dikare bibe ronakbîr".

Ji van hemû tarîfîn jor jî tê xuyan ku kesên xwenda, zana, bi kultur û dûrbîn ronakbîr in. Lê em tenê xwe bi vê tarîfê va girê nadîn, ji ber ku tarîf bi tenê bersîva ronakbîrîyê nade. Lewra ligel tarîfê gelek pîvanêن din ên girîng hene. Wek şexsîyet, afîrandêrî, pevgirêdana bi gel ra, ramanek hevdemî û welatperwerî. Bêguman di civata Kurd da, di civatek paşdahîştî da him di zanînê da him jî di pîvanan da tolerans pêwîst e û ev pêwîstî bi şertê welatê me va girêdayî ye. Anglo eger em xwe bi civatêن pêşketî ra qiyas bikin, pîvanêن ronakbîrîya welatên pêşketî bi temamî li ser xwe ferz bikin, em ê di serî da bend û astengîyan li pêşîya xwe deynin û xwe kor bikin. «ca em dikarin ci bikin? Em dikarin di şirovekirinêن xwe yên derheqa ronakbîrî da, şertên welatê xwe bidin pêş çavan, xwedî tolerans bin û li kemilandineke sedî sed negerin, lewra di seranserê dinyayê da tiştekî sedî sed kemilî tuneye. Herweha hemû çalakî jî, bi destpêkeke qels dertê meydanê û di nava zeman da berbi kemilandinê diçe. Em vê rastîyê di bîra xwe dabihêlin û vegeerin ser tarîfîn joरîn.

Zanîn û tecrûbeyêن heyî gelek zelal nîşan didin ku, em nikarin çarçeva ronakbîrîyê tenê bi nivîskaran, sîyasetzan, jêhatîbûna hevdesazên rêkxistinî teng bigrin û xwe di wan qaliban da bifetisînin. Lewra zanîn, mijareke piralî ye û gelek tîp însan dikevin vê tarîfê. Wek nivîskar, sîyasetvan, kulturzan, folklorzan, tarîxzan, zimanzan, hevdesaz, muzîkvan, ekonomîst, bi sedan karîyerên meslegî, akademîsyen û herwisa bi sedan pisporêن mijarêن

cuda...Hetta kesên ne xwenda yên ku di jîyana pratîkî da gihane jî dikarin bikevin vê tarîfê.

Dîtinêñ herî balkêş a ku dibêjin, "ronakbîrêñ ku ligel şoreşê (qesd ji şoreşê, terefdarîya rêxistinékî ye) cîh negrin û li ser şer û gerîlla nenivîsin, ew ne ronakbîr in, xayîn in, bêşeref in" û hwd. Xwedîyê vê dîtina ecêb, gotina xwe ji bo ronakbîrêñ dervayî xwe dibêjin û bi tawanbarkirineke bêmantîq êrîşî wan dîkin. Ji bo îspatkirina dîtinêñ xwe jî, bûyerêñ ku xîtabî hestan dîkin tînin ziman, şerê çekdarî ji xwe ra dîkin mertal û her wisa dîkin şûr û êrîş dîkin. Bûyerêñ Kurdistanê çiqas li hestan xe jî, ev nayê wê manê ku meriv rastî û mantiqê bavêje alîyekî. Rast e, li Kurdistanê trajedîyek tê jîyandin, lê çareseriya vê trajedîyê bizanîn û tesbîten rast û aqilmendî dibe. Bêguman di şertên welatê me da tekoşîna rêkxistinî bêmunâqeşe xwedî nerxeke mezin e û azadiya gelê me bi xebatêñ rêkxistinî dikare bi serkeve. Ez bi xwe jî ligel xebatekî weha me. Lî ji ber ku bawerîya min bi bîr û raya azad heye, ji ber ku divê yek bi yek her însan bi mîjîyekî azad bîryara ser jîyana xwe bide, şert û zextêñ ku divê ronakbîr bi rêkxistinékî ra bin nayê pejirandin. Eger ronakbîrêñ Kurd bi bîr û raya xwe yên azad ligel rêkxistinékî cîh bigrin yan jî ji alî rêkxistinékî bêne îqna kirin û qezenc kirin, li ba min ev tiştekî gelek normal e û bawer nakim ku tu kes gîlî û gazinan bike. Herwisa gotina kesî ji bo ronakbîrêñ ku dixwazin û karin li ser çalakîyên gerîlla binvîsin jî tune, hetta karekî weha hêjayî pesinandinê ye jî. Lî rastîyekî heye, herkesê ku pêniyîs dide destê xwe nikare romana şer û gerîlla binivîse. Ji bo viya gevîl (qabilîyet) pêwîst e, daxwazî pêwîst e û naskirina bûyer û qehremanêñ bûyerê pêwîst e..

Dema ronakbîrekî welatperwer ligel rêkxistinékî cîh negre, dêlva ku meriv êrîşî wan bike û bi bernavkêñ nebaş wana tawanbar bike, divê meriv kumê xwe deyne ber xwe û li ser sedemên dûrketina ronakbîran bifikire. Lewra metoda êrîşê ji gelê Kurd ra xizmet nake, berevajîyê wî dijberîyê kûr dike û him zîrar dide rêkxistinêñ êrîşkar him jî doza gelê me..

Eger hûn bala xwe bidinê, ez behsa "ronakbîrêñ welatparêz" dikim. Ji bo ronakbîrêñ Kurd, averûya "welatparêzi" pîvanek e û quesda min jî ronakbîrêñ weha ne. Naveroka vê pîvanê ci ye? Di serî da jî min got, eger ronakbîrekî Kurd pîrsiyaran ji xwe kir û got "ez ci me, li dînyayê û di civata min da cîhê min ci ye ; ez kî me, ez ci dikarim bo gelê xwe bikim, tiştêñ ku ji min têñ xwestin ci ne û divê ez ci bikim...?" û di encamê da bi van pîrsiyarîyan ber-pîrsiyarîya xwe bi cî bîne, mana xwe tercîha xwe kiriye û ev tercîh jî gelê wî/ wê ye, welatê wî/wê ye. Lî divê em xwedîyê vê tercîhê di warê îdeoloji, sîyaset û rêkxistin da azad bibînin, mafê wî/wê yê hilbijartina azad ji destê

wî nestînin. Lewra em dizanin ku hilbijartineke bi zor, bi gefxwarin fêkî nade û pirî caran jî zirarê dide!..

Alîyekî vê pirsê yê girîng jî, mijûlîyen cuda yên ronakbîran in. Ronakbîr heye ku xwe bi tenê dide xebat û lêkolînên çandî, ronakbîr heye ku tenê bi pirsên zimanî eleqedar dibe ; bi tarîx, edebîyat, sîyaset, teknîk û bi sedan mijarêñ din mijûl dibe... Divê em van mijûlî û intreseyêñ taybetî bidin pêş çavan û di nerxandina wan da realist bin, her tiştî nekin qalibêñ sîyasî û xwe ji ronakbîrîyeke yekreng û yekîtî dûr bixînin. Ji bo tekoşîn û serketina gelê me, xebatêñ pirrengî û piralî pêwîst in û ancax bi vî awayî em karin hevdemîyê biqefêlin.

Divê Ronakbîr Azad be!

Gelo em ji vê daxuyanîyê ci fam dikin? Herçiqas şirovekirinên cuda hene jî, destnîşankirina rastîyê ne zor e. Dema ku em dibêjin "divê ronakbîr azad be", qesd mêtjî û ramanêñ azad e. Azadîyeke weha îmkana pencereyekî fireh, hilbijartinekî rast, karekî baş û berhemdarîyekî bi kalîte dide ronakbîran. Li gor gevil û intressa ronakbîr, îmkana meylekî rast peyda dibe, bi awayekî azad ji fersendan kelk tê girtin... Piştî ku me vê azadîyê wek heqekê dît û pejjirand, hêj em dikarin ji wan bixwazin da ku ew heqê ronakbîrîyê bidin, bêguman xizmetên ku karin bidin, ne yên ku nikarin û ji qeweta wan der in. Bi rexneyêñ (krîterên) xwe dînamîzm bidin wan, çavdêriya wan bikin û ji bo bicîhanîna berpirsiyâriyan wan daf bidin. Bînin bîra wan ku, azadî bê bedêl nabe... Beşik ev gotinêñ me, ne ji bo kesêñ razayı, kesêñ ku "azadîyê" wek tiralî, kêfxwestin şirovedikin, ji gelê xwe dûr dikevin û di jîyanekke egoistî da difetisin diçin e. Lewra zanîn û gevilên însanêñ weha ci dibe bila bibe ew nikarin bibin ronakbîr, eger ronakbîrîya wan hebe jî, ronakbîrîya wan ji bo wan e. Ronakbîren ku ez qesd dikim, kesêñ ku ji bo gelê xwe berpirsiyârî dide ser milêñ xwe, kesêñ ku tim pirsîyan ji xwe dike, dibe hevparê derd û kulên xelkê û ji wan derd û kulan ra li dermanekî digere. Bi kurtî, kesêñ ku xizmetan pêşkêşî doza gelê xwe dikin. Jixwe ronakbîren ku bi vê zanîn û bawerîyê dilivin, dizanin ku azadî berpirsiyâriyeke giran dide ser milê wan û ji ber ve yekê jî barê ku dikeve ser milê wan hildigrin.

Çarçeveya ku ji bo azadîya ronakbîr hatiye danîn, him ji bo ronakbîren bêrêkxistin him jî ji bo yên bi rêkxistin derbas dibe. Ferqî ev e : Ronakbîren ku besdarî xebatêñ rêkxistinî dîbin cotberpirsiyârî didin ser milê xwe û li gor raya min ev hêjayî pesinandinê ye. Ronakbîren bi rêkxistinî ji alîkî va karûbarêñ rêkxistinê dimeşînin, li alî din jî li gor gevil û intresseyêñ xwe

karên ronakbîrî dîkin. Bi gotinekî din, eger bixwazin roman dînivîsin, eger bixwazin bi tîyatro, helbest, lêkolîn û hwd mijûl dîbin...

Bêguman li hember ronakbîrên ku besdarî karên rêkxistinî dîbin û berpirsîyarîyên xwe bi cî tînin, berpirsîyarîyên rêkxistinan jî hene. Dêlva ku ronakbîran di nav hemû cûre karên rêkxistinê da bifetisînin, divê şert û îmkanan peyda bikin da ku ronakbîr xwe rehet û azad hîs bikin û karibin gevîl û intelektuelîya xwe baş bi kar bînin û bi berhemên xwe xizmetek bikin...

”Divê ronakbîr Serbixwe be!”

Pirî caran ji averûya ”ronakbîrên serbixwe”, ronakbîrên bêrêkxistin û bê sîyaset tê famkirin. Ev şirovekirin li gor rewşa ronakbîran diguhure. Ew ronakbîrên ku ji pirsgirêkên gelê xwe ra biyanî ne, ji bo pîrsa pêNASA xwe xema naxwin û ji xwe pêştir li hember tu kesî berpirsîyarî hîs nakin, bi rastî serbixwe ne. Di navbera wan û gelê wan da pevgirêdanek nemaye û ji ber vê yekê jî derbarî pêşeroja welat û gelê xwe da xwedî hilbijartineke sîyasî û ramanî nînin. Jixwe em jî, kesêñ weha him wek ronakbîr nabînin him jî ji xwe hesab nakin.

Ronakbîrên ku em destnîsan dîkin, kesêñ bêrêkxistin in û karê rêkxistinî nakin. Belê, ronakbîrên weha di warê rêkxistinî da serbixwe ne lê di warê sîyasî û ramanî da ne serbixwe ne. Ne serbixwe ne, lewra ji nêz va bi pîrs û çareserîyên welat û xelkê xwe mijûl dîbin, eleqe nîşan didin, ji bo azadîya gelê xwe tercîhekî wan ê sîyasî û ramanî heye. Ronakbîrên weha di têkoşîna rizgarîya gelê xwe da teref in, bi tercîhên xwe yêneteweyî xwe bi gelê xwe va girêdidin. Wê hingê ev ronakbîrên hanê ne serbixwe ne û ji ber vê yekê jî dîtin û şirovekirinê negatîv ên ku derbarî averûya ”serbixwe” da têne kirin bêmane ne û ne rast in. Tiştê ku divê em serê xwe pê bişînîn û munâqşe bikin, pirsgirêka ”gelo çîma ev ronakbîrên welatparêz li dervayî rêkxistinan mane ; piranîya van ronakbîran demekî di nav rêkxistinan da bûn û iro çîma serbixwe ne ? ” Di çavdêriya xwe da tiştê ku bala min dikşîne, ronakbîrên weha ji ramanêñ heyî hêvî û daxwazîyên wan, di tesbîten sîyasî û ideolojîk da şikêñ wan, ji bo pêşeroja welatê xwe bîr û bawerîyên wan hene. Tiştê ku em ê li serê bisokinin ev nuqteyêñ han in. Eger rêkxistin dixwazin van ronakbîran bikşînîn nava refêñ xwe, ji xebatêñ wan kelkê bigrin, divê berî her tiştî dev ji şêweyêñ kurtebirî û negatîv berdin, bi nîyet û ramanêñ zelal li ser nuqteyêñ jorîn tesbîten rast bikin û di vî warî da gav bavêjin.

TEVGÊRA RIZGARÎXWAZ Û REWŞENBIRÎ

N. ZAXÛRANÎ

Beyî têgihiştina dîroka tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê mirov nikare weha bi hêsanî xwe di tevgêra rewşenbîrên Kurdistanê ji bighîne. Lewra em rind dizanin ku tevgêra rewşenbîrên Kurdistanê beşek ji tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê bi xwe ye. Bê guman ev birra, birrê herî çalak e. Mirov kare bi hêsanî bibêje ku rewşenbîr ji bo destpêkirin, birêvebirin û temsîlkirina tevgêra rizgarîxwaz çi li welêt û çi li derveyî welêt xwedyê rolekî herî serekî ne.

Ev nêzîkî dused salî ye ku tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê ji bo rizgarkirina niştimana xwe li dijî kolonyalîzma tirk, fars û ereban cengeke man û nemanê li dar dixe. Di serpêhatina vê cenga man û nemanê de hêzên dagirker ji bo neserkeftina tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê hemû awayên hovîtiyê bi kar tînin. Ji alîkî ve hêzên kolonyalist keç û lawên Kurdistanê yên bejntazepîskivî di zîndanên xwe de işkence dikan, ro bi nîvro li nava bajar û serê ciyayê Kurdistan teror dikan, ji aliyê din ve ji hêzên dagirker ji bo çeperên tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê teng bikin bajar û gundên Kurdistanê wêran dikan. Ji xwe mekanîzmên asîmîlasyona tirk yên bi gelek alî - çi bi alîkariya medayâyên xwe yên çapemenî û çi bi alîkariya dezgeh û saziyên xwe yî perwerdekirinê - her ku diçe li hember tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê har û dîntir dibin. Îro roj ji ev barbariya kolonyalîzma tirk, fars û ereban li seranserê Kurdistanê tê domandin. Bê guman bi guhertina civaka Kurdistanê re tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê ji bi gelek alî - çi bi aliyê terkîba cîvakî û çînayetî û çi bi aliyê hevkarî û hevalbendiyê - tê guhartin. Lê ev guhartina ne bi awayekî xwezayî tê pê. Bi peyveke din guhartina civaka Kurdistanê ne li ser dînamîkên xweyî netewî û cîvakî tê pêkanîn. Ev guhartina li gor plan û projeyên dewletên kolonyalist tê bi cîh kirin. Ji bo vê yekê ji dînamîkên civata Kurdistanê yên cîvakî û netewî herdem rê li ber gesbûna wan hatiye girtin.

Ger ku mirov bi awireke dîrokî li tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê binêre, dibîne ku tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê ji di nava xwe de tê kategorîkirin. Kategoriya yekem ji serîhildana Abdurrahmanê Babanî (1805) heta bi serîhildana Dêrsimê ya di rôbertiya Seyid Riza ku di sala 1938an de bi awayekî hov ji aliyê kemalîstan ve hate şikandin.

Serkêsiya van serîhildanê navçeyî/heremî yên bi reng netewî bi pirranî serdestên civata Kurdistanê - mîr, axa, beg û paşa- bûn. Bela ku hêzên dagirker bi

serpêhatina tevgêra rizgarîxwaz a Kurdistanê re, mîr, beg, axa û paşayên kurdan tasfiye kirin, bi serîhildana Seyid Ubeydullah (1880) pê ve serkêsiya serhildanê kurdan yên bi reng netewî ket destê şêx, pîr û melayên Kurdistanê. Ev serîhildanan ji bili motîvê netewî bi motîvên olî jî hatin reng kirin. Van rengên olî di serpêhatina tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê de bûne hoyê têkçûna yekîtiya netewî li seranserê Kurdistanê.

Ji bo vê yekê jî civata Kurdistanê ya ji hev tar û markirî bêtir ji hev hate atomîze kirin. Ji xwe perçebûna Kurdistanê - ci ya heyama Osmanî û Sefawîyan û ci ya serdemâ Lozanê- di destê hêzên dagirkir de bi serê xwe dibû sedema ji hev belavkirina dînamîkên tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê. Ne bi tenê dibe hoyê belavkirinê, her weha hêzên dagirkir bi saya vê pêşketinê şerê di navbera hêzên kurdan de li gor berjewendiyên xwe gurtir dikan.

Rewşenbîrên vê serdemê Şêx, Pîr, Mele, Feqî û pêş imam bûn. Wezîfa wan ew bû ku îdeolojî û polîtîka civata wê demê biafrînin. Hiyerarşıya wan ya di nava civatê de li ser nêzîkkirina wanî rastûrê ya bi afirandina îdeolojî û polîtîkayê ve girêdayî bû. Bê çiqasî nêzî çîna serekî bûne û di berhemkirina îdeolojî û siyasetê de xwedî fonksiyon bûne, wilqası jî van rewşenbîran di nava hiyerarşiyê de cîhê bilind bi dest dixistin. Ji ber vê yekê jî ronakbîr organîzmên organîk yên civata sivîl û polîtîk in.

Ji alîkî ve îdeolojiya çîna serekî diafîrinin, wê di warê hemû jiyanê de bîrewer dikan, îdeolojiya wê li temamê civatê belav dikan. Ji aliyê din ve jî dezgehênu ku - ci yên polîtîkî û ci yên çekdarî - dibin bingeh ji bo avakirina dewletê saz dikan.

Divê ku bê gotin, Mele, Şêx û Faqîyen Kurdistanê zehv welatperwer bûn. Dîroka wan gelekî duvdirej e. Xwe dighîne Melayê Cizîri, Ehmedê Xanî û Eliyê Herîrî. Van celeb ronakbîran bi sedsalan pêşengîya welatperwerîya civata Kurdistanê kirin e. Dîrok û kultura Kurdan parastin e. Lê gelek mixabin ev celeb ronakbîrên me ji cîhana derve re girtî bûn. Aliyê wanî pêşvexistinê gelekî qels bû. Ji bo vê yekê jî pirraniya wan ji dîtin, bawerî, pîvan û şeweyê nû re girtî bûn. Edebiyat, kultur û zanyariya navnetewî bala wan nedikişand. Heta demeke rewşenbîrên kurd xwedî fonksiyoneke bi vî rengî bûn. Lê piştî ku serdestê civata kurdistanê - Mîr, Axa, Beg, Paşa û ed.- ji aliyê hêzên kolonyalist ve hatin tasfiyekirin, rewşenbîr û berdevkîn wan hêdî bi hêdî şûna wan girtin. Bi peyveke din êdî berdevk û ronakbîrên civata Kurdistanê bûne serkêşê tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê. Vê yekê heta bi qirkirina Dêrsîmê ya sala 1938an domand.

Bi têkçûna serîhildana Dersîmê re bêdengiyek li Bakûrê Kurdistanê zal bû. Dînamîkên civata Kurdistanê yên netewî û civakî hatin perçiqandin. Hêzên kolonyalist yên komara tîrkiyê bi dagirkirina leşkerî re xwestin ku dagirkirina aborî jî fereh û kurtir bikin. Ji bo vê yekê jî komara tîrkiyê hemû hêza xweyî aborî seferberî

ser Kurdistanê kir. Bi vê seferbûnê re kategoriyên civata sermayedariyê bêtir bi cîh û war bûn. Kategoriyên kevn yên civata Kurdistanê hêdî bi hêdî berbidawiya xwe ve diçin, yên nûjen jî roj bi roj di nava jiyana civakî de dibin xwedî gotin.

Ji hinganê vir de dînamîkên tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê çi bi terkîbêñ xweyi çînayetî, çi bi însîyatîf politîka û di warê rîexistinî de têñ guhartin. Ëdî mirov karê bi hêsanî bibêje ku serkêsiya tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê ket destêñ çîn û refen jérdest yên civata Kurdistanê. Bi vî awayî jî hêdî bi hêdî giraniya serdestêñ civata Kurdistanê di nava tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê de roj bi roj kêmîtir dibe. Lewra hêzên kolonyalist serdestêñ ku welatparêz bûn qirkirin, yên nûker jî bi xwe re integrê kirin. Ji ber vê yekê jî burjuvaziyê kurd yê netewî gelekî qels e. Ji ber vê qelsbûnê jî nikare temsîliya xweyî siyasi di nava civata Kurdistanê de damezrînê. Ji xwe yê komprador tu carî tû pîrsa welatperwerî pê re petde nebûye.

Di vê heyama aloz, dijwar û gelek nakokî de bingehê civata Kurdistanê tê guher-tin. Bivê guhertinê re jî nişkî ronakbîran tê pê. Mirov karê bi hêsanî bibêje ku dîroka van rewşenbîrên 1960î virde dest pê dike. Pirraniya wan welatperwer û sosyalîst in. Bela ku van ronakbîran di dibistanê bilind de dixwînin xwedyê dîtinêñ hevdemî û ji normêñ jiyana nûjen agahdar in. Ji ber vê yekê jî li ser teoriyên rojevî gîrstûgoyêñ germ û kûr dikin. Ëdî, ew mîna ronakbîrên Kurdistanê yên kevn di nava çeperêñ Kurdistanê de mijûl nabin, her weha ew li ser bûyerêñ cîhanê jî serêñ diêşînin.

*L*ê ji ber ku ev celeb rewşenbîrên Kurdistanê di dibistanêñ dewleta tîrk de dixwînin, ji koka xweyî kurd dûr dikevin. Zimanê xweyî zikmakî di kar û xebatêñ xweyî pratîkî û rîexistinî de bikar nayêñin. Pirraniya wan jî forma jiyana kurdî dûr in. Bi kurtî ev celeb ronakbîrên me ji bo guhartin û pêşvexistinê zehv aktîf in, lê bêyî ku xwe bîghînin kokêñ xwe ku hîmin kultura wan li ser tê avakirin.

Ji vê yekê wîrdetir rewşenbîrên Kurdistanê ji ber pîkoliya dewletêñ kolonyalist tu mecal nedîtine ku kar û barêñ xweyêñ rewşenbîrî bi awayekî peryodîk li ser xaka niştîmana xwe bi cîh bikin. Ji alîkî ve perçebûna Kurdistanê, ji aliyê din ve jî bikaranîna çend alfabeteyen -Alfabâ latîni, erebî û kirîlî- cûrbicûr bûne hoyê serkutkirina peywendî yên organîk yên di nava rewşenbîrên Kurdistanê de. Ji xwe jî ber êrişen hêzên kolonyalist, rewşenbîrên Kurdistanê ji saziyêñ xweyî akademîk bê par mane. Ji bê mecalî rewşenbîrên Kurdistanê dev ji welatê xwe berdidin, dibin penaber li welatê xeribîyê. İro roj jî ev rewşa kambax her berdewame. Ma ne ji ber êrişen hêzên kolonyalist parlementerên ku ji aliyê gelê Kurdistanê ve hatibûn hilbijartîn, dev ji niştîmana xwe berdan? Hevalên wan yên ku fersend nedîtin derketin derve ji aliyê polîsêñ tîrk ve hatin zîndan kirin.

Beriya niha bi çendekî nivîsek li ser pirsgirêka rewşenbîran ku jî aliyê Huseyîn Kaytanî ve hatibû nivîsandin û di Ozgur Politîkayê de hatibû wêşandin li ber çavêñ min ket. Divê nivîsandinê de gelek tiştîn balkêş hene ku divê mirov hinekî serê

xwe li ser biêşîne. Yek ji wan ew e ku nivîser dibêje: “Di dîroka xwe de tu gelê mîna kurdan ku dijiminê xwe pesend kirine heta ji celadê xwe re bê westan gotina “Belê” tu gel nîne.” (1) Ma gelo ev nerîna rast e? Bi ya min; NA! Yan nivîskar baş dîroka gelê xwe nizane, yan ji dixwaze dîroka gelê xwe biqurmiçîne, bixe bigoriya “teoriyên” xwe yên bê emsal!

Lewra baş tê zanîn ku gelê Kurdistanê ji bo serfîraziya niştîmana xwe berxwedane-ke dijwar li dijî kolonyalîstan ku welatê wî perçekirine, daye û dide. Ger ku em dev ji serîhildanê gelê Kurdistanê yên li beşen din - başûr û rojhilat- berdin, bi tenê li ser Bakurê Kurdistanê mijul bibin, hinganê emê bibînin ku ji damezrandina komara tirkîyê virde gelê Kurdistanê bîst û heşt caran serê xwe li pêşberê kolonyalîzma tirk hildaye. Bi peyvek din, gelê Kurdistanê di heftê û sê salî de bîst û neh serîhildan ji bo azadiya xwe li himberê kolonyalîzma tirk lidar dixe. Gelê Kurdistanê iro roj ji li himberê cenga bi qirêj berxwedana xweyî netewî didomîne. Vêca Huseyîn Kaytanî mirov mîna te “mafê Sezarî nade Sezar”. Lewra gelê Kurdistanê serê xwe li himberê hêzên kolonyalist û nûkerên wan yên di welatê me de netewan-diye û herdem li himberê koletiya koledaran bi dengê xweyî bilind gotiye: “NA”. Ji ber vê “NA” yên wî her dem hêzên kolonyalist bajar û gundêñ wî kirine kavil.

Nivîser bi vê yekê ji namîne. Ew di nivîsandina xwe de dibêje : “Rewşenbirî ji bo kurdan pirsgirêkeke cengê ye. Lî yên ku digotin em rewşenbirîn, dest bi ev cengê nekirin, hêza wan têrî vê cengê nedikir. Bi taybet ji destpêkê vir de di nava cenga ku li Bakurê Kurdistanê tê bicîhkîrin de gundî û xwendevanêن xort hebûn.” (2) Gelekî rast e ku xwendevanêن xort û bi taybet gundiyyên Kurdistanê ji destpêkê heta iro divê cenga dijwar de ku di salêñ dawî de tê birêvebirin xwedyê rolekî girîng in. Lî kî karê bibêje ku di serîhildana Cizîra Botan, Nisêbîna rengîn û ya Amedê de rewşenbirîn mîna Wedat Aydin, Musa Anter û ed. nebûn. Ma ne ji ber vê yekê ew ji aliyê celadê tirkân ve hatin teror kirin? Ma Mehmed Sincarî û hevalîn wî ne ji ber xebata wanî siyasî ro bi nivro li Batmanê hatin gulebarankirin? Ma ne ji ber xebata rewşenbirî, siyasî û kulturi hema bibêje hemû berpirsiyaren roj-name û kovarîn me kurdan ji aliyê komara tirkîyê ve bi madî û manevî hatin ceza-kirin?

Ji aliyê din ve ji Gunay Aslanî di nivîsandina xwe ya li ser ronakbîran de dibêje : “Lewra di cîhana me de mînaya rewşenbirîn kurd bê emsal e! Rewşenbirîn tu wela-tan wek yên me li pêşberî têkoşîna tevgêra rizgarîxwaz ya netewî derneketine, êriş nebirine ser. Divê yekê de berevejîtiyek heye.” (3) Di destpêkê de divê ku bê gotin du aliyê vê berevajîyê hene. Ya yekem ew e ku, Gunay Arsalî tevgêra rizgarîxwaz ya netewî û PKKwek hev dibîne. Yen ji derive ji - ci organîzasyon û ci rewşenbir-mîna êrişkeran dinirxîne. Ji bo vê yekê ji ew ji dêla ku daristanê li gel hemû darêñ wê yên sîn bibîne, bi tenê ew darna wê dibîne. Çimkî tevgêra rizgarîxwaz ya netewî bê çawa darîstanek hemû daran himbêz dike, her weha ew ji hemû tevgêran - ci yên demokratîkî, politîkî û ci yên rewşenbirî- himbêz dike. PKK yek ji wan e. Bê

guman divê ku bê gotin PKK di dîroka tevgêra rizgarîxwaz ya van salên dawî de rolekî ber bi çav dileyize. Li welêt di pêşivantiya PKKê de li himberî cenga bi qirêj ya ku ji aliyê dagirkerên tirk ve li himberî gelê Kurdistanê tê bicîhkirin, berxwedaneke çekdarî bi awayê gerîla tê birêvebirin, li derveyî welêt jî di warê siyasi de hêdî bi hêdî li pêşberî kolonyalistên tirk xwe bi cîh û war dike. Li gel vê yekê jî divê ku kar û xebata partî, rêxistin û grubê din jî bê dîtin. Lê mixabin ev yeka ha di awayê akilmendariya Gunay Aslanî de hatiye kesixandin.

Aliyê din yê bêrevajiyê ew e ku ji heyama "Qal û Bela" yê ve tê gotin "Bi pirranî di nava rewşenbîr û hunermend de duruşmên sipehî yên azadiyê li pêşberî azadiyê tên bikaranîn, bi vî awayî jî him di vexurtina xwe de bi ser dikevin, him jî li pêşberî geshbûna giştî mîna hewldana çîneke paşverû weke latekê dirawestin. Li himberî azadiyê "azadî!" (4) ji vê yekê virdetir "Hewldanê rewşenbîrên kurd yên ku mîna yê berî, şoreşger jî têx xwiyakirin ji bo têgihiştina vateyên wan bê çiqasî dê li dijî şoreşê bin, pêwîstê bi analîzên kûr nîn e" (5) Vêca dozaja êrişen di rêzên jorfin de bi hêsanî tê xwiyakirin. Ji ber vê yekê jî pêwîstî bi şirovekirinê nîne. Lewra ev siyaseta awirteng û bi yek alî ji heyama "Qal û Bela" yê ve li pêşberî rêxistin û rewşenbîrên Kurdistanê tê birêvebirin. Ma gelo haya Gunay Aslanî ji vê siyasetê ku ji êrişan hatiye barkirin nîne? Çima hinek êriş têx dîtin, lê hinek nayêx dîtin? Divê ku mirov serê xwe li ser vê yekê biêşnê da ku mirov karibe pirsgirêkên civata xwe çareser bike. Lê ne bi yek alî.

Beriya her tiştî divê ku mirov xwediyê asoyeke netewî be. Hinganê mirov kare tevgêra rizgarîxwaz ya netewî bi hemû aliyên wê bibîne. Bi alîkariya nerîneke weha hevbes û birêkûpêk mirov kare nakokiyêن civata Kurdistanê yên "daxilî" çareser bike.

Ji ber ku baş tê zanîn heta îro nakokiyêن "daxilî" yên civata Kurdistanê ji aliyê dînamîkên netewî ve bi awayekî aşîti nehatine çareserkirin. ji ber vê yekê jî dijmiyên kurd û Kurdistanê dînamîkên netewî yên civata Kurdistanê li gorê demê - carna bi awayên aşîretî, carna bi awayê olî, carna jî bikaranîna transformîzmê ji bo kedîkirina rewşenbîrên "me" kurdan - ji hev perçekirîne û bi vî awayî ji rewşa welêt ya wêrankirî bêtir ji hev ketiye, lê desthelatdariya hêzên dagirker bêtir hatiye bi hêz kirin. Bi awayî dibe bila bibe divê ku hêzên me yên netewî vê rewşa serûqunî bibînin û ji bo çareserkirinê hewldanê xwe bi leztir bikin. Bi ya min dermanê vê yekê ew e ku hêzên netewî di nava xwe de aşîtxwaz bin. Lê li pêşberê hêzên dagirker piştgiriya hev bikin, da ku fêñ û fûtêñ hêzên dagirker bêñ dîtin.

Çavkanî

1- Ozgur polîтика

2- = =

3- = =

4- Serxwebûn - Hejmar : 169

5- = = =

NIVÎSKAR ÇIMA PÊWISTÎ BERSÎVA HINEK TIŞTAN E?

Medenî FERHO

Weke pirr tiştên din, nivîskarêñ Kurd hê bersîva nivîskariyê, bersîva pêwistî û karbendiya nivîskariyê ne da ne. Rast e!... Ne hêsanîye!... Ev bersîv di demek kin de û nifşekî de nayê dayin. Dîroka nivîskariya Kurd ne dirêj e... Ji **dibistana Mîr Celadet**, yan jî **dibistana Hawarê** û vir de, gavêñ dijwar û fereh nû nû têne avêtin. Lewra jî, dîrok gutebir bû ye. Navber jî ne hindik e... Dora pêncih salî ye... di vê navberê de yekî mîna **Cegerxwîn**, bê rawestandin meşî be û gihabe nifşê me û al da be destêñ me jî, ji bo dîroka nivîskariya Kurd qelsî ye, misrîtî ye... Ku em dêhnê xwe didine nivîskarêñ **dibistana Hawarê**, pirr kesan ji wan jî berhem ne da ne. Bo dagirtin û evîndariya nivîskariya Kurdî, pirraniya wan bi işk û tujikêñ **Mîr Celadet** nivîsîne. Ew kes jî demedorêñ wan jî, ji nava tevgereke tuj û dijwar, ji nava serhildaneke pelixî û şikestî hatibûn. Çenda ji wan bîranînêñ xwe nivîsîne, li ser bûyer û kêmasyiyêñ rêxistinî rawestiya ne. Ë ku hene jî hêrişen hember hevûdin in, sixêf in, reşî ne. **Osman Sebrî** û **Ekrem Cemîl** jî di nav de... Car din em, dilşahiya xwe tînin, gorbihitiya wan ji Yezdan niyaz dikin û pîrozbahiyêñ xwe nîşan didin.

Helbet bêhêzî û misrîtiya pirtûkxana Kurdî jî, wê wilo derbikeve meydanê û hember demedorêñ xwe, korîk bimîne... Ev sedeme ku pirraniya pênûşşorêñ(*) me bi guhikê abayê nivîskarêñ bi tuxmêñ xwe Kurd, bi raman û pênûş û biryara jiyana xwe ne Kurd, digirin û ber bi hêla koma nivîskarêñ Kurd de dikişînin. Helbet gomanek e... Gomanek bê bersîv e... Hêviyêñ bi tayêñ xaf ve girêdayî ne... Car din hêvî kirina hinek kesan e ku li gorî baweriya min, nabe war ji Kurdan re.... Baweriyeck dilxwazî ye... Dawî wê pûç derbikeve... Heya hingî jî em û media me di xizmeta wan de ye... Mîna îro, ji bedêla pirtûkêñ Kurdî bêtin nasandin, yên wan wê bibin dabaşa rojane... Dilê me, parîkî bi kovarêñ me xweş e... Bi hejmara xwe hindik bin jî, bi belbûna nava xelkê, qels jî bin car din hêvî ew in... wekî din, rojnameyêñ rojane ji nasandin û piştgiriya nivîskarêñ Kurd dûr in...

Pêñûşşorêñ me jî dizanin ku yek ji wan nivîskarêñ navdar, xwedî cîh û qedrûqîmet, pihîna xwe li firaza xwe naxin, daw û delingên xwe na çîçkîkênin, nûjen dest bi karûbarê nivîskariya Kurdî nakin. Kes qîma xwe bi nivîskariya Kurd nayîne... Tu sedem jî tuneye ku bînin... Pirr nivîskarê ku xwe Kurd dihesibînin jî, ku di nava civata Kurd de ne, yan jî xwe wilo dihesibînin, rojekê, di yek gotin û nivîsandina xwe de zimanê Kurdî, ji xwe re ne kirine mijulayî û bala xwe bernedaye ser ramana Kurdî. Zimanê rojane di nav de... Standêñ rêxistinan bi pirtûkêñ wan kesan dagirtî ne, lê ew rêxistin hêzê di xwe de dibînin ku ambargo li ser pirtûkêñ Kurdî dañin. Heger hin doza ayankirinê bikin, ez dê yek bi yek bi hejmêrim. Bo kes nekevê bin kirasi demê û xwe ji bo pêwistiya bi zimanê Tirkî û mesajan ne xapîne. Serdar û rêzanê Kurd, polîtîkvanêñ Kurd vî karî dikin, hewceyî lêkolînan li ser çanda Kurdî bi zimanê Tirkî, ji teref pêñûşşorêñ Kurd nîne. Ev karûbar, çanda Kurdî jî, bi giştî epopa kurdî teva weran dike. Mînak: Lêkolînek bi Tirkî li ser **Evdalê Zeynikê** bête kirin, gotin, leyлан, dîlok û stranêñ wî teva bi Tirkî bêne nivîsandin. Ev tê çi manê? Heya îro jî kesî lêkolînêñ wilo ku ji bo çanda Kurdî kirine hember çanda kedxwaran tu hêz bi kar naniye. Ez bi xwe tu ferqiyetê di navbera wan û **İbrahim Tatlıses** de nabînim. Bêgoman ferqiyetek pirr mezin heye, yek jê xwe zanîst û tacâ serê komên xelqê dibîne, yê din jî di dilê xelkê de text divegire û bi tacek têr dirri dirûne....(?) Çima em xwe dixapînin û lêgerên û lêkolînêñ xwe, bi xwe dest, di nava xwe de nakin? Helbesta xwe, çîroka xwe, romana xwe bi zimanê xwe na nivîsin? Tê nagihijim, sedem çî ye? Xorten xwedî cewher roj li roja din zêde dibin. Roj nîne ku ji hêlekê ve çîrisandinek, xwe diyar nake. Çi li welat, ci li derî welat... Nivîsarêñ wan jî, têkilî û çalakiyêñ wan jî hêviyek mezin didin. Di nava tuneyî û tevnepîrka pirsgirêkan de, rê û şivîleyan dibînin, dengê xwe digihînîn komê xelkê. Çi bi pirtûkan be, ci bi nivîsarêñ rojname û kovaran be.

Sê pirsên din: Gelo nivîkar, berpirsiyarê dema xwe ye, yan berpirsiyarê demsalan e? Bili vê pirsê, şîrovekirina dîrokî derdikeve hemberî me. Tewanbariya nivîkar hemberî dîrokê... Û herdu pirsên din: Gelo nivîkar berdevkê gelê xwe ye, yan jî çavdarê hemdemâ xwe ye? Berdevk û çavdarî çîqasî nêzîkî hevûdin in? Kesên bi Tirkî dizanin teva dît in û xwendin, çend rojên dirêj ku guftûgoyek xurt, lê ne bi hêz di navbera rewşenbîran de domand. Ku we bala xwe dabê nivîsaran, *ew guftûgo, ne di navbera rewşenbîran de çêbû*. *Nivîskaran li ser rewşenbîran nivîsî*. Ji ber ku rewşenbîren ne pêñûşşor têkilî vê guftûgoyê nebûn. Gotin li ser giştî bû, lê ew rewşenbîren bi

navûdeng lê ne pênûşşor li meydanê tunebûn. Bêhêzî û tevgera bi tayê xaf ku bihevûdin ve girêdayî û destpalandina demedoran, ji vê tê. Civata Kurd xwe ji gunditî xelas ne kiriye. Polîtîkzanê me, nivîskar û rewşenbîrên me jî di nav de. Ya em nayêñ cem hevûdin, ku em hatin jî pevcûn e....

Helbet berdevkiya gelan, berdevkiya deman ne hêsanî ye. Kar jêre divê. Berhem pêwist in. *Tu xelat jî tune ye...* Ne xelat bi tenê, *xwendevan jî tune ne...* Bilî vê, ne rexne, hêrîşen dijwar hene. Rexne, karekî zanistî û lêkolîngerî ye... Hêrîş jî, di bingeha xwe de feodalîzmê dihilgire... Helbet kes qîma xwe bi van bûyeran nayîne. Serê ku ne eşe, ne hewceyî girêdanê ye. Lê, kurê ciwamêran ne wilo kirine. Sînga xwe dane ber derban û hemberî çewtiyan bi hêz rawestiya ne. Gotine û kirine. Kirinêñ wan teva, ne gotinêñ ber hêt û berberojkan e, berhem in... *Birçî mane nivîsîne... Hatine girtin nivîsîne...* Hatine sergom kirin, nivîsîne... Lê ji ya xwe nehatine jêr û berhemêñ çê derxistine meydanê... Li cîhanê teva wilo bû ye. Bêgoman, kesê lingê xwe li erdê daye bi serketiye. Helbet di rêya rastiyê de... Kesê ku berê xwe daye nûjeniyê, serkêsiya ramanê nû û guhertinê û tevgera hemdemî kiriye, gihaye armanca xwe. Çiqasî li ber şekûpeka katibe jî, dîrokê ew xelatgir kiriye. Di dilê gelê xwe de bû ye xwedî textekî zêrîn û tacake dirrî... Berdevkiya gelê xwe jî kiriye, çavdariya dema xwe jî kiriye. Bo nifşen pêşerojan jî bingehêke bi hêz daniye. Heger ne gihabe avaniya ramanê gelê xwe avabike jî, bûye kevirê herî mezin û bihêz di bingeha wê avaniyê de.

*Y*eke din: Em hevûdin rexne nakin. Em, hevûdin birîndar dikan. Ji ber ku nêrînêñ me, ne rexnegîriya çandî û zanîstî ye. Polîtîkî ye... Nizanim, rexne û polîtîka ci dibêjine hevûdin? Şaşîtiyek heye. Di nava Kurdish de, hê nivîskarî, rojnamevanî, polîtîkzanî, zanîstî ji hevûdin cuda ne bû ye... Bi giştî bala xwe bidine nivîsarên di rojname û kovaran de... Ji hevûdin nayêñ cuda kirin. Ziman û encama nivîsaran ji hevûdin cuda ne bû ye. Zimanê pirtûkan, zimanê nûçeyêñ di rojnameyan de, zimanê polîtîkzanî û zimanê zanîstî nabe yek û nakevê qalibekî de. Ji hevûdin cuda ne. Her kes di her hêlî de pênûşşoriya xwe berdewam dike. Kes jî dengê xwe nake.

Zordestiyeke mezine ev. Zordestiyek ku avaniya çanda Kurdî bê bingeh ava dikê ye. Lewra jî, em destêñ xwe li derî xwe ne palênin û guhikê sakoyê kesî ne girin. Em bi xwe bikêrî xwe werin û bersîva demê bidin. Bersîvdana demê, bersîva hewceyiya gelê Kurd e.

(*) **Pênûşşor :** Kesên pênûsan dide axaftin, bi pênûsê şor dike.

DI ZANYARÎYÊ DE METOD

Zanyarî di hêlek de metod e. Karanîna metoda zanyariyê bi her awayî girîng e. Di pêşketina civan-kan de, metoda zanyarî rênîşandaneke îlmî ye. Mirovêن zanîst ji bo pêşketina civakê gelek xizmetên girîng kirine. Descardes sîstema ramanî ya Kartezyenê afirandiye. Newton zagona erdkişandinê afirand. Hegel zagonêni diyalektîkê afirand. Marks bi ramanêni xwe yên zanyarî cîhanê hejand. Arîstoteles zanyarekî biolojî, astronomî, fizikerî û ansiklopedîkî yên dema qedîm bû.

Zanyarî dişibe hunerê. Beethoven hunera muzîkê bi metodek zanyarî afirandibû. Bi metoda zanyariyê zagonêni îlmî yên xweza û civakê tête afirandin.

Balzac bi metoda romannivîseriyê li sazûmana dewlemendant rexne

girt. Chernîşevskî di romana xwe de bi metodek zanyarî bîr û ramanêni pêşveçûyînê hanî zimên. Tolstoy di berhemêni xwe de bieqiliyê, zanabûnê derxist pêşberê xwendevanan.

Metod ji bo fîrbûniyê riyek e. Ji bo zanabûniyê pêwestiyek e. Zanabûniya her tiştî ji bo xwe metodeke wê heye. Wek mînak, metoda zanabûniya Matematîkê cuda ye, ya fizîkê cuda ye. Metoda zanyarîya civakê ji wan hîn cudatir e. Felsefe metodekê wisan e ku rîbaziya her tiştî dike. Metoda felsefîk rênîşandan e. Metodêni civakî û xwezayî li gor zagonêni wan têt bikaranîn. Hemû fîrbûnêni îlmî-zanîstî li gor xwe û bi xwe re metodan pêk tînin. Metodêni zanîstî li gor rastîya zanîstî tête afirandin. Ji bo perwerdekirinê jî metodek zanîstî pêwîst e.

Kovara Helwest

EDEBÎYAT Û ZANYARÎ

A. NISÊBÎNÎ

Civata gelê Kurdistanê civateke kevnar û rengîn e. Naqş û rengên wê her ku diçe bi têkoşîna keç û lawê Kurdistanê yên hunermend û têgihîstî dixemile. Mirov karê bi hêsanî bibêje ku huner bûye birrek ji jiyana gelê Kurdistanê di serpêhatina dem û dewranan de. Ji xwe mirovê ku haya wî ji dîroka gelê Kurdistanê ya kevnar hebe, dizane ku hunermendê civata Kurdistanê - mîna dengbêj, şair û ed - herdem şevbêrkên me Kurdan bi hunera xweyî rengîn jîyan û can danê. Bi saya kevneşopîyeke weha bê westan hunera gelê Kurdistanê ji nivşekî gihîştiye nivşekî din di serpêhatina dîroka Kurdistanê ya kevnar û nûjen de.

Ji aliyê din ve jî divê ku neyê jibîrkirin ku welatê me Kurdan ji aliyê hêzên dagirker ve ji sedsalan virde hatiye parçekirin û wêran kirin. Vê parçekirin û talankirinê bi gelek alî rê li pêşveçûna huner girtibe jî, hunermendê me yên gelêrî herdem bê westan hewldane ku kultura xwe ligel hemû şaxên wê yên hunerê pêşve bibin.

Lê bela ku Kurd di welatê xwe de ne azad in, tu mecal nedîtine ku dezgehêx xwe yên netewî damezrîniin ji bo ku karibin ziman, huner û bi giştî kultura xwe li gor dem û dewranan bi awayekî ku ji wan tê xwestin bi gelek alî ges û bal bikin. Ji ber vê yekê jî edebîyata Kurdî ya devkî ji edebîyata Kurdî ya nivşkî bêhtir di nava rafêن gelê Kurdistanê yên curbicur de şax û per da. Bê guman vê pêşketina edebîyata Kurdî ya di warê devkî de materyalekî giranbiha vexwendî hunermendê gelê Kurdistanê kir ji bo lêkolînên edebî/hunerî. ji xwe di vî warî de hunermendê Kurd kar û xebateke rengîn didomînin. Ev yeka ha jî dibe pevgirêdanek di navbera paşeroj û pêşeroja civata Kurdistanê bi xwe. Lê belê kare bê pirskirin: Bê çawa ev materyalê giranbiha yê edebîyata devkî û edebîyata nivşkî - bi taybet jî hunera romanê - ji bo lêkolînên hunermendan dibe mijar, her weha ev materyalê giranbiha kare bibe serçavî ji bo lêkolînên zanyarî û ramanî di serpêhatina jîyana civakî ya rojane de? Bi ya min erê! Lê çawan?

Çawabûna wê jî divê ku mirov di nav vegotin û nirxandina berhemên hunerî de vebêje ji bo ku peywendiyyê bi reng dîyalektrîkî di navbera berhemên hunerî û zanyarî de bêñ danîn û bi vî awayî jî xwendevanên hêja û delal bibin xwedî zanîstî di derbarê pirsgirêkên hunerî û zanyarî de bi herikandina jîyana rojane

re. Ji bo vê yekê jî, divê ku merivê hunermend vegotina xwe ya hunerî heta ku jê bê bi zimanekî gelêri vebêje. Lewra em dizanin ku berhemên hunerî mîna berhemên zanyarî - bi taybet yên xwezayî - ji merivên xwedî pîspor re nayin berhemkirin. Ew ji bilî pîsporan, ji refen gel - karker, gundî, rewşenbûr û ed - ra têr pêşkêşkirin. Heger zimanê vegotina berhemên hunerî ne zelal be, hinganê merivê xwedî pîspor bi tenê têde dighin lê ne refen gel. Di vî warî de gelek materyal di destê me de hene, lê ez dixwazim ku hinekî li ser romana Mehmed Uzunî ya bi navê "Rojek Ji Rojê Evdalê Zeynikê" rawestim. Bi vî awayî jî pirs-girêkê ji hev vewejeûrim.

Meriv dema ku romana Mehmed Uzunî ya bi navê "Rojê Ji Rojê Evdalê Zeynikê" dixwîne, dibîne ku Mehmed Uzunî di vê romana xwe de ji jîyana Evdalê Zeynikê wîrdetir civata Kurdistanê ya serdemâ Evdalê Zeynikê ku bi gelek alî ji aliye hêzên dagirker ve hatiye wêran û kambax kirin bi zimanekî destankî peşkêşî xwendevanan dike. Lewra baş tê zanîn ku "mirin, kuştin, şewat, nalîn, qêrîn û hawar bûn nan û ava me, welatê me bû xirbe û kavil. Xwedayo... niha ew çiya, zozan, deşt, şikeft, bajar û gundên welatê Kurdistanê bikaribûna bipeyviyana û serpêhatiyê xwe bigotana! Hey lê gidî.... wan ci dîtin, ci nedîtin!.. Hema meriv çavê xwe li van bûyerên 34 salên dawîn bigerîne.... ji 1900î vir ve, ji nîv miyonê bêhtir Kurd hatin kuştin. Û welatê Kurdish bû çar perçe. Şerê malkambax ê cîhanê bi sed hezaran Kurd birin gorê. Di serîhildanê Kurdish ên 1925, 1927-28, 1930an de jî, dîsen bi deh hezaran Kurd serê xwe danîn." (*1) Hovîtiya hêzên dagirker bi vê yekê jî qâl nebûn, lewra "iro li tirkîyê kesên ku bi Kurdî dipeyîvin, têr cezakirin. Ceza gotineke Kurdî qurişki ye. Du gotin du quriş, sê gotin sê quriş. Hey gidî dinya malbax hey!.. (*2) Vêca rewşa welatê me Kurdish netu rewşe. Di vî welatê weha bê xwedan de ku Evdalê Zeynikê kor bibe ma gelekî seyr (ecêp) e? Ma ku evîna Bengîn û Meyro di civateke weha ji hev ketî û parvekirî de bibe bigoriya nûkerîya Egîd Begê zehf seyr e? Bi ya min na!

Ji ber vê yekê jî Kurde mîrxas, welatperwer, xwedî mirovantî û berdevkê gelê xwe yên mîna Tahar Xanî her dem li berxweda bin jî, paşayê Osmaniyan bi alikariya nûkeran rê li ber wan bi hêsanî girtina. Bi vî awayî jî Kurd bi darê zorê ji welatê xwe hatine xwînî kirin. Bi vê xwînîkirinê jî ol, folklor, huner û zimanê Kurdish hatine talankirin. Ji aliye din ve jî namûs û xîreta Kurdish hatiye bin ling kirin. Ma qey hunermendê bi navûdeng, cîgirê dengbêjê dengbêjan yê Evdalê Zeynikê Şêx Silê ne ji ber vê yekê ji welatê xwe hatiye xwînî kirin! Tê zanîn ku civata Kurdistanê weke gulîstaneye bihara rengîn e. Ji bilî Kurdish di vê gulîstana rengareng de birayê Kurdistan Ermenî, Asurî-Suryanî, û êd. ku bi hezar salan li kèleke Kurdish mîna hemwelatî û cîranan bi cîh û war bûne, bi tevtêdana paşayê Osmaniyan bûne dijminên hev û qirkirinê bi gemar û qirêj li ser vê xakê hatin li dar xistin. Bi vî awayî mirovantiya bavê temo, bapîrê

dengbêjên Kurdan, hostayê edebîyata Kurdî ya devkî Evdalê Zeynikê di nav vê dirindîtiya (zalimtiya) paşayê Osmanîyan de tê windakirin û dijminatiya di nav van biran û cîranan de heta ku ji paşayê Osmanîyan hat xurtir kirin. Lê wê rojekê bê mirovperweriya Evdal û Gulê mîna pêlên Dîcle û Feratê bi ser pêlên fitna paşayê Osmanîyan bikeve. Hinganê wê nûkerên mîna Egîd Begê bi ku de herin. Nûkerên ku bi hezaran salan bûne kelem li pêşberê azadî û zanyarîyê di welatê bavûkalên xwe de. Bi vî awayî jî welatê xwe xistin nava tarîstana ne-zantiyê. Ji ber vê yekê jî divê ku mirov li ser nûkerîya di welatê me de raweste. Ez bawer dikim ku nûkerîya di welatê me de mîna yêngelî welatê din ku ji alîyê rewşenbîr û sîyasetmendêngelî wan bi rengbêrên (sîfatêngelî) komprador, çete û axayêngelî cengê dihatin binavkirin, mirov nikare nûkertîya di welatê Kurdan de weha rengdêr bike. Lewra van "komprador û axayêngelî" yêngelî gelek welatan bi gotinê be jî xwedî li welatê xwe derdiketin, lê nûkerên "me" ci dikan?. Tu berpirsiyareke wan ku xwedî li welatê xwe derkevin ji kar û barê wan tu carî nehate xuyakirin. Bi ser de jî ew her dem bûne paşmîr ji bo hêzên kolonyalist ku welatê me tar û mar dikan. Ez bawer dikim ku navê herê baş ji aliyê gelê Kurdistanê ve li wan hatiye kirin "caş" ango mirovê ji keran. Lê ne jî me Kurdan.

Îro jî "cahşikêngelî keran" xwe difroşin kontrayê tîrkan û li Nisêbîn, Batman û Silvanê û ed. xort û keçen Kurdan ro bi nîvro didin ber gulan.

Vêca Mehmed Uzunî di romana xwe de bi awayekî xeyalî be jî li ser hinek pirsgirêkîn kronîk yêngelî civata Kurdistanê - mîna dabeşkirina Kurdistanê, parçebûna Kurdan ya alî eşîretî û ed- karin bibin mijar jîbo lêkolînvanêngelî zanyarî ji bo rewşenbîrên me Kurdan di serdema me de. Lewra serdema me serdemeke dîrokî ye ji bo pêşerojê gelê Kurdistanê. Ji alîkî ve dewletêngelî kolonyalist hewl didin tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê ji binî ve vernirînin, lê ji aliyê din ve jî keç û lawêngelî Kurdistanê têkoşîneke bê westan li nava welêt û derveyê welêt li dardixin ji bo ku tevgêra xweyî rizgarîxwazî di hemû warê jiyanê de pêşve bibin. Bi vî awayî jî nîrêngelî kolonyalîzma tirk, fars û ereban li ser xaka niştîmana xwe rakin da ku bingehê welatekî serbixwe, civateke azad û demokratik bê danîn.

Ji bo vê yekê jî berhemên edebî û bi taybet hunera romanê di serdema me de xwedî rolekî girîng yêngelî dîrokî ye. Ji alîkî ve hunera romanê zimanê Kurdî yêngelî serkutkirî divejîne, ji aliyê din ve jî pirsgirêkîn civata Kurdistanê yêngelî olî, civakî, kulturî û aborî destnîşan didin.

Lê ev destnîşandana berhemên edebî ji destnîşandana berhemên zanyarî di warê metod û materyal de ji hev cûda ne. Lê xwedîyê yek fonksiyonê ne. Di pêvajoya afirandina berhemên hunerî an jî edebî de bikaranîna metod/materyalê bi reng çavderî dibe gava pêşî ji bo bi destxistina rastîya cîvakî an jî xwezayê bi xwe ye. Divê neyê jîbirkirin ku bi destxistina rastîye ji kar û barê

çavderiyê wirdetir e. Ji bo vê yekê ji merivê hunermend an jî edebiyatzan ji merivên ku bi pirsgirkên zanyarî mijûl dibe bi kêmtiler materyal berhemên xweyî edebî/hunerî diafirîne. Dema ku merivê hunermend weha nekire, hinganê bi hêsanî dikeve davka ampirîszmê.

Edebîyatzanen ku berhemên xwe bi alîkarîya hewldanen çavderiyê bi tenê dihune, weka masîyê di nava çemê çilkanî de li rastê dimîne. Bê çawa masîji durketina avê dûrî jîyanê dibe, her weha hunermendê ku di xebata xwe de, ji afirandinê bêhtir metodên çavderiyê an jî materyalê zanyarî bikartînin ji jîyana hunermendiyê dûr dikevin. Bê guman di hunandina berhemên edebî/hunerî de dîrok an jî zanyarî tê bikaranîn. Lî ne bi awayekî ku motîvên zanyarî an jî dîrokî tekstên edebî di nav xwe de winda bikin. Bi qasî ku tê xuyakirin Mehmed Uzunî di vî warî de bi serketiye. Lewra Mehmed Uzunî xwe berdide nav xeyaleke hûr û kûr û xwe dighîne serdemâ bapîrê stranbêj û hostayê edebiyata Kurdî ya devki Evdalê Zeynikê. Di vê heyamê de rewşa civata Kurdistanê ya kevnar li gel nakokiyêne wê bi gelek alî ji xwendevanan re pêşkêş dike. Bi vê pêşkêskirinê re mirov dibîne ku civata Kurdistanê çendî alov û ji hev ketî ye. Kurd li himberî dijminen xwe bê mecal in. Bê bav û kalêne me çima weha bê rêxistin bûn? Lî, li pêşberî hev çendê şer û mîr in ma ne ji ber vê yekê ku evîna Xeça Resul û Siyamendê Silivî bi awayekî dramatîk tê bi dawî kirin.

Vêca ev alozî û pirsgirêkên ku di rêzen jorîn de bi awayekî kurt di serpêhatina vegotina romanê de ji aliyê nivîser ve hatine dest nîşankirin, karin bi hêsanî bibin mijar jibo mirovîn organîzator, dîrokzan û sosyologên roja me da ku rewşa welatê Kurdan, Kurdistan bêniyxandin û li gorê ku ji wan tê xwestin pirsgirêkên xweyî netewî, cîvakî û navnetewî çareser bikin. Biqasî kû tê xuyakirin dînamîkên civata Kurdistanê jî hêdî bi hêdî li welêt û li derveyî welêt xwe organîze dikin. Bivê-nevê dê rwşenbîrên me di van dezgehênen xweyî netewî de cih bigrin. Hinganê jî dê rola xwe bi awayekî bi rêk û pêktir bileyîzin.

Ji aliyê din ve jî dema ku mirov romana Mehmed Uzunî ya bi navê "Rojek Ji Rojê Avdalê Zeynikê" dixwîne, hinganê mirov dibîne ku zimanê wê ne bi çeşna romanê hatiye nivîsandin. Lewra em baş dizanin ku çeşna zimanê romanê çeşnekî nûjen û hevdemî ye. Bi gotinek din bê çawa zimanê serdemâ burjuvazî ji ya heyama kevnar ya bi reng feodalî bi çeşn û vegotinê bi rêk û pêktire her weha zimanê romanê ji zimanê destanan têkûz û rengîntir e. Lî Mehmed Uzunî ji zimanê romanê wirdetir zimanekî kevnar yê civatabihurî bikaranîye.

Di serpêhatina vegotina romanê de bikaranîna zimanekî weha kevnar hîştiye ku awayê vegotina zimanê romanê lawaz bibe. Karê bê gotin ma qey mirov nikare hunera romanê li ser bingehê serçaviyêne kevnar -mîna destan û mítolojîyan- ava bike? Bê guman roman karin bêni hunandin li ser bingehê çavkanîyen kevnar. Lî ne bi zimanê wan. Çimkî mirov bi alîkarîya hunera romanê şêveyen vegotina nûjen di berhemên edebî de diafirîne. Bi vî awayî jî

him vegotin jîndartir dibe, him jî edebîyata netewî hêdî bi hêdî ber bi globaltiyê ve diçe. Ev serpêhatina ha jî diyardeke (fenomenike) gelek pîroz e di dîroka edebîyata netewî de.

Ji bilî zimanê kevnar yê civata bihûrî ku ji alîyê Mehmed Uzunî ve di hunan-dina romanê de bikaranîye, ziman bi xwe jî carna aloz e, carna jî kêm û tevilhev e. Ji ber vê yekê jî ez dixwazim ku di rêtîn jérîn de çend mînakan pêşkêşî xwendevanan bikim da ku pirsgirêk bê zelal kirin.

Di hinek cihan de hinek hevok hatine bikaranîn mirov nikare bi hêsanî xwe di wan de bighîne. Yek ji wan hevoka ev e: “Çika tu dengekî derkeve û ji me re çend stranan bibêje”(*3) Belkî amanca nivîser bi hevokê ew e ku dixwaze bibêje: Heta ku dengê te derkeve ji me re çend stranan bibêje. Hinek caran jî mîna ku nivîser bi awayekî ku bi xwezaya zimanê Kurdî re nagunce hinek hevok bikaranîne, mîna hevoka “Axîneke kûr ji siyabend rabû û got ’wey felekê tu çiqas li min xayîn î” (*4) Bi ya min ku di şûnê de bigotana “Axînêke kûr bi Siyabend ket....” dê baştıir bûna.

Her weha nivîser di gelek cîhan de daçek (edat) bi awayekî ku bi hevokê nakeve bikaranîye. Mîna ku ew dibêje “Gulê wê şevê devê xwe venekir û stran negotin, ji ber ku Evdal bi têra xwe hebû” (*5) Bi ya min ku di şûnê de bigotana “Gulê wê şevê devê xwe venekir û stran negotin, ji ber ku Evdal têra xwe hebû” dê hevok serrasttir bibûna. Di cîhekî din de jî nivîser dibêje “Qede li dinê bikeve” (*6) Bi ya min ku şûnê de bigotana ; Qede xwedê bi dinê keve dê behtir bi vegotina zimanê Kurdî bikete. Di rûpelekî din de jî nivîser weha dibêje “Kurd û ermenan li hev dikirin, diçin û dihatin ser hev û bi hev re merivantî û kirîbatî danîbûn” (*7) Bi ya min nivîser di şûnê de weha bigotana, dê rindtir bibûna: “Kurd û ermenan li hev dikirin, diçûn û dihatin ba hev -cem hev- û bi hev re merivatî û kirîvatî danîbûn.” Lê ya herî balkêş ew e ku nivîser dibêje “Li jêr, nêzîkê konan hespekî kîre kîr dikir û diza û caniye dianî dinê” (*8) Bi ya min ku di şûnê de weha bigotana “Li jêr, nêzîkî konan, mehînekê hîrehîr dikir û diza û ciwaniyek dianî dinê.” dê baştıir bûne. Ez bawer dikim herkes baş dizane ku hesp naze. Çimkî hesp nêr e, ne mî ye.

ÇAVKANÎ :

- *1 - Rojek Ji Rojên Avdalê Zeynikê - Rûpel - 8
- *2 - Rojek Ji Rojên Avdalê Zeynikê - Rûpel - 8
- *3 - Rojek Ji Rojên Avdalê Zeynikê - Rûpel - 70
- *4 - Rojek Ji Rojên Avdalê Zeynikê - Rûpel - 56
- *5 - Rojek Ji Rojên Avdalê Zeynikê - Rûpel - 73
- *6 - Rojek Ji Rojên Avdalê Zeynikê - Rûpel - 145
- *7 - Rojek Ji Rojên Avdalê Zeynikê - Rûpel - 97
- *8 - Rojek Ji Rojên Avdalê Zeynikê - Rûpel - 140

HINEK XISÛSIYETÊN TAYBETÎ YÊN ROMANNIVÎSERAN

Cîhan DILŞAD

Romannivîsin bi serê xwe hunerek e. Romannivîsin kar û xebatek pîroz e. Di vê xebatê de ked heye. Keda mejî. Nivîsîna romanê hêsan nîn e. Jê re bêhnek fireh divê, sebir divê. Bi lez (acele), zûbizû roman nayê nivîsin. Romana ku bi lez , zû bi zû bête nivîsin ji alî edebî ve estekîka xwe qels e. Hinek nivîskar li ser romana xwe bi deh salan dixebeitin, yanî di demekê dûr û dirêj de berhema xwe diafirînin. Romannivîserê Kurd Mehmed Uzun (li gor agahdariya ku wî daye me) ji bo afirandina romana "Bîra Qederê" deh sal xebitiye. Ev keda deh salan berhemek hêja derxiste holê. Ev berhema wî ji berhemên wî yên berê çêtir e. Ji xwe xisûsiyetên taybetî yên roman-nivîseran yek jê jî ev e ku, ew pir bi sebir in, bêhna wan fireh e, bêwestandin xebata xwe dom dikin, yanî nawestin û ranawestin. Lê, ev nayê wê maneyê ku di demekê kin de jî roman nayê nivîsin. Hinek nivîskar di demeke kin de jî dikarin roman binivîsinin û dinivîsinin. Hinek nivîskar di salek de, hinek di du - sê mehan de roman dinivîsin. Azîz Nesîn di mehek de romanek dinivîsand.

Romannivîser ronakbîr in, jîr û zana ne. Bi saya jîrbûn û zanabûna wan berhemên edebî yên nemir têne afirandin. Romannivîser heger jîr û zana nebe, tembel, xantal û tiral be, nezan be, nikare roman binivîse.

Romannivîser divê bi her awayî ziman bizanibe ku bikaribe di berhema xwe de zimanekî edebî bi kar bîne. Xisûsiyetek girîng ên romannivîseran ew e ku berhemên xwe bi zimanekî edebî lihev dihonin.

Romannivîser divê çanda neteweya xwe û cîhana gelê xwe baş bizanibe. Romannivîserek ku rewşa cîvaka xwe nizanibe, çanda xwe ya netewî nizanibe, nikare berhemekê neteweyî ava bike.

Dîvê zanebûna romannivîser a felsefî hebe. Ew (romannivîser) wek fey-lezofek ji felsefê hayidar be. Zanebûniya wî ya felsefî ne tenê ji bo felsefa gelemerî, yan jî felsefeya li ser xwezayê (natûrê) be, zanebûniya wî divê li ser felsefeya Kurdan be jî. Ew, divê civaka Kurd, psîkoziya wê divê baş nas bike.

Divê nivîskar di derbarê mîtolojiya Kurd û Kurdistanê de xwedîyê zanabûnek be. Gelek bûyerên mîtolojîk ên Kurdan hene, nivîskar van bûyerên mîtolojîk bizanibe, ji bo wî gelek baş e. Bi vê zanabûna xwe, ew dikare bûyereke mîtolojîk bi teknîkek modern û bi estetîkek edebî wek romanek dikare ji nûh ve biafrîne.

Romannivîser divê zanîst û şahîdê dema xwe be. Lê, ev nayê wê maneyê ku ew dê bûyerê dîrokî û efsanewî nenirxîne û nenivîse. Gelek efsaneyên Kurdan hene, romannivîs dikarin wan efsanan wek roman binivîsin. Ji xwe gelek romannivîser bûyerên dîrokî û kesen efsanewî jî nû ve dihulqînin, wan ji nûh ve dijînin.

Gelek romannivîs serboriyênen xwe dinivîsinin, dîkin roman. Romanê serborî awayekî, şiklekî romanê ye. Di nav Kurdan de yê ku cara pêşîn vê şiklê romanê bi kar anîye û berhem afirandiye Ereb Şemo ye. Romana Ereb Şemo "Şivanê Kurd" romanek serboriyê ye. Di romanê weha de qehremanê romanê nivîskar bi xwe ye. Romana Mehmed Uzunî "TU" jî romanek serboriyê ye. Ji xwe gelek romannivîserên navdar bi serpêhatiya jiyana xwe, bi romanê serboriyê dest bi romannivîsê kirine û bi ser jî ketine.

Lê, di aliyê pîvana qelsî û bedewiyê de, romanê serboriyê -ji ber ku romanê yekemîn in jî- romanê qels in. Romana Ereb Şemo ya bi navê "Dimdim" romana serboriya nivîskar nîne, romana qumandarekî Kurd bi navê Xanê Çengzêrîn û berxwedana kelehek e. Ev roman, romanek bedew e, romanek bi serketiye. Romanê Mehmed Uzunî, "Sîya Evînê" û "Bîra Qederê" jî romana wî ya serboriyê, ji "Tu" yê gelek çêtir in.

Xisûsiyeta romannivîser yek jê jî ev e ku; serpêhatiyênen xwe wek roman dinivîse. Ev jî karê her nivîskarî nîn e. Hinek nivîskar serpêhatiyênen xwe wek bîranîn dinivîsinin. Ev cure nivîs, nivîsêne nesîr in, dûz in, hêsan in. wek romannivîsandinê zehmet nîn e.

Hinek nivîskar hene hem çîrok û helbest, hem jî roman dinivîsinin. Bi ya min giraniya xwe bidin li ser tiştek hîn baştır e. Wê gavê dikarin bi serkevin.

Kemal Burkay ewil romanek bi tirkî nivîsî, paşê teatirek(şanoyek) û çirokek bi Kurdî nivîsî, lê wî giraniya xwe da ser helbestan, nivîsandina şîrân berde-wam kir û bi ser ket. Mehmed Uzun jî hinek şîr nivîsî, lê giraniya xwe da ser romannivîseriyê û bi ser ket.

Ji bo nivîskarek (çîrok û wakîa nivîser, helbestvan an jî romannivîser) ber-dewambûna nivîseriyê gelek girîng e. Hinek nivîskar pirtûkek dinivîsînin û dev ji nivîsandinê berdidin. Divê dev ji nivîsandinê bernedin, hîn pirtir binivîsînin û xwe pêşve bibin, xwe bikemilînin û berhemên hîn baştıri biafrînin.

Romannivîserên Kurd gelek hendik in. Hemû li ser hev (yênu ku nûha dijîn û dinivîsînin) 10 - 15 mirovî nabûrin. Hinek ji wan roman nivîseran tenê romanek nivîsîne û êdî romana xwe ya duyem nenivîsîne. Dr. Naci Kutlay romanek bi navê "Zevîyê Soro" weşand, romana wî ya duyem hêj jî derneketiye. Mehmûd Baksî çend roman bi Kurdî nivîsî û weşand, lê wî romana xwe ya dawî bi Swêdî nivîsiye û weşandîye. Xurşîd Mîrzengî romanâ xwe ya yekem a bi navê "Sînor" weşand, romana wî ya duyem hêj jî derneketiye. Bavê Nazê, romanek weşand û di şûna xwe de rûniş, romana wî ya nûh (ev bû çend sale) derneketiye.

Romanivîserên ku tenê romanek weşandine ev in:

1 - Naci Kutlay - Tenê romanek nivîsiye -	=	"Zevîyê Soro"
2 - İbrahim Ahmed -	=	"Jana Gel"
3 - Şahîn B. Soreklî -	=	"Wendabûn"
4 - Temo Xemgîn -	=	"Pala Bêşop"
5 - Hesenê Metê -	=	"Labîrenta Cinan"
6 - İhsan Çolemergî -	=	"Cembelî"
7 - Bavê Nazê -	=	"Çiyayê Bi Xwînê Avdayî"
8 - Haydar Işik -	=	"Memîk Axa"

(Roman bi tirkî ye, lê nivîskar Kurd e û romana wî jî li ser axayekî Kurd e.)

9 - Alî Aslan = "Serçe"

(ev jî bi tirkî ye, lê li ser Keçikek Kurd e.)

Xwendevan li benda berhemên nûh ên van nivîskaran in. Divê ev roman-nivîskar cehd bikin, berhemên nûh biafrînin.

LI BER GUHXISTINÊN SIYA EVÎNA WINDA, RÛDÎNÊN EZMANAN YÊN KU NE YÊ ME NE....

Demîr OZLU

Werger : A. Nisêbînî

Ez bawerî dikim ku min Mehmed Uzunî ber bi dawiya havîna 1977an li civîna malekê ku gelek merivên binavûdeng jî tê de bûn, nas kir. Hinganê ez ji bo zemanekî "demkî" mihekê an jî du mehan hatibûm Swêdê. Mehmed Uzunî piştî 12ê Adarê 1971ê ku dema "nêçîra azadiyê" dest pê kir, mîna mahkumekî "gunahkarê ramanî" li girtîgehê serekî yên mîna Amedê, Mamakê, hat girtin, hêj di temenê xortaniya xwe de îltîcayê Swêdê kir, ji neçarî mîna peneberekî dest bi jiyanê kir.

Ev der cihekî zehf cûda bû. Ne bi tenê îklîm, demsal, jiyan, bi hemû awayî cihekî pirr cûda bû - Mala ku em lê bûn, di nîvê bajêr de li kuçeve naskirî ku bi navê Upplandsgatan bû - Lê bi roj û şevan ev kuçe bê çiqasî qar bû! Xwedyâ malê Elîn Clason ji malbateke Swêdî yeka naskirî bû. Li qata jêrîn şârekî Swêdî dima, ew jî derdiket qata jorîn, tevî civînêni li wir dibû. Bi qasî ku ez dizanim wê rojê di nav mehvanan de nivîskara pirtûkêni zarokan ya naskirî Astrîd Lîngren jî hebû. Ew mîna "dayika çîroka Swêdî" didan naskirin. Xanima bi temen li ba maseke biçûk di nav bêdengiyêke mutewazî de runiştibû. -Pişt xanî jî vikî vala bû- Rojê dest pê kiribû ku di dawîya mehîn havînê de ji van xakan dûr bikeve. A niha tîrêjêni ku li rengê erguvanê diçin, davêjin nav bexçeyên xalî yên nava dîwarêni rengkirî yên bircan. Li wê derê mirov xwe ji cîhanê durketî hîs dikir. Ew dema ku roj bi awayê ji kuçê derketî diçû ava. Li kuçê hertiş, heta bi siya kevirêni biçûk jî bê çiqasî li ser dikê dirêj dihat xuyakirin.

PENEBERÊ XORT

Ji xwe hefteyêni ku min dest pê kiribû bême Stokholmê bi vî peneberê xort re ku xwe ji Tirkîyê bêhtir dida edebîyatê, her dem me hevûdu didît. Ber bi dawîya 1977an ku min ji serpêhatîyêni cîvakî, sîyasî yên Turkiyê nefret dikir, piştî ku ez li Stokholmê bi cîh û war bûm, hevdûdîtinêni me hîn pirtir bûn. Mehmed Uzun ku di bîst û çar salîya xwe de ku ji neçarî bûbû peneberê sîyasî, bi qasî ku ez dizanim, xortê ku ji navçeyê kevnî kulturî yê "Ana-

doliyê” dihat, xwe bi hemû awayî dabû kultur û edebîyatê. Kêmasiyêñ xwe yên di zimanê xweyî zikmakî de, piştî ku dest bi nivîsandina zimanê xweyî zikmakî kir, bi awayekî zelal kêmasiyêñ xwe dîtin, zimanê xweyî zikmakî dewlemend kir, meyla xwe dida ser serçavîyêñ kevn yên vî zimanî. Ji xwe tirkîya wî ku hêj ji destpêka dibîstana seretayê hîn dibû, baş bû. Bi awayekî hiç(sûrat) hînî zimanê Swêdî jî bû. Ji serçavîyêñ hersê zimanan jî sûd werdi-girt. Di salêñ dawî de jî metnêñ xwe bi her sê zimanan dînivîsandin.

CIVÎNÊN QEHWEXANAN

Di temamê wê dema rejima leşkerî de, peyre demên nedemokratîk yê halo an jî wilo ku pişt re hatin, di mehîn havînî yên xweş de jî ku sar e, lê bi alîkariya medeniyeta hevdem ku bi awayekî hêsanî mirov di mehîn zivistanê de jî, ji sermê tê parastin, hema bibêje her rojêñ yekşeman di qehwexaneye-ke bajêr de *A la mode* ku xwendinêñ, me dixwendin me ji hev re bahs dikir, pirtûkêñ ku diketin destêñ me, me dadaniyan holê, kovarêñ bi zimanê cur-becur me pêşkêşî hev dikirin. Di van rojêñ yekşeman de cîvînêñ ku me li qehwexaneyan pêktanîn, hevalêñ ku meyla wan li ser edebîyatê hebû, diha-tin. Bi vî awayî jî ev civînêñ me dibûn mîna semîneran. Mijarê herî serekî edebîyat bû. Hemû edebîyatêñ cîhanê yên ku me karibana meyla xwe bida ser wan. Lê bi saya netîca xwendina bi salan di wan civînan de dîroka me ya ku bi darê zorê hiştîye ku em li vir, li Stokholmê bijîn, hate nirxandin. Bi vî awayî jî jiyana nefyê mîna gera ku nahêle mirov serê xwe ji binê avê kûr rake, derdiket, li gel dûrbûna ji welêt û dîroka xwe, îmkanêñ ji bo peydebûna zextêñ afirandî pêktanîn. Nefî bûyereke bi hîzn û sext e, lê ji bo nivîserekî jî wilqasî xwedan huner e. Heyama sedsala bîstan bê çiqasî xwedyê nefyêñ mezin yên nûjen e.

Mehmed Uzunî di salêñ dawî de li Parîs û Londonê ma. Di navbera vê mana xwe ya ku bi mehan dom dikir, hewl da ku xwe hînî zimanê Fransî û Îngilîzî bike. Bi qasî ku metnêñ di xebata xwe de fêhm bike, hînê van ziman-an bû. Di vê navberê de roman û ceribandinêñ xwe nivîsandin, tevlî xebata berhevkirina edebîyata Kurdî ya kevnar bû.

Bi rastî jî iro roj bajarê Stokholm û Uppsalayê bûne cîhê ku kultura Kurdî ji nû ve bal dibin, metnêñ kevn ji nû ve têñ weşandin, têñ modernîze kirin, ji nû ve têñ weşandin. Ev azadîyêñ ku li welatê rewşenbîrêñ Kurdan nedana wan, Swêd bêyî ku tiştekî bixwaze dane ronakbîrêñ Kurdan. Him jî weke mafekî bi zehf reng xwezayî.

Ronakbîrêñ Kurd celebê ku di serdema me de herî zehf duvdırêj li nefyê

dijî, celeb rewşenbîr e. Nivîskarêñ Kurd ne bi tenê li ser xaka xwe di bin tehdîta rejimên kotekdar û faşîzan de ne, herweha di bin tehdîda çekan, bombeyan -heta bi bombeyêñ bîyolojîk- de ne jî.

AFIRANDINA XWE BI XWE

Di 12ê Adara 71ê de, hê di hijdeh saliya xwe de, Mehmed Uzun pêşî li Amedê, piştre çend salan ket girtîgehêñ Mamakê, li pey hilbijartinêñ 1973an di dema derbasbûna “sivil” de jî, ji ber ramanêñ xwe ev xorêt bejn-tazepişkîvî di dadgeha Ewlekariya Dewletê de hat dadgehkîrin, di piştî çar saliya xwe de li nefya ku wî ji xwe re neqand xwe bi xwe afirand, pênc roman, çend cerbandin nivîsandin. Antolojî amade kirin. Li ser kultura Kurdan û ya cîhanê lêkolînêñ himbêz kirin. Li Swêdê û welatê din yên rojava mîna nivîskarekî binav û deng tê naskîrin. Di vê dema hevaltî û hevdîtinêñ me yên duvdîrêj de min li ba vî mirovê liberal yê “Anadoliyê” ku xwedîyê mirovatiyeke kûr e, tu meylêñ şovenîzma kulturî nedîtin. Li Tirkîyê ev mirovê ku ji girtîgeheke diket girtîgeheke din, bûye rewşenbîrekî hevdem yê navnetewî, liberalikî modern, şagirtiyekî xweşbinî û humazîzmayê.

Romanêñ wî yên bi Kurdî hêj min nexwendîne. Ez weha dizanim ku ew ê di demeka nêzîk de bi tirkî û di zimanêñ din de jî bêñ weşandin. Ceribandina romana wî ya modern pêşî bi navê TU di pirtûkxana min de ye. Dest-nivîsandina romana wî ya duyemîn ku min bi tirkî xwend weke ku min texmîn dikir ji avayê vegotina rojavayî fêda wergirtiye. Piştre romanek bi hecmekî mezin ku jiyan û çarenûsa rewşenbîrêñ Kurd di destpêka vê sedsala me de bi belgeyan dinirxîne, nivîsandiye.

NEYÊNIYÊN SEDSALA BÎSTAN

Sedsala bîstan li gel ku medenîyet tê de ges û bal dibe jî, Mehmed Uzunî baş dizane ku sedsala cengan, qirkirinan, nefyan, koçberiyan, faşîzman, nîjadperestiyê, şovenîzmê, dijminatiya biyanîyan e jî. Di bingehê wê de jî avahîya ramanî ew e ku cûdabûna “em” û yên “din” e, Mehmed Uzun vê yekê him ji jiyana xwe, him jî ji nêzîk ve naskirina intellîgensîya Kurd e ku sedsalan didomîne, bi kurahî hîs dike. Sedsala ku xwe nêzîkî xelasîyê dike, ger ku gel bi kulturêñ xwe, bi nasnameyêñ xwe bi ser nekevin û li ba hev ne jîn dê bibe sedsalekî pirr bi tirs û felaket. M. Uzun ji zû ve di ferqa vê yekê de ye. Pêwîst nîn e ku mirov bibêje. Diviyabû ku hukumetê Tirkîyê ev

politîka pirîmîtîv ku li ser nasnameya zimanê Kurdî, li ser nasnameya kultura Kurdî bi cîh dikin, ji mêt ve hatibana guhertin. Lî azadî, serxwebûna kulturi, bîdestxistina nasnamê bi awayekî serbest, heta di civakê demokratîk ku li ser neqandina nasnamê tê avakirin, bi tenê mirov bibêje “civateke demokratîk” jî têr nake - ev peyva demokrasiyê li Tirkîyê ji bo gelek serîyan tu maneyê ifade nake - civatek ku di nava xwe de aştîkwaz e, civateke ku kare geş bibe, civateke medenî, civateke bi mirovantî... Uzunî vê yekê di ceribandinê xwe de yên di vê pirtûkê de bi awayekî liberal vedibeje, hema bibêje hîn dike, bi detay pêşkêş dike.

CERIBANDINÊNEKE TIJÎ HIZN

Ceribandina bi navê “Şîdet û Diyaloga Kulturi”di nav “Dîsa Azadiya Ramanî, Dîsa Tirkîye” de ku ji aliyê weşanên CANê ve hatibû weşandin, cîh girtibû. Ceribandina “Nefî:Cûdabûn Hiznek e” ku di sedsala bîstan de nefya rewşenbîr û nivîseran ji xwe re dike tema di kovara LETTRE ÎNTERNASYONALê de bi gelek zimanê Ewrûpî hate weşandin. Tirkîya wê jî di kovara BÎRÎKÎMê ya Güiana 1992an de, di hejmara 37an de hatibû weşandin. “civata bi gelek kulturi” konferanseke bi tirkî bû ku li Almanya hate dayîn. Ceribandina bi hîzn ya bi navê “Kulîlkên Hinaran” ku gelek tişt fêre me kir, li tu cîhek de nehatiye weşandin.

Nijadperestîya ku roja me diqelîne û dişewitine, şovenîzm, ceng, kiryarêñ qirkirinê, di van şertîn sext de yên ku bêhêvîtiyê bi xwe re tînin, dîsan nivîsên pirtûkê paşerojê mirovantîyê, demokrasî, wekhevî, mafêñ hemwelat-darîyê, azadîyêñ ferdî û aşîtiyê bê wê li ser kîjan rêçan bêñ avakirin, hewl didin ku nîşan bidin.

Çiqasî bi pirr kultur û gelek gel bê jî, welatêñ ku nêzî azadiya nav xwe, nêzî mafêñ ferdî û demokratîk bûñe, di eslê xwe de, bêtir pêş dikevin. Ev yeka hanê ji aliyê serê teng û despot ve nayê têgihîştin.

Divê ku mirov ji rastiyê nereve : Heta ku mirovantî negihêje vê idrakê, bêguman sedsala bîst û yekê dê ji sedsala ku em tê de dijîn bêhtir bi xwîn, bêhtir dê felaketêñ ji derî miroantîyê bêñ kirin.

(*) Ji misreke Asturias e.

Têbinî: Ev nivîsar, pêşgotina Demîr Ozlu ye ku ji bo pirtûka Mehmed Uzun a dawîn “Nar Çîçekleri” nivisiye. “Nar Çîçekleri” li Tirkîyê meha Sibatê 1996, bi tirkî ji aliyê Weşanxana BELGE, derçû.

Li ser hozan ê helbestvanê bê nav!

Û yek ji wan; Dilpêt JÊLÎ

Adîl DURAN

Di dîroka Kurdan de ciyê edebiyatê û hosta û zehmetkêşen wê hê derneke-tye ronahî yê. Ji ber ku sazgehên lêkolîn û lêgerînan nîne! Eşkere ye ku ji bona têgîhiştina civatê, berhemên nemir yêni nivîsî anjî devkî roleke mezin dileyîzin. Bê guman edebiyata Kurdan, ya devkî gelek kevne û xurte, yê nivîsî ciyê xwe negirtiye û her çiqas hebe jî kême ew kêmâsi ne bê sedem e.

Sedemê herî mezin ew dewletên dagirker yên ku Kurdistan dinavxwe de parve kirine tu carî mescal nedane ku Kurdî bê nivîsin û axaftinê. Yêni heyî jî talan kirine bi xwe re birine û xistine nav heyîyen xwe anjî şewitandise. Her wiha ew zor û zilm, îşkence û tade ketîye para hûnermend û nivîskaran, bi mirinê, çavêن wan tirsandine û devê wan jî girtin e.... Yêni mayî jî bi nivîsa nivîskarêni biyanî heta îro tê û nemir e....

Edebiyata devkî, herdem wek bareke giran ketiye ser milê Kurdên welatparêz û wan ew tiştên rûmet bi gelek zahmetî wek dildizî zaro neviyên xwe re gotine û wek mîrasek ji me re hiştine. Vêje ango edebiyata gelan wisan bihêsanî nayê afirandinê mixabin edebiyatê de karê helbestan bi hêsanî ye û sivik tê zanîn û ew xebatê pîroz û rûmet ji bo me bûye kareke nankor û xwedîyê xwe jî birçî dihêlin... Gelek helbestvan (şair) ên

mezin yên bi nav û deng piştî mirinê têni zanîn û qedr û qîmet ê wan tê girtinê. Hinek zehmetkêş jî hene ku berhemên wan, navêni wan qet nayêni zanîn û demê ku ew ji navme koç dîkin, ew berhemên wan yên giranbiha bi wan re gorî axê dibe.

Îro hertiştî me li ber mirinê ye û dişewitî û tine dibe. Em çiqas hewlbidin xwe û çiqasî ji nav agir rizgar bikin ew ji me re fêde ye ku mezine ber ku dijmin ji bingehê wê ve dest bi xirakîrinê kiriye. Ew bingeh ji bo hatin û pêşe roja kurdan wek pir ek e. Dema ku ew pir di navberê duh û îro de bêt hêrifandinê em nikarin derbazî pêşerojê bin. Ew jî ji me re mirine û mirineke xedar e.

Sedemek ji wan sedeman ev e ku, me gelek têkiliyên civatê; wek huner, çand, edebiyat, siyasî û insanî wek arvan û genim li nav hev qelibandiye yên ku tu tişt ji destê wan nayê û piştgirê xwe hene berhemên wan wek ka yê tê belavkirin. Yêni ku jê hatine û bi serê xwe ne ji xwelî serbune. Hinek jêhatî û zehmetkêş jî hene ew li welêt dijîn û berhemên wan jî bi wan re gorî axê dibe. Tu kese ke li ser berhem û jiyana wan lêger û lêkolînan bike û wan berhemên giranbiha derxine ronahî yê nîn e.... Yêni ku di wî warî de hewl didin xwe kes alîkariya wan nake û ew kar badilhewa diçe....

Desthelatiyek (otorîte) nîne ku, hindek tiştan ji hev cuda bike, ked û maflî Sezar bide Sezar!... Naxwazim zêde dûr û dirêj bikim. Ew durişm her wek têzanîn diyare. Dixwazim rewşa şâirekî bê nav û bê xwedî bixim berbiçavan û ji helbestên wî çend numunan ji we re pêşkêş bikim. Dilpêt JÊLÎ, şâierkî têri xwe ye û niha li welêt dijî û ji Kurdistana bakûr e. Gelek dîvanê wî hene û dinav gel de jî têz zanîn, yek ji wan "Dîroka Bîranîna Şehîdan" e. Bi zehmetî pel bi pel ji min re rê kiriye. Bes helbestên min bi xwe destê min de genî bûn e. Dîsa ji dil û cergêن min li ser berhemên wî dişewitî. Min gelek hewl da xwe nekaribûm dîvana wî bidim weşandinê û ew jî ji min re bûye bareke giran... Ji ber ku min ceribandiye û bi gelek kefteleftî berhemê xwe "Destana Dersîmê" weşand. Tenê weşandin ne bese! Tu keseke bigre û bixwîne nîne. Hinek ji min loman dikan û dibêjin, ew kurdî ye. Ji ber ci te tirkî nenivîsandiye! Ma ez bêjim ci? Yênu ku kurdî nizanîn bi xwe kurdin û berhemên xwe tirkî diweşînin rexneyêni bo wan jî hê dijware!

Ez pê re ketime belayê! Berjor tûwkim sibêl e, berjêr tûwkim rî ye! Ez ê nizanîm bi ci zimanî û bi ci awayî binivisînim. Ma ew jî hale? Dixwazim nivîsa xwe li vir di gel çend nimunêni bi helbestên Dilpêt Jêlî ve hê dom bikim.

Wê tola şehîda vekin
Şoreşa kurda xurt bikin

Evî welatî rizgar kin
Dilê gelê me pê şakin

Seb ci tola wan venakin
Alê ser wa bilind nakin

Piştî wan rîste an dil bi keser bi hesreta azadî û rizgariyê wisan dilorîne..

Xwîna lawê xwe dibînim
Vê kîna we pir hiltînim

Kurê min qurbana welat
Bo min bese rêka felat

Tevde mal û can û hebûn
Bila bibe gohrî serxwebûn.

Û bi sereke bilind û dengeke zîz û delal
dengê xwe dide ber bi bahoza tevkûştina
welêt

Şîna cendegê xwe nakim
Dilê neyara xweş nakim...

Û bi dengê şêran hawar li dilê xwe dike û
ji kezebê kur dinal e.

Ka Mahsun Korkmaz ê gernas
Ka ew amirhêzê mîrxas

Em natîrsin ji kes bê şik
Ji bîr nakin xwîna ter û hişk

Dê şoreşê berdewam kin
Gelê Kurdistan rizgar kin

Dê bînin rizta wek hevî
Çaxê bi serkeve netewî

Emê bi serbest û azad
Bigîhin serxwebûna welat

Ser vî dilê germ û kelî
Wiha got Dilpêt Jêlî...

ZIMAN, ZARAV Û PIRSINE DIN

Şahînê B. SOREKLÎ

Ziman pira danûstendina di navbera merovan de ye. Bi dîtina hindek filosofan ziman merovtî bi xwe ye. Noam Chomsky, yek ji pisporê navdar yên zanistiya zimên, dibêje(1) “dema em xwe fêrî zimanekî dikin, em ber bi hêzeke mezin diherin, hêzeke ku merov dikare navê canê(ruhê) merovtiyê lê bike, tiştekî ku tenê li nik merovan heye.” Fromkin û Rodman dinivîsinin (2), “yê bixwaze merovtiya kesekî fêhm bike, divêt bi zimanê wî bizanibe.”

ZIMAN CI YE?

Ziman sistêmek e ku tê de deng û xwebêj bi hevûdin re eleqedar in. Dema kesek diaxife dengê wî dikeve guhên yekî din. Mêjiyê guhdêr wî dengî li gor sistêma zimanekî analîz dike, xwebêjê dide peyv û komikên tê de û li gor wê bersîva xwe amade dike, bi deng dişîne guhên yê li hember xwe. Wisa, ji dest van herdu merovan tê der ku ew ramanên xwe bigihînin hevûdin, yanê, danûstendinek di navbera wan de cîh digire.

Danûstendin axiftin û guhdarkirina bi têgihîstin e, yanê: + û - . Axiftin (herweha nivîsandin) dayîn e (+) û guhdarkirin (herweha xwendin) stendin e (-). Bi peyvine din, danûstendin çûn û hatina xwebêjan e. Bêyî dayîn marov nikare behsa stendinê bike, ne jî bêyî stendin dayîn cîh digire.

Yek ji grîngtirîn tiştên ku merov û lawir(heywan) ji hevûdin cuda dike ziman e. Rast e, zarokekî di nav komeke meymûnan de mezin bibe nikare bi zimanekî merovan biaxife, lê mêjiyê wî xwedan pêkaniyeke taybetî ye, mîkanîzmeke ku di beşê çepê yê mîjî de bi cîh dibe, ku dikare fêrbûna zimanekî ji bo wî pêkan bike. Ev zarok, Eger têkeve nav civakeke merovan, dê bikaribe hêdî-hêdî bi zimanê wê civakê biaxife, lê lawirekî din, çığa di nav wê civakê de bimîne jî dê nikaribe bi zimanê wan biaxife. Zarokek li dû demeke ne weqa drêj têdigihê ku hemî kes û tiştên nêzikî wî bi nav in. Drêj nake, ew jî wan navan bi kar tîne. Di destpêkê de gotinên wî pirr zelal nayêñ der, lê bi derbasbûna demê re ne tenê gotinên wî zelal dibin, ew her-

weha dest pê dike bi endamên malbat û civaka xwe re bide-bistîne, zimanê wan fêhm bike û pê biaxife. Çawa zimanê zarokekî roj li dû rojê, hefte li dû hefteyê, meh li dû mehê û li dû derbasbûna saline ber bi pêş diçe û dewlemen-dibe, wisa jî merov dikare gotina pêşveçûn û dewlemenbûna zimanê civakeke merovan bike, ku ji sedsalan û virde di rêya xwe de berdewam e.

Ziman ji peyvan pêk tê, lê ew bi serêن xwe nikarin zimanekî bi kesekî fêrkirin bidin. Eger wisa bûya merov dê bikaribûya bi rêya ferhengekê xwe fêrî axiftina zimanekî bikira. Li milê din, zimanek çiqa dewlemen-dibe ji bêjeyên wî bi sînor in û dikarin di ferhengekê de werin jimartin, lê ne hevok(cumle). Hevokên zimanekî bêyî sînor in. Wek nişe, em dikarin bi alîkariya peyvîn MÊVAN, BIRÇÎTÎ û lêkera bûyînê gellek hevokên bi xwebêjên cuda çêbikn: Mêvanê birçî. Mêvan birçî ye. Mêvan birçî bû. Mêvan birçî dibû. Birçîbûna mêtvan. Birçî bû mêtvan. Birçî ye mêtvan? Mêtvantî birçîbûn e. Birçîbûna mêtvan. Mêtvantîya birçîbûnê. Birçiyê mêtvantiyê...

Da em bikaribin bi navê zimanekî behsa komeke ji bêjeyan bikin, ji bo wan sîstêmek divêt, ku jê re rêziman, yanê: GRAMER tê gotin. Gramer şêwe û rêcikên birêvebirina DENGan(Phonology), XWEBEJan(Semantics), û HEVOKan(Syntax) e. Endamên civakekê divêt ber hertiştî dengên di zimanê wan de xwedan xwebêj bi kar wînin. Dema ez bibêjim, Sifo torpon toso rebmûn , kurdekî din nikare tiştekî ji vê gotina min fêhm bike, ji ber ku van dengan di zimanê kurdî de ci xwebêjan nadin. Li milê din, dengên di zimanekî de xwedan xwebêj pêwîst e li gor şertên gramera wî zimanî werin bikarhanîn. Hevoka: salan li wî Hewlêr deh ew dît berî ji peyvîn kurdî pêk tê, lê ev peyvan li gor gramera kurdî nehatine rêzkirine. Loma, xwebêja van dengan ne zelal e. Lê dema ez bibêjim: wî ew berî deh salan li Hewlêr dît , xwebêja hevokê zelal dibe, ji ber ku vê carê ew li gor rêzimanê kurdî hatiye nivîsandin. Bi kurtî, em dikarin bibêjin, zimanek ji hejmareke bêjeyan û grama wan pêk tê. Eger em vê gotinê bipejirînin, wê demê grîng e bête gotin ku zimanek ji yekî din ne çêtir e. Zimanê di navbera endamên civakekê de danûstendinê pêkan bike, ji bo wê civakê ew ji hemî zimanên civakên din bi kelktir e.

ZIMAN Û GUHERTIN

Ne hêsan e merov du kesan bibîne ku ji sedî sed wek hev dipeyivin. Rast e,

endamên malbatekê, yan şeniyê gundekî heye ku cudabûneke mezin di navbera şeweya axiftina wan de nebe, lê her yek ji wan di axiftina xwe de xwedan metodeke taybetî ye. Li milê din, axiftina merovekî jî li gor kesê ew li gel wî dipeyive tê guhertin. Axiftina li gel dostekî ne wek axiftina li gel kesekî biyanî ye, peyivandina li gel zarokekî ne wek peyivandina li gel mezenekî ye û şora li gel yarekî ne wek ya li gel neyarekî ye. Wek nîşe, mazûvanek heye ku bi gotineke wisa bi xêrhatina mîvanekî qedirbilind bike:

Wey, hûn li ser ser û çavêن me hatin. De kerem kin danişin. Halê we, keyfa we? Înşallah hûn hemî bi xêr û silamet in?

Eynî merov, dema bi xêrhatine gundiyeckî xwe bike, heye ku ji bo eynî amancê wisa bibêje:

Merheba, Oso. Tu çawa yî?

Bêguman, guhertinê wisa di jiyanâ rojane de gellek in. Mînak pirr in, wekî axiftina di civînêni siyasî de, axiftina di radyo û têlvizyonê de, peyivandina li gel serokê partiyekî, ya li gel axmezûtekî, ya li gel rûspiyeckî, ya li gel endamekî / endameke malbatê,...

Ziman bi rengekî din jî, bi şeweyeke firehtir û gelempar, dikare were guhertin. Dema axifgerên zimanekî ji hevûdin bi dûr dikevin, yan ji bo sedemine nema dikarin li gel hevûdin bidin-bistînin cudabûn dest pê dike têkeve nav şeweya axiftina wan. Ev cudabûn bi derbasbûna demê re kûrtir dibe û li dû bi sedan sal herdu şeweyên axiftina vî zimanî dibin du zaravayêñ(lehceyêñ) cuda, heye ku tew ji zimanekî du ziman werin holê. Firehbûna Kurdistanê û asebûna çiyayêñ wê li haliyekî, muhacirtî û jihevûdinveqetandina siyasî li haliyê din; herweha bandora zimanê cuda li beşen cuda, bêguman, bi derbasbûna bi dehan sal rola xwe di zayîna zaravayêñ cuda yên zimanê kurdî de lîztime. Mixabin, ci lêkolînêñ rêk û pêk di derheqê vê pirsê de li holê nîn in, lê wek nîşe, ne dûr e ku Kurdêñ Şesak(li beşekî Kurdistana İranê) û Kurdêñ herêma Kobanî û Srûcê bi eslêñ xwe xwediyêñ eynî zarav bin, lê bi dehan, heye ku bi sedan sal berê ew ji hevûdin veqetiyabin û nema êdî fersend dîtibin li gel hev bidin-bistînin. Wisa, îroj, li gel nêzikbûna di navbera şeweya axiftina herdu beşan de jî, merov dikare behsa du zravayan bike: ya deverêñ Kobanî û Srûcê û ya Şesakan. Nîşeyeke baş di vî warî de zimanê inglezî ye. Dora 1500 sal berê ci zimanekî bi navê inglezî li cîhanê nebû. Li gor pirtûkine dîrokê, di sala 449an de kiralê Kêltan(li şûna İngliztana îroj) biryar girtiye hêzeke leşgerî ji endamine êleke almanî saz bike(yanê endamên vê hêzê ji Almanya ya îroj hanîne) û wan li dij serhildanan, û şerê hundirîn

yê di navbera êl û eşîrên Kiltan de bi kar wîne. Lê li dû demekê endamên hêza “almanî” ev wara(Înglitzana îroj) xistine bin karbidestiya xwe. Li dû vê yekê bêtir ji endamên êlên almanî, Angil û Sakson, xwe gîhandine wir e. Bi derbasbûna demê re êla Angil ya xwe bi ser xistiye û ev welata êdî bi navê Angel-land, yanê Angilistan(welatê Angilan) hatiye nasîn û dû re ev nav bûye England, Înglitzana îroj. Angilan û Saksonan di destpêkê de bi zara-vayêñ almanî diaxiftin, lê li dû derbasbûna şes sed sal zimanê wan nema eynî zimanê meriyêñ wan yên li Almanya mayînî bû, ji ber ku wê demê tiştên wek radyo, têlvizyon û rojname nebûn, û danûstendina di navbera herdu beşan de pirr hindik bû. Li milê din, zimanê Angil û Sksonêñ li welatê Kiltan gellek bêjeyêñ ji zimanêñ din xistin nav xwe,... Di sala 1066'an de Îngliztan ket bin destêñ Normanan û zimanê frensî li wir bû yê fermî, lê pirraniya xelkê welêt êdî bi zimanê îngлизî diaxiftin. İngliziya îroj û ya kevnar ji hevûdin cuda ne. Ev ziman di sê qonaxan re derbas bûye: İngliziya kevnar(449 - 1100), İngliziya navend(1100 - 1500) û İngliziya nûjen(1500 ta îroj). Axifgerekî îngliziya îroj nikare ji îngliziya kevnar fêhm bike, lê dikare bi alîkariya ferhengekê nivîsarêñ sedsala 16'em fêhm bike, wekî nivîsarêñ Shakespeare(Şêkspîr). Wisa, merov dikare bibêje ku înglizî ji zaravayekî, yan zaravane almanî hatiye, lê bi rê ve hatiye guhertin, ketiye bin bandora zimanine din û xwe dewlemend kiriye ta ku xwe gîhandiye qonaxa îroj û bûye zimanekî bi serê xwe. Ev jî wê xwebêjê dide ku kontrolkirina zimanan ne hêsan e. Ziman wek çemekî di riya xwe de diçe û xwe li gor demê diguherîne.

Zarav bi cudabûneke biçûk, yan mezin, di hemî zimanan de hene. Axiftina Erebêñ bajarê Helebê ne wek ya Erebêñ Bêrûtê ye, lê li gel wê jî şeniyêñ herdu bajaran dikarin bi hêsanî ji zaravayêñ hevûdin fêhm bikin, ji ber ku ew weqa ji hev ne dûr in, lê ew nikarin ji zaravayê Erebêñ Tûnisê, yan Merakişê, fêhm bikin, ji ber ku cudabûneke mezin di navbera zaravayêñ wan û yên Erebêñ bakurê Efrîqa de heye. Ev rewş ji bo gellek zimanan wisa ye, zimanêñ wek çînî, almanî, îtalî, yewnanî, tirkî û hwd,... Wekî Fowler diyar dike(3), “dema endamên komeke ku bêtir li gel hevûdin didin-distînin peywendiya xwe li gel endamên komeke din bi sînor dkin, ew dest pê dikin şêwe û rêçikên nû di zimanê xwe de pêk bînin. Heye ku ew bi derbasbûna demê re pevv, deng û komikên nû jî têxin nav zimanê xwe. Bi vê nolê zara-vayekî nû tê holê.” Bêguman, cudabûna di sedsala bîstem de ketî nav şêweya axiftina Kurden sînor di nav wan de hatinî danîn vê yekê îspat dike.

ZARAVAYÊ BILIND

Li gellek welatan, ji zaravayêna cuda yên zimanekî yekî graniya xwe li holê feriz kiriya û bûye zaravayê bilind. Di nav hindek gelan de ev zarav yê çîneke serdest, yan zana(entellektûel), bûye; ji bo geline din zimanê pirtûk û peyayê olê bûye. Li Îngiltanê, wek nîşe, zaravayê beşekî ji şeniyê bajarê London bûye zaravayê bilind û navê Standard English li xwe kiriye. Li Almanya nivîsarên olîn bûne hîmê Hoch Deutsch e. Ji bo Erebâni zimanê Elfusha ji quranê hatiye. Zaravayê bilind ne tenê gramera zimanekî diparêze, ji bo wî zimanî dibe kutûk, lê herweha danûstendina di navbera axifgerên zaravayêna cuda yên zimanekî de hêsan dike. Eger ne bi saya erebiya Fusha bûya, Erebêni welatine wek Sûriyê û Lubnanê dê nikaribûna ji Erebêni welatine wek Sûdanê û Cezayirê fêhm bikirana, û heye ku îtroj li şûna zimanekî erbî gellek zimanêna welatêni Erebâni hebûna. Ev gotina dikare ji bo gellek zimanîna were kirin, wek almanî, îtalî û hinêñ din. Li milê din, zaravayê bilind di xwendegehan de, ji bo pirtûkan, weşanêni giştî û nameyan tê bikarhanîn û zaravayêna zimanekî ber bi hev tîne.

SEDEMINE DIN YÊN GUHERTINA ZIMANAN

Ziman dikarin di bin bandora sedemine bi şêweyeke fireh werin guhertin. Hindek ji van sedeman ev yên li jêr in:

a) Bindestî

Hin caran neteweyek xwedan zimanekî cuda li ser gelekî dibe serdar û zimanê xwe li ser wî gelî, yan bi şêweyeke rasterast, yan bi şêweyeke rasterast, feriz dike. Dema zimanek ji bo demeke drêj neyê parastin, yan bi şêweyeke xuristî neyê bikarhanîn, ew ê têkeve bin graniya zimanekî din, tevlihev bibe û heye ku rojekê bi tevahî ji holê rabe û wenda bibe. Gellek zaravayêna gelê eslî yê Australia di bin bandora înglizî de di nav du sed salêñ borîn de ji holê rabûn û yên manî di sîkrana mirinê de ne. Eynî tişt hat serê zimanêni Hindiyêni Sor li Emerîka.

b) Sedemêni Siyasî

Karbîdestêni hin welatan ji bo sedemêni siyasî, yan yên bi siyasetê ve grêdayî,

guhertinê mezin dixin nav zimanê gelekî. Wek mînak, Komara Tirkiyê bû sedema guhertineke mezin di zimanê tirkî de. Ev danzanîna di hejmareke kovara JÎN de bi tîpên erebî hatî nivîsandin (4) baş diyar dike, çawa nivîsandina bi tırkiya duhu ji ya îtroj ferq dike :

Muhterem Doqtor Ebdo Cewdet Bey, hemşerimizin Çiqardıükleri ictihad macmuasının 133inci nüsxası çıktı. Nefis meqalleri hawidir. Mutalaasını tawsiya ederiz.

Zimanê tirkî, li dû damezirandina Komara Tirkiyê, ne tenê bi tîpên latînî hatiye nivîsandin, lê herweha hejmareke ne biçûk ji peyvîn nû ji zimanê latînî, yan ji yên ewropî, tê de hatine bicîhkirine; û hinên din hatine afirandine.

Mînakeke din: Bi encama şoreşa îslamî li Îranê, farsî careke din bi şêweyeke fireh ket bin bandora zimanê erebî. Farsiya Îrana îtroj bi peyvîn erebî dagirtiye.

c) Raman û afirandinê nû

Merov û civak roj bi roj gavêن nû diavêjin û bi avêtina van gavan re tişt û ramanê nû têyên holê, ku ji bo wan navêن nû divêن. Dema xifgerêن zimanekî navêن nû didin wan, peyvine nû dikevin nav wî zimanî û bi hatina wan re guhertin di wî zimanî de cîh digire. Di nav pênceh salêن borîn de bi hezaran peyvîn nû ketin nav hejmareke ji zimanan. Di zimanekî wek îngлизî de bêjeyên wek rock and roll, Jeans, Minirock, Fishburger, video, midicare, microchip, microsoft, dolby, AIDS, internet,... beşekî biçûk ji navêن nû ne ku ji haliyê axifgerêن îtroj yên vî zimanî de têyên bikarhanîn. Di zimanê kurdî de peyvîn wek balafir, weşînek, caş, noqav, hilbijartin, trimbêl (otomobil), kontragerîla, pêşmerge, faks, pêñûs, wêneguhêz(têlvizyon),... beşekî ji bêjeyên sedsala bîstem in.

d) Hêşankirina zimanekî

Hindek caran axifgerêن zimanekî, bi amanca hêşankirina zimên, guhertinan di nav zimanê xwe de bi cîh dikan. Wek nişe, li Dewletêن Yekbûnî yên Emerîka, di warê peyvan û rênivîsê de gellek guhertin di îngiliya emerikî de

çêbûn, wek nivîsandina Program li şûna programme, color li şûna colour, airplane li şûna aeroplane , center li şûna centre,... Hejmareke mezin ji axifgerên îroj yên zimanê erebî di dema axiftinê de e dixin şûna q, yanê ji bo hêşankirina axiftinê, li şûna qemer (hîv) emer bi kar tînin, li şûna qelb (dil) elb , li şûna qal (got), al,... Di zimanê devokîn yê zaravayê kurmancî de gellek guhertin hatine holê ye, wekî, jê re li şûna ji wî re ; lê xist li şûna li wî xist ; jê ra bibê , li şûna ji wî re bibêje ; dare li şûna dihere ; nizane li şûna nedizane ; îro hê, siba tunnê , li şûna îroj heye, sibe tunneye , pê nizam li şûna bi wî/wê nedizanim,...

e) Nifşen Nû

Her nifşekî nû di dem û dewrana xwe de guhertinine dixe nav zimanekî. Nifşê li dû hatina îslamê gellek bêjeyên erebî xistin nav zimanê kurdî, wek merheba, selam, xêr e Înshellah, elhemdû lîllah,... Li milê din, di nav sîh salên borîn de gellek peyvên nû ji haliyê nifşê nû de hatin bikarhanîn û vejandinek di zimanê kurdî de hate holê. Ji lewre, Kurdekî kal, ku peywendîya xwe li gel xwendin û nivîsandina kurdî nebûye, ne jî fersend dîtiye li gel nifşê nû bide û bistîne dê nikaribe bi şêweyeke rêk û pêk têbigihê ka ev rêsêni li binî ci xwebêjê didin:

Raporeke Ajansa Frensî ya Nûçeyan diyar dike ku şervanên komeke oilîn ya li dij karbdestiya Agfxanistanê êrîş birine ser navend û dezgehên fermî ye. Bi encama êrîş bi dehan kesên bêtawan hatine kujtine. Li gor weşanên giştî yên welêt,hêviya ku geftûgo girêka di navbera hêzên cuda de çareser bike anuha li holê niye.

Ev çend rêsêni li jor encama guhertina di nav kurdî de di nav pênceh salên borîn de cîh girtî ye, ku divabû were holê, da rojname û dezgehên radyo yên vî zimanî bi kar tînin bikaribin bi rola xwe rabin. Mixabin, gellek kesên ku nikarin bi kurdî bixwênin û guhdarkirina dezgehên radyo yên bi zimanê kurdî ji bo wan ne pêkan e dê nikaribin bi tevahî ji kurdiyeke bi şêweya li jor hatî nivîsandin fêhm bikin.

f) Gotinên biyanî

Merov bixwaze-nexwaze zimanên cîhanê ji ber sedemên cuda dikevin bin bandora hevûdin. Wek me li jor diyar kir, ola îslamê wisa kir ku gellek

peyvên erebî têkevin nav zimanê kurdî(herweha zimanê gelên musilman yên din). Her dem û dewranekê zimanek xwe wekî zimanekî zanistiyê, bazirganiyê, yan wek zimanekî navneteweyî li cîhanê feriz dike û zimanê din dixe bin bandora xwe. Demekê zimanê yewnanî zimanekî wisa bû, demekê yê latînî, demekê yê erebî, demekê yê frensî, û îtroj zimanê îngлизî bûye zimanê zanistiyê, bazirganiyê û danûstendina navneteweyî. Demekê zimanê îngлизî bêjeyên wek algebra, admiral, stable, alcohol,... ji zimanê erebî girtine, lê îtroj zimanê erbî û yên din bêjeyan ji zimanê îngлизî digirine.

Di cîhana me de hemî tişt bi şeweypeke berdewamîn teyên guhertin. Merov nikare bi serhişkî dîwaran li ber vê guhertinê çêbike. Li milê din, girtina bêjene ji zimanekî din her hebûye û dê hebe. Li dawiya dawiyê, ziman hacetekî danûstendinê ye, ji lewre hêsankirina zimên ji dijwarkirina wî baştır e. Ez bi xwe îtroj di wê baweriyê de me ku bikarhanîna peyveke wek têlvizyon ji yeke wek wêneguhêz hêsanter û baştır e; yeke navneteweyî ye. Têye gotine, komeke ji zimanzanine serhiş hebûye, ku peyva îngлизî sandwich, ya ku di erebî de bi xwebêja etûr tête bikarhanîn, li keyfa wan neçûye. Wan xwaztine vê peyva biyanî ji zimanê erebî derînin û li şûna wê gotina el-şatir wel-meştûr we ma beynehuma (beşen hatinî qelişandin û tiştê di navbera wan de) bi kar wînin. Wekî ev mînak diyar dike, baştır e merov pratîkê û hêsanter têxe şûna serhişkiyê û dijwarkirinê. Ev çend sal in hukmata frensî ci dikêye ji, ew nikare rê li pêş peyvine îngлизî bigire ku nifşê nû li şûna hindekên frensî bi kar tînêye.

Bêguman, xwebêja gotinê li jor ne ew e ku axifgerên zimanekî peyvên di zimanê xwe de bavêjin haliyekî û li şûna wan yên biyanî bi kar wînin. Gotineke wek "min mektûb yazmîş kir" herimandina zimanekî ye, ne pêşvebirina wî.

Guhertina zimanan û bikarhanîna zaravayan tiştekî xuristî ye. Gellek bajar li cîhanê hene ku axiftina danıştivanên beşekî ji ya beşekî din der e. Loma, Eger zaravayê deverike welitekî ji lehceya yeke din cuda be, ew ne tiştekî matmayînê ye. Li Sûriyê, wek mînak, zaravayê şeniyêن bajarên Şamê, Helebê û Dêr el zorê ji hevûdin cuda ne. Hebûna zaravayan dikare bibe sedma hebûna zimanekî rengîn û dewlemend , lê bi şertê ku zimanekî bilind (standard) wan bigihîne hev û axifgerên wî zimanî bikaribin ji hevûdin fêhm bikin.

ZIMANÊ KURDÎ Û ÇEND GELŞÊN WÎ

Wekî diyar e, di zimanê kurî de sê zaravayêner serek baş têyêner nasîn, kurmancî, soranî û zazakî(dimilî / kirdkî), lê ew ne zaravayêner tenê ne, û di nav wan bi xwe de jî zarava (lehce) hene. Di navbera hin zravayan de cudabûn bi sînor e û axifgerêner wan dikarin ji hevûdin fêhm bikin, lê di nav hinêner din de cudabûnen mezin hene û axifgerêner wan nikarin bi hêsanî ji hevûdin fêhm bikin. Wekî li jor diyar bû, ev cudabûn ne tenê di zimanê kurdî de, lê herweha di gellek zimanêner din de jî heye, lê ji bo gelê kurd problêm mezintir e, ji ber ku zimanekî bilind, standard, ku wan hemiyan bigihîne hev hêne nehatiye holê. Sedama vê yekê jî bindestbûna vî gelî û veqetandina wî di nav welatêner cuda de ye.

Zimanê kurdî beşekî ji çemelê zimanêner iranî ye û ev çemela yek ji çemelêner dara zimaenê indo-ewropî ye. Wek nîse, nêzikiyeke berbiçav di navbera kurdî û farsî de heye û li gel derbasbûna sedsalan jî hên çend wekheviyêner bi sînor di navbera kurdî û zimanêner indo-ewropî de têyêner dîtin. Wek mînak, werin em bêjene bijarte ji zimanêner kurdî, îngлизî û almanî bidin hember hev:

Kurdî	Îngлизî	Almanî
ez dikanim/dikarim	I can(kan tê xwendin)	ich kann
sol	sole(sol tê xendin: binê solê, yan ling)	Sohle
rast	right(rayt)	recht(rêxt)
stêrk	star	Stern
na	no	nein(nayn)
baran	rain	Regen
brader	brother	Bruder
poz	nose(noz)	Nase(nazê)
mîz	piss	Pisse
bişo	wash(woş)	washe(vaşê)
hêk	egg	Ei
derî	door	Tür

Ev bêjeyêner li jor, ku hema bêyî ci lêkolîn hatin bîra min, diyar dîkin ku pêkan e ew ji rehekê hatibin. Bêguman, nêzikiyêner wisa di navbera kurdî û zimanêner indo-ewropî yên din de jî hene.

Yek ji gelşên mezin yên zimanê kurdî bikarhanîna du alfâbêyêni ji hevûdin cuda ne(eger em ya kirîlî nexin jimarê). Hin kes wisa texmîn dîkin ku kurdî divêt tenê bi alfâbêya latînî were nivîsandin. Ev pêşniyarî heye ku ta radeyekê di cîh de be, ku min bi xwe jî berê wekî baştır dîtiye, lê divêt em bizanibin ku bikarhanîna alfâbêya latînî li şûna ya erebî tiştekî gellekî dijwar e û ji taqeta gelê kurd ya îroyîn pirr mezintir e. Ji bo guhertineke wisa mezin dewlet û dezgeh û drav divên. Guhertineke wisa nedikare di nav salekê, yan duduyan de, cîh bigire. Merov divêt li şûnên ku tê de alfâbêya erebî tê bi karhanîn ji zarokên şes salîn dest pê bike û berê wan fêrî herdu alfâbêyan bike. Li dû ku ev nifşa mezin bibe divêt dû re hêdî-hêdî nivîsanina bi alfâbêya latînî şûna ya erebî bigire. Wekî Birêz Umer Şêxmûs jî berê diyar kiribû, divêt ji bîr neçe ku gelê kurd bi pirranî gelekî musilman e û nivîsandina bi alfâbêya erebî di vê olê de roleke mezin dilzê. Li milê din, li Îranê, Îraqê û Sûriyê alfâbêya erebî ji haliyê dezgeh û xwendegehan de tê bikarhanîn. Divêt em bizanibin ku gelş û cudabûnên di navbera kurmancî û soranî de bi guhertina alfâbêyê nayêن çareserkirin. Mixabin, di gramerka herdu zravan de guhertinê mezin hene. Ji bo nivîsandina gramerke yekgirtî ji bo kurmancî, soranî, zazakî,... û fêrkirindana wan li hemî deverên Kurdistanê îmkanêن pirr mezin divên, ku anuha ji taqeta gelê kurd gellekî mezintir in.

Alfâbêya Hawarê ku îroj ji bo kurmancî têye bikarhanîn e alfâbêyeke rêk û pêk e. Ew kesên ku behsa gelşên wê dîkin ji hebek nîsk girekî çedikine. Di çend salêن borîn de rojnamene bi zimanê kurdî dinivîsinin bi dûr û drêjî li ser bikarhanîna kumikê(^) li ser e, i û u nivîsandin. Bi rastî, ew ïhanetekê mezin e ji bo merovê kurd, Eger bête gotin, ku ew nikare ji ber e/ê, i/i, u/û bi kurdî bixwêne. Li milê din, gotina ku bikarhanîna kumik ji bo rêkirina têligrafan asteng e, herweha nema di cîh de ye. Yekem, kesê bi kurdî bixwêne dikare bêyî kumik jî tê bigihê ka ew têligraf ci dibêje; duyem bi pêşveçûna teknolojiyê re hema-hema rêkirina têligrafan ji holê radibêye û faks şûna wan digirêye. Makîneya faksê çawa hatiye nivîsandin wisa ji rêdiye. Jê bêtir, ji bo daktilo û kompiyûterên îroj li holê nivîsandina bi kumik nema ci dijwartî ye. Ev hemî li haliyekî, li haliyê din, kesekî maf niye alfâbêya kurdî biguhere û hema wekî bixwaze, bi ya xwe bike. Dema ku bi kêmasî ji 75 % ji gelê kurd dikaribû bi zimanê xwe bixwêne û binivîsîne, wê demê divêt gotûbêj li ser pirsên wisa bibin û dezgehê fermî û pispor biryare bigirin, ka ci guhertin pêwîst in, yan na.

Hindek kes di wê baweriyê de ne ku alfabetaya Hawarê têre dengên di zimanê kurdî de têyên bikarhanîn nake. Bi gotineke din, dixwazin tîpan bêtir bikin. Bila xwediyêne vê ramanê biborînin, lê ev jî daxwazeke ne di cîh de ye. Bawer nakim çi alfabetê bikaribin hemî daxwazê zimanekî ji sedî sed bi cîh wînin, ne jî tiştekî wisa pêwîst e. Yê bi zimanê xwe baş bizanibe dikare bi hêsanî dengên cuda yên bi yek tîp têyên nivîsandin ji hev derxe. Zimanê înglizî di cîhana îroj de wekî zimanekî wisa tê binavkirin ku fêrbûna wî hêsan e. De werin em alfabetaya latînî ya ji bo vî zimanî tê bikarhanîn û şeweya xwendina çend bêjeyên vî zimanî bidin ber çav, da bibînin ku xwendina kurdî bi alfabetaya latînî ji gellek zimanê din, ku eynî alfabetê bikartînin, hêsanter e:

Di înglîzî de but wek BAT tê xwendin, lê put wek PÛT tê xwendin. Sure wek ŞÛR tê xwendin, lê pleasure wek PLÉJER tê xwendin. Ape wek Èp tê xwendin, lê are wek AR tê xwendin. Read (bixwêne) wek RÎD tê xwendin, lê read (eynî nivîsandin, lê bi xwebêja min xwend) wek RÊD tê xwendin. Dear (hêja) wek DÎR tê xwendin, lê deer , ku xwebêja xezal dide, li gel cudabûna nivîsandinê jî herweha DÎR tê xwendin. Mail , ku xwebêja nameyan dide wek MÊL tê xwendin, lê male ku bi nivîsandin û xwebêja xwe cuda ye(nêr) herweha wek MÊL tê xwendin. Ev tenê hejmareke biçûk e ji mînakêni dijwartiya xwendina înglizî. Bêguman, xwendina frensî hêji ya înglizî dijwartir e, û frensî kumik(^) jî ta roja îroj bi kar tîne. Eger xwendina kurdî bi alfabetaya Hawarê ji ya zimanêne wek înglizî û fernsî hêsanter be, de gelo ev teqereqa ji bo hewldana guhertina alfabetaya me ji bo çi!!!!

Cîhê dax û mixabê ye, ku hin kesêni zanibûna wan bi, û li ser, zimanêne ïndo-ewropî nîn e, yan bi sînor e, dibin sedema bicîhkirina şâştîyan di nivîsandina zimanê kurdî de; û bi ser de dixwazin alfabeteyeke rêk û pêk jî bi-herimînin.

Li milê din, di nivîsandina kurdî de (heye ku ji bo hêsanterinê be) tîpa i ji hewcedariya bi wê bêtir tê bikarhanîn. Di nivîsa zimanine ïndo-ewropî de, ku herweha latînî bi kar tînin, va tîpa wekî kurdî weqa pirr nayê bikarhanîn, ji ber ku tîpa li pêş wê bi xwe bi wezîfeya i radibe. Çend nîşeyen bikarhanîna i bêyî ku pêwîst be: Bira li şûna bra (înglizî: Brather / almanî: Bruder); Awistiralya, yan Awustiralya (teqlîda tirkî) li şûna Australia

(înglizî: Australia/ almanî: Australien / frensî: Australie). Dirêj (li şûna drêj), birîndar(brîndar), tirimbêl (trimbêl), Firensa (Frensa) ,sitêrk (stêrk),...

Tîpa i di peyvên wek yên li pêş de pêwîst e: piling, birrîn, dikir, Tırkiye, tîrî,...

Nerastiyek din di nivîsandina hindek nivîskaran de, bi dîtina min, nivîsandina peyvên wek pirr bi yek r ye (nedizanim çîma bi rehmetî Celadet Bedirxan di Hawarê de diyar kiriye, ku di kurdî de du tîp li dû hev nayêñ nivîsandin). Wekî ez dibînim, gelê kurd ne bêyî sedem di hindek peyvan de zor daye ser tîpekê, yanê tîp dubare kiriye. Bêyî dubarekirina tîpê ew peyva dikare bibe xwediya du xwebêjan. Bala xwe bidin van bêjeyan: Ev pir e (koprî ye), / Ev pirr e(ne hindik e). Yan: Ev ker ne yê kerr e. Yan: dikire (dixist) hundir mala xwe / dikirre (bervacêya difroşe) û dike mala xwe. Yan: Em li ber çirê (çirayê) çîrrê(lîztiikeke zarokan) dilîztin. Yan: Gelekî (milletkî) bindest gellekî (pirr) perîşan e. Yan: Li vir (li vê derê) vir r(derek) nayêñ kirin. Li milê din, zimanêñ wek înglizî û almanî jî du tîpan li dû hev bi kar tînin, wek interrogate di înglizî de û verraten di almanî de. Zimanê me yekî îndo-ewropî ye; mixabin, li şûna ku em di rînivîsandina zimanê xwe de sûdê ji yên îndo-ewropî bigirin, em dikevin bin bandora zimanê wek tirkî û erebî ku ne zimanêñ îndo-ewropî ne. Pirraniya şâştîyan ji vir tê.

Dixwazim careke din diyar bikim ku alfabetîa îroj ji bo zaravayê kurmancî tê bikarhanîn yeke rêk û pêk e û guhertina wê, bi taybetî di rojêñ îroj de, ne pêwîst e. Eger ci dijwartî ji bo fêrbûna xwendina bi kurdî hebin, bêguman tawan ne ya alfabetê ye. Dijwartî ji nebûna xwendgehan, nezanibûna bi kurdîyeke baş, kêmûna rojname û kovarêni li keyfa xelkê û li gor zanibûna wan, belengaziyê, nebûna dezgeh û radyo û têlvizyonêñ kurdî ku zaravayeke yek-girtî û bilind bi kar tînin, nebûna meraq û daxwazê û gellek sedemêñ din têyêñ; ne ji ber hebûn û nebûna kumik, yan bikarhanîna x wekî di Xelîl û Xezal de.

Wekî berê hat diyarkirin, gellek ji gelş û problêmêñ zimanê kurdî bi encama bindestbûna gelê kurd hatine holê ye û didomînine, lê divêt neyê ji bîr rakirn, wekî min di romana WENDABÛN de jî diyar kiribû, hebûna tarîbûnê ne tenê ji şevreşiyê tê, lê herweha ji ber nebûna ronahiyê. Zana, nivîskar û rêxistinêñ me gellekî pesna gelê Kurd û rêxistinêne dane û her kêmâsi xistine stuyê neyaran e, lê wekî endamêñ neteweyekê, kêmâsiyêñ me

bi xwe jî pirr in, bi taybetî di warê yekkirina hestê neteweyî û berbihevhanîn û pêşvexistina zimanê me de. Min di hevpeyvîneke ji bo kovara NÜDEM de wisa gotibû, "dema rîberekî ziman û edebiyata gelekî, merovekî mezin, wek Celadet Bedirxan, ji ber xwedîlêderneketinê di "Bîra Qederê" de jiyana xwe wenda bike, wê demê, ne tiştekî matmayînê ye ku neteweyeya li kesên wek wî xwedî derneketî di şevreşîya bîra nezantiyê de salêن dûr û drêj ji ronahiya edebiyat û zanistiyê bêpar bimîne." Ji bo rîexistin, ronakbîr, hunermend û nivîskarêñ kurd cîhê serbilindiyê ye ku ew di warê hişyarkirina neteweyî de ta radeyeke mezin bi ser ketine, lê mixabin, rola wan di derheqê ziman û edebiyata kurdî de, herweha di warê zanistiya di nav xelkê de, ta îroj hêñ bi sînor maye, sedem ci dîbin bila ew bin. Dem dema şoreşike zanistiyê ye di nav gelê kurd de, şoreşa xwedîderketina li zimanê kurdî, şoreşa xwedîderketina li ronahiya zanistiyê, şoreşa xwederxistina ji bîra qederê, bi zanibûn û gavêñ bi tevdêr, bi pênuşa kurdî û têgihîştina bêjeyêñ ronahiya pêşveçûnê û merovtiyê. Dem dema pêkankirina danûstendina di navbera endamên gelê kurd de ye: bi axiftin û xwendin, bi hêviya ku hevûdin fêhm bikin û bibin xwedîyêñ çavkaniyêñ hevbeş, bikaribin ji eynî dezgeha radyo têbigihêñ, eynî rojnameyê bixwênin. Dem dema toleransê ye, dema çareserkirina gelşan e, bi aştî, bi şêweyêñ şaristanî, ji bo avêtina gavêñ ber bi dahûteyeke bi hêvî. Kendal Nezan jî carekê gotineke bi vê xwebêjê kiribû, eger gelek nezan bimîne ci şoreş, ciqa bi hêz be jî, nikare wî bi tevahî ji şevreşiyê derîne.

(Sydney, 6/94)

ÇAVKANÎ

- (1 û 2): Fromkin, V., û Rodman, AN INTRODUCTION TO LANGUAGE, r.1, Holt, Rinehart û Winston, D.Y.E., 1974 (hindek ji ramanêñ di rûpel 1-6 de jî ji vê çaviyê hatine girtine).
- (3): Fowler, R. UNDERSTANDING LANGUAGE, r. 217; William Clowes & Sons Ltd., Îngiltan, 1974 (hindek ji ramanêñ di r. 1-6 de jî ji vê çaviyê hatine girtine).
- 4) JÎN, H. 5: r. 17, 1919; berhevkirina M. E. Bozarslan, Stockholm, 1985.
+ Soreklî, Ş.B., EM Û PIRSA ME, Sydney, 1987.

Heppevîn

H
e
v
p
e
y
v
î
n

bi
Latîf OZDEMÎR
re

Heppevîn

Pirs: Ji kerema xwe re tu dikarî behsa xwe û nivîskariya xwe ji me re bikî?

Latîf Ozdemîr : Bersîv = 1) — Pêş hemû tiştî sipas ji kovara Helwestê re ku min layiqê heppevînek kir û her weha mecal da ku ez karibim bîr û baweriyê xwe bigêjînim xwendevanên Kurd, bi taybetî yên derveyê welat.

Hetanî iro, di gelek kovar û rojnameyan de bi tirkî, lê bi giştî bi Kurdî berhemên min hatine çapkirin. Ev miqalene, helbest in, çîrok in, serborî ne yan jî werger in..... Digel vana hetanî iro du pirtûkên min yên helbestan çap bûn. "Dîlî Yasak Şiîrler" û "DILJAN" Niha jî xebatê min yên ku ji bo çapê amade dibin ev in:

- 1 - Bi tirkî — 100 yıl içinde Kurtlerin durumu ve Kurdistan için mücadele
- 2 - Bi tirkî — Sorgulanmış Yazilar : Nivîserên cur-be cur ku hetanî niha çap bûne
- 3 - Kurdî - tirkî — Şiîrn Kurtçe dili - Nêzîkê 50 şâîrên dînyayê têne nasandin û helbesten bijarte hatine wergerandin
- 4 - Bi Kurdî — Çîrokên Azadiyê - Nivîsarên edebî li ser rewşa jiyana Kurdan
- 5 - Bi Kurdî — Bextê Reş - Teatir - Şano
- 6 - Bi tirkî — Barış ve dialog insanı Şevket Epozdemir
- 7 - Bi tirkî — Yasak Aşka Şiîrler - Helbest
- 8 - Bi tirkî — Tarihin Şiircesi - Helbeston serhildanen Kurdan

Ji vana 3 pirtûk îsal wê çap bibin. Yên din heger fesal hebe salêن pêş wê çap bibin. Wisan xuya dike ku du-sê sal rojeva min dagirtiye. Her niha jî ez dema fersend dibînim, ji Ronahî, Deng, Nûdem, Nûbihar û Bariş'ê re dinivîsinim.

Nûha ez serbest dixebeitim. Aboriya xwe bi keda xebata xwe ya ticarî derbas dikim.

Pirs: Tu rewşa edebiyata Kurdî ya nivîskî çawa dibîni?

Bersîv = 2) — Rewşa edebiyata Kurdî ya nivîskî, dema behsa vî tiştî tê kirin, Mehmed Uzun tê bîra min. Lewra edebiyata nivîskî ya Kurdan mixabe ku pêşnakeve. Mehmed Uzun sedemên vê yekê baş dizane.

Xwendevanên Kurd bi taybetî yên welat pir tembel in. Xwedî li berhemên xwe der-

nakevin. Kitêbên Kurdî dema neyên xwendin û ji wan îstîfade neyê kirin bivê nevê kêm bimînin. Edebiyat pêşnakeve, nivîskar zêde nabin. Wekî din jî gelek nivîskarênen me hene ku bi başî Kurdî dizanin lê dîsan jî bi tirkî dinivîsinin. Edebiyata me dabeş bûye. Her beşek sedem bêkesî û bêxwedîtiyê gîştîye cinaran. Di destê me de Mem û Zîn mabû. Ew jî min xwend ku Azerî lê xwedî derdikevin. (Miqaleyek Qanadê Kurdo) Ev tişt bi rastî ji bona hunermend û nivîskarênen Kurd birîneke.. Lazime zêdetir kovarênen edebî çap bibin. Bi taybetî hevalên derva jî pişt bidin ta ku kovarek Çandî - Edebî li welat jî çap bibe. Tenê bi kovara "Govend" edebiyat perwerde nabe. Lazime rewşenbîr û edebiyatzanênen me bigêjin hev, çareyek ji edebiyata me re bibînin. Problemê herî girîng ya Alfabyê safî bikin, da ku her Kurdek bi hêsanî bikare gotinê Kurdekê din fêm bike.

Pirs:Romana Kurdî divê bi Kurdî bê nivîsandin?

Bersîv = 3) — Ez ne bawerim ku romana Kurdî bi Kurdî bê nîvsandin û Kurd hemî bixwînin. Diyare hostayêne me, xweşhalin ku hene, dikarin romanek weha binivîsinin, lê jî bo kî, wê kî bixwîne û jê îstîfade bike. Lê dîsan jî lazime bê nivîsandin, belkî rûyê me sor bibe em cehda xwendinê bikin. Helbet Kurd jî xwedî dîrok in. Folklor û edebiyatê wan jî gelek dewlemend e. Bi min divê ev roman bê nivîsandin, ya girîngtir jî hetanî fesal hebe bi zêdetir zimanane were wergerandin ango tercume kirin....

Pirs: Ji bo nivîskarênen ku bi eslê xwe Kurd in, lê berhemên xwe bi zimanê netewyê serdest (tirkî, erebî, farisî) dinivísinin tu çi difikirî? Berhemên wan yên edebî di nav edebiyata Kurdî de tê pejirandin an na?

Bersîv = 4) — Diyare em miletak zêde bi sî milyonî ne. Sedem ku ziman û çanda me qedexe bûye me nekarî bi Kurdî binivîsin. Lê ruhiyata Kurdî me wenda nekiriye. Lewra gelek nivîskarênen me bi tirkî, erebî, farisî nivisandine. Xwestine ku dengê êşa gelê xwe bi cîhanê bidinbihîstin.

Wekî din jî, gelek nivîskarênen me ji ber asîmîlasyonê zimanê xwe jibîr kirine. Bê guman nayê bexşandin ku cehd nekirine hîn bibin. Lê bi fikra min, kesên Kurd yên ku ziman baş dizanin divê zêdetir bi zimanê Kurdî binivîsinin. Pêş hemî tiştî jî lazime, rîexistin û sazûmanênen Kurdan jî li ser vê yekê bisokinin ta ku ziman û edebiyat jî nûva aj bide.

Berhemên wan nivîskarênen Kurd ku bi zimanê tirkî - farisî - erebî hatine nîvsandin, bê guman bi motîfên Kurdî hatine xemlandin. Sedem ku ew bi Kurdî nizanin û bi Kurdî ne nivîsandine xaîn nînin. Lê kêmasyeke mezine ev tişt jibona wan.

Wekî din jî, bi min ji bona tesnîfek weha hê ne wext e. Lewra mirov bi xetêne reş nikare jihev cuda bike. Eger nebin berhemên edebiyata Kurdî jî (sedem ku ne bi Kurdî ne) lê dîsan jî dewlemendiya edebiyata Kurdî ne, resmê edebiyata Kurdî kêtandine. Lazime mirov wan nivîskaran jî edebiyata Kurdî veneqetîne. Berhemên wan wekî tercume, wekî werger bêne pejirandin baştire ku mirov wan ji xwe veqetîne. Kesên ku di nav kar û barêne Kurdayetî de ne, jiyana wan bi van xebatan derbas dibin, ew bi kîjan zimanî binivîsinin jibo mafêne gelempêri - netewî yên gelê Kurd e. Lewra berhemên wan divê neyên încarê. Lewra em hewcâyê gelek tiştî ne. Edebiyata me jî gelek dewlemend e. Eger di rewşek ne baş da jî be, dîsan gelek xercek mezin heye ku

em pê avahîyan çêkin. Yêñ borî, borîn. Lazime em çaverêyê xebatêñ rojê pêş bin.

Bersîv = 5) — Romana Kurdî bi nivsandin û xwendinê, bi feyde jê bunê pêş dikeve. Nûha gelek çîrok, miqale û nivîsên Kurdî yêñ pêkenînê hene. Xasima helbesta Kurdî bê hed dewlemend e. Gelek kitibêñ helbestan hatine çapkirin. Lê piraniya nivîskarêñ me nûha jî yan bi tirkî difikirin bi Kurdî dinivsînin, yan bi Kurdî difikirin bi tirkî ifade dikin yan jî teqlît dikin. Anglo ne şerte ku helbestvanê Kurdan wekî Mayakovskî, Nazim yan jî Lorca bifikire. Yan helbestêñ xwe wekî yêñ wan sererast bike. Lewra dema zanîna mirov û nêrîna mirov bi dîrok û edebiyata mirov hebe, şeklê helbest û çîrokêñ Kurdî, xwe nîşan dide.

Pirs: Romana Kurdî ya modern heye gel?

Bersîv = 6) — Romanek weha ku bêjî rengê Çehov, Tolstoy, Dostoyevskî, Jack London bide, heyf û mixabe ku tuneye. Lê di vî warâ de xebat heye. Mehmed Uzun, Fîrat Cewerî, Mahmud Baksî, Munzur Çem û gelek hevalêñ din talibê vî karî ne. Bi xetêñ reş nikarim bêjîm erê yan na. Lê dikarim bêjîm ku romana Kurdî kêm e. Edî çiqasê wê moderne, çiqasê wê klasîke ew bila hewaleyê raya xwendevanan bibe.

Pirs: Tu berhemêñ nivîskarêñ Kurd yêñ nûh çawa dibînî?

Bersîv = 7) — Nivîskarêñ me yêñ nûjen di nav crhd û xebateke berçav da ne. Berhemêñ wan mirov hêvîdar dike. Bi taybetî tercûme(werger) û kurteçîrok gelek bi rewşike hosta têne nivsandin. Lazime kovar û rojnameyêñ Kurdî bibin alîkarê van nivîskarêñ nûjen û qewetê bidine wan jîbo berhemêñ baştır û modern.

Pirs: Tu ji berhemêñ kîjan nivîskarêñ cîhanê û yêñ Kurdan hez dikî?

Bersîv = 8) — Kemal Burkay, Mehmed uzun, Ahmed aras, Reşo Zîlan û Fîrat Cewerî gelek bi başî û xweşî dixwînim. Cegerxwîn û nivîskarêñ Hawarê jî bê guman, bê emsal in. Her weha Koyo Berz û Eskerê Boyik jî nivîskarêñ hosta ne. Li cîhanê jî, ez zêdetir jî Lorca, Tolstoy û Dostoyevskî hez dikim. Jack London û Nazim Hîkmet jî gere jîbir nekim. Di helbestan de zêdetir, feqî û melayê Cizîrî tesîrek baş li min dikan. Kemal Burkay û Orhan Kotan, Ahmed Arif dikarim bêjîm ku hostayêñ min in. Min her tim xwestiye ku ez bikarim bibim nivîskarek wekî Yaşar Kemal yan jî helbestvanek wekî Pablo Nerûda...

Pirs: Ji bo kovara Helwestê dîtin, pêşniyaz û rexneyêñ te ci ne?

Bersîv = 9) — Bê guman hewcaye ku ne kovarek lê gelek kovar hebin ku rexnebarî û gengeşî ya pirs û problemêñ edebiyata Kurdî bikin. Lê mixabe ku kovara we mintezam nakeve destê min. Lewra ez nikarim arîkariya we bikim. Lê dizanim ku hûn di nav kar û barek bi nirx da ne. Xebata we xebatek hêja ye û hewcayê pesnê ye. Ez bi hevalêñ derva kubar û serfiraz im. Lewra ew tiştêñ pir baş dikan ku em li welat mixabe nikarin nîvê wan jî feyde bidne edebiyata Kurdî.

Serketin ji bo we dostan dixwazim. Çavereyê çalakîyêñ hêjatir im. Eger karekî kovarê bispîrine min ez hazirim(amade me) ku bi eşq bi qederê karîna xwe xizmet bidme Helwest û rêvebirêñ kovarê.

Digel silav û evînêñ birayanê carek din we teva pîrozbayî dikim.

Latîf OZDEMİR

Ji bo bersîvêñ te em jî sipas dikan. Rûpelêñ kovara Helwestê her tim ji te re vekiriye.

Hepveyvîn bi Zana FARQÎNÎ re ZIMANÊ BERHEMÊ, NASNAMEYA WÊ BI XWE YE

Zana FARQÎNÎ - Bersîv: 1 -

Ez ji malbateke gundî me. Min dibistana seretayî û navîn li na-venda Farqînê xwend. Lîse ji kîsê dewletê, min li Stenbolê qedand; li Lîseye Pîşeyî (meslekî) ya Deryavaniyê. Hêvotina xwe ya bilind jî, min dîsa li Stenbolê temam kir; li Universiteya Stenbolê Fakulteya Edebiyatê Beşa Sosyolojiyê.

Her çendî, dibistanêñ ku min lê xwendine ji hev cihê bin jî, daxwazên min ji dema dibistana navîn heta ku min universite jî qedand, wekî xwe man, neguherîn. Ji lew re, ji dema dibistana navîn ve, evîna min jî zimanê kurdî re, ji çanda kurdî re û heta ji muzîka kurdî re çêbûye.

Wekî ku min li jorê jî got, ji wê demê min dest pê kir ku ez li ser ziman û çanda kurdî bixebitîm; ku tu tiştek li ber destê min nîn bû. Cara pêşîn heke ez ne şaş bim, di 1983'yan de Mem û Zîna Ehmedê Xanî kete destê min; a ku ji aliyê M. Emîn Bozarslan ve, li alfabeşa kurdî ya bi tîpêñ latînî hatibû wergerandin. Bi vî awayî min cara pêşîn bi saya xebata Bo-

zarslan alfabeşa kurdî ya bi tîpêñ latînî nas kir.

Bersîv : 2 - Li Stenbolê, bi vebûna Navenda Çanda Mezopotamyayê re, min dest bi xebatêñ weşanî kir. Min di nav Heyeta Karêñ Nivîsaran a Kovara Rewşenê de, cîh stand. Ev rewş heta hejmar 6'an domiya.

Min, ji aliyekî ve universite dixwend, li aliyê din jî xebatêñ xwe yên li ser ziman, li ser muzîkê û yên kovarê li Navenda Çanda Mezopotamyayê didomandin. Ez vê jî bibêjim ku, xebat û vekolînêñ min ên li ser muzîka kurdî, bi awayê strîn û naskirina teşe, rîtm, maqam, amûr (enstruman) û celebêñ muzîka kurdî bûn.

Ez di Koma Çiya de bûm jî; heta ez yek ji damezrînerê komê jî. Di xebata pêşîn a Koma Çiya ya bi navê "Rozerîn" de, min jî cîh girt. Pişt re min tercîha xwe kir û ez ji komê qetiyam. Min weşanvaniya bi Kurdî ji xwe re bijart.

Ji aliyê din ve, her çiqas ez di xebatêñ derxistina rojnameya Welat de hebûm jî, ku rojname di 02.22.1992'an de derçû, bi

awayekî aktîf min di 20'ê gelawêja (tebaxa) eynî salê de, tê de dest bi xebatê kir. Ji wê çaxê heta niha, ez bi rojnamevaniya bi zimanê Kurdî re têkildar im. Mebesta min ji rojnamevaniya Kurdî ev e: A ku xwerû bi kurdî weşanê dike. Ez di Rewşen, Welat, Welatê Me de xebitîm. Niha jî ez Gerfnendeyê Weşanê yê Azadiya Welat im.

Rojnamevaniya me û nivîskariya me jî, mîna ku min li jorê vegot qewimî.

Bersîv : 3 - Çawa min berê jî got, hîna di dema dibistana navîn de evîn û benga çand û zimanê kurdî ji min re çêbûbû. Ez dikarim bibêjim ku qedexebûna nasnamaya kurdî û pê re jî ya ziman û çanda kurdî, bandoreke welê li min kir ku, ez hîn bêhtir bi gelê xwe ve bême girêdan. Her wisa hezkirina min jî zêdetir dibû. Ji wê çaxê ve, min bi şêweya dozeke pîroz li xebatêni li ser ziman, edebiyat û dîroka gelê kurd nihart. Nivîsîn, axaftin û fikirîna bi zimanê kurdî, min jî xwe re kire wekî armanc. Îro jî ez li ser vê yekê xwedî îsrar im.

Li bakurê welêt, nivîsîna bi kurdî hîn jî ne di rewacê de ye û li hemberî zimanê tirkî di rewşike pir nepak de ye. Ew li felata xwe dipê; ev kar jî peywira kesên xwenda û rewşenbiran e. Heke ronakbîrêne me, zana û nivîskarêne me, siyasetvan û hunermendêne me vê nekin wê kî bike?

Em tev baş dizanin ku, ziman bi nivîsîn, xwendin, axaftin, hêvotin û hwd. bi pêş ve diçe, xurt dibe, diperise û ji mirinê difilitê.

Îcar ku em bersîv bidine pirsa ku em ji kê re dinivisînin. Di serî de ez ji gelê xwe re dinivisînim. Ji ber ku ez bi zimanê wî dinivisînim. Lê ji aliyê naverokê ve ku em mijarê hildine destê; heta ji min tê ez cîhanî diramim û wisa dinivîsim. Lê ez dikarim bibêjim ku bi piranî nivîsîn min li ser çanda gelê kurd û tiştêne pê re eleqedar in. Di encamê de kî nivîsîn me bixwîne, em jê re dinivisînin. Wekî ku min got, ez bêhtir li ser çand û hunerê, li ser zimanê kurdî dinivîsim. Serê xwe li ser wan mijaran diêşînim. Kî ji wan mijaran hez bike, ew dê bixwînin.

Bersîv : 4 - Ji bo ku ez pirsa we bi bersîvînim, min divê ku ez pêşî çend gotinan bibêjim. Ji vê pirsê, carekê ez dixwazim rewşa edebiyata kurdî ya li bakurê welêt û kesên ku jê ne û niha li welatêni Ewrûpayê dijîn fêhm bikin. Ji ber ku ez der barê çalakiyêni li parçeyêni din ên welêt zêde ne xwediye agahî û zanînê me. Bi gotineke din, haya min a ku ji wan parçeyan heye, destûr nadê min ku ez wan çalakiyêni edebî binirxînim û rexne bikim. Li aliyê din, gelşike mezin ew e ku, ez nikarim berhemêne me bi alfabeyêni kurdî yêni bi tîpêni erebî û kirîlî ne,

bixwînim. Ji neçarî, dimînin berhemên bi kurmancî û bi alfabeşa kurdî ya bi tîp/pîtê latînî.

Bi taybetî di van sê çar salêna dawîn de, em dikarin bibêjin ku edebiyata kurdî (ya bi kurmanciya jorîn) ji çax û henga xwe ya çarlepikan filîtiye û bi ser piyan ketiye. Lî ev rewş bi lezgînî naqewime. Ji ber ku hîna jî riyêni li berê xitimandî ne. Pest û pêkutiya li ser zimanê kurdî didome; siyaseta dewleta tirk a zimankuj hîna bi şeweyeke xurt dom dike, alav û wasîteyên ku zimanê kurdî xwe pê dide derbirandin, zehf kêm in. Li bakurê welêt, ji hebûna 15 - 20 milyon kurdî tê behskirin, lî berhemên ku bi kurdî tên çapkirin, tirajên wan wisa hindik e ku rûyê mirov nagire, mirov hejmara firotina wan bibêje.

Çar-pênc weşanên ku xwerû bi kurdî li Stenbolê û Amedê derdi-kevin, rewşa wan ew çend ne xweş e, di navbera mirin û jînê de ne. Bi kurtasî bazara berhemên kurdî zor kesat e.

Eger û sedemên vê rewşê, ji me hemûyan re diyar û eşkere ne.

Tiştê baş ev e ku, di gel vê rewşa kambax, hewldan û çalakiyên ji bo vejandina edebiyata kurdî ranawestin. Ci li hundir û ci jî li derve. Ez dibêjim vejandin, ji ber ku berê, beriya komara Tırkiyê, gulistana wêjeya kurdî şen bû, em dikarin bi hêsanî bibêjin ku berdar jî bû. Piştî damezirîna

komara kemalî, gulistan hate hişkirin û binaxkirin. İro jî ev gulistan vedijê.

Kêmasiyên ku ez dibînim û pir pê dieşim jî ev in: Nivîskar bi kûrahî li ser zimên ranaweste, xwe ji bin bandora zimanê tirkî rizgar nake (ji bo erebî û farisî jî dikare ev bê gotin). Her wiha pirtir devoka xwe ya herêmî bi kar tîne. Bi vê yekê jî, zimanekî hevgirtî û standart zû bi zû pêk nayê. Tevlîhevî, geremolî û aloziyan derdixin holê.

Di berhemên xwe de kêm kes zimanekî fesîh, sade, têrmane û rewan bi kar tînin. Di warê vegotin û şayesê (teswîrê) de, zêde ne bi serketî ne. Bêhtir, di berhemên xwe de qalip, şayes û riyêni vegotinê yên zimanên biyan bi kar tînin. Afirînerî ne xurt e.

Ji bo çêtirkirina rewşê, bi ya min divê kesên ku dixwazin di vî warî de tiştinan bikin, zehf bêhñfireh bin; û ji bo ku berhemeke wêjeyî biafirînin, bila melezînin. Serê pêşîn, divê ji kaniya zargotina kurdî xwe têr bikin. Ji ber ku gelek ji me, bi qandî ku zimanê tirkî dizanin, ew çend bi zimanê xwe nizanîn. Em bibêjin ku, pir bi zimanê xwe nizanîn û jê re ne serdest in. Gava ku mirov ji zimanekî re ne serdest be, mirov nikare pê tiştinen hêja û tekane biafirine.

Biramin ku, mirov nikaribe bi zimanê xwe xewnê bibîne, gava pênûsê hilde destê xwe û dest bi nivîsîna kurdî bike, lî bi tirkî bihi-

zire û hîna bi kurdî binivîse, dê tiştekî çawa derkeve holê hûn bînin ber çavêن xwe. Di şûna zimanê tirkî de zimanekî din jî dikare bê danîn.

Der barê vê yekê de, başûriyên biçûk ji bakuriyan pêşketîtir in.

Bersîv : 5 - Bêyî niqaş û gengeşiyê, pêwîst e ku romana kurdî bi zimanê kurdî be. Heke ne bi kurdî be, ew berhem dibe berhemeke li ser kurdan. Wê hengê, ma em dikarin bibêjin ku ci berhemêne edebî, hunerî û hwd. ên ku naveroka wan li ser kurdan in, ew ên kurdan in? Na!...

Bi taybetî di wêje yê de û heta di hemû hunerên ku bi gotinê (zar) têne afirandin de, ji bo min pîvana sereke ziman e. Zimanê berhemê, nasnameya wê bi xwe ye.

Bersîv : 6 - Bi xwe, ez maf û heqê rexnekirinê di xwe de dibînim ku bibêjim "Filan kes tu çima bi zimanê xwe na, lê bi zimanê tirkî (an bi farsî, an jî erebî) dinivisînî?" Lê, ji yên ku bi zimanê xwe dizanin re. Ji bo kesen ku bi zimanê xwe nizanin re, nikarim vê bibêjim. Ji aliyekê ve ew neçar mane bi zimanê serdest bixwînin, hîndekarî û hêvotina (perwerdeya) xwe temam bikin. Ji lew re jî, pişt re berhemêne xwe bi zimanekî serdest nivisandine.

Gere em ji bîr nekin ku, dema di

malekê de pirtûkeke bi kurdî (ci bi herfîn erebî, ci jî bi yên latînî), kaseteke bi kurdî dihatin girtin, ci dianîn serê endamên malê. Cezayê wan, ji cezayê girtina çekekê, heta ji mîrkûştinê dijwartir bû. İro, piçek rewş xweştir bûye. Ew roj ziman qedexe bû, derfet nîn bûn ku berhem bi zimanê kurdî bêni nivisîn, bihatana nivisîn jî, içar gelşa çapkîrin û belavkirina wan derdikete rastê. Ev rewş ji bo bakurê welêt wisa bû. Li parçeyên din, hindik be jî rê û dirb ji vê yekê re vekirî bûn. Çendî ku dijwariyên mezin û kend û kosp li ber wan hebûn jî. Hîn jî welê ye. Kurdî zimanê neteweyeke bêdewlet e. Heta kurd nebîne xwedîyê statûyeke siyasî di cîhanê de, ev rewş dê bidome.

Em bêne ser berhemêne wan, ka gelo ew di nav edebiyata kurdî de dikarin bêni pejirandin an na? Tiştên ku me der barê "romana kurdî" de gotin, dikarin ji vê pirsê re jî mîna bersîv bêni dubarekirin. Em dîsa bibêjin ku ziman nasnameya berhemêne wêjeyî eşkere dike. Heke nivîskar berhemêne xwe yên wêjeyî bi tirkî nivîsibe, wiha jî dikare jê re bê gotin: Nivîskarê/a zimanê tirkî yê/ya bi koka xwe kurd an jî nivîskarê tirk ê/a kokkurd..... Ma Yaşar Kemal jî xwe wisa bi nav nekir. Negot, "Ez nivîskarê tirk ê bi koka xwe kurd im."

Bersîv : 7 - Wisa diramim ku ev pirs divê ji aliyê rexnegirên edebiyatê ve, heta ji aliyê roman-nivîsan ve jî, bê bersivandin.

Gava ku roman-nivîs teknîkeke xweber û mijareke ku kesî ew nîvisîbe, ci mijar dibe bila bibe, ji xwe re bijartibe, bi awayekî serketî ew honandîbe, besen romanê bi hev ve bestandibe û bi zimanê xwe nîvisîbe, ji bo min êdî ew romana vî gelî ye.

Ji hêla din ve, ramana min ev e ku ev tişt bi sparîjê çenabin. Rexnegir jî divê bi pîvanê subjektif li mijarê nenihêrin.

Bersîv : 8 - Bi rastî, piştî salên 90'î ez dikarim bibêjim ku ez rast li berhemên edebî yên kurdî hatim. Gava ku ez wan berheman dinirxînim, dibînim ku li gorî îro ew çend ne xurt û bedew bûn. Ji her aliyî ve. Ji gramerê heta bi rastnivîsê, ji awayê vegotinê heta bi honandinê. Tiştê ku min şad dike ev e; her çiqas pêşveçûn di vî warî de giran be jî, qalîteyek xwe dide der.

Bersîv : 9 - Bi qandî ku min berhemên li ser dîrokê, li ser siyasetê û civakê xwendine, min ew çend ên edebî nexwendine; pêwîst e ku ez vê bibêjim. Wan salên dawî, êdî ez li xwendina berhemên wêjeyî zivirîm; ci helbest, ci çirok û roman û ci jî pîyes.

Bi Gorkî û Yaşar Kemal min ji xwendina romanê hez kir, bi Ahmed Afir jî, ji helbestê. Di kurnancî de jî bi Rojen Barnas û Jan Dost. Abdulhelîm Yunus û Hesenê Metê jî di warê çirokan de û Mehmed Uzun jî di warê romanê de bandor li min kirin û ez tamijandim. Divê ez navêن Çexovê kurdan (Nurettin Zaza) û İbrahim Ehmed jî bidim; her wiha ez Ş. Bekirê Soreklî jî ji bîr nakim.

Bersîv : 10 - Heyveke, ez bi nîvisîna çirokan re jî mijûl bûm, lê min dev jê berda. Min xwe serketî nedît. Têkiliya min bi muzikê re jî heye. Lê ew, serî ji xebatê li ser zimêna nastîne.

Ji bo ayendê jî tevdîrê min ev in:

1 - Rojnameyeke têr-xurt û baş. Hem ji aliyê teşe, mijanpjaj û rûpelan ve û hem jî, ji hêla naverokê ve zengîntir-kirin, armanca min e.

2 - Li ser zimanê kurdî jî ku min berhemeke zanîstî pêşkêşî gelê xwe bikira, ez dê şad bibûma.

Bersîv : 11 - Di serî de, ez vê bibêjim ku min têr û baş kovara Helwestê hilnedaye destê xwe û bi çavekî rexneyî min ne ew xwendiyê û ne jî lê nihêrtiye. Bi tenê hejmareke wê kete destê me. Bi hejmarekê jî mirov nikare, der barê

weşanekê de hem bigihîje ramanekê û hem jî nikare wê bihêjîne ango binirxîne.

Ez ne bi tenê hebûna kovareke ku li ser hîmê niqaş û rexneyên edebî weşanê dike baş dibînim, daxwaza min ew e ku, di dem û hengeke kin û kurt de, kovarênu ku li ser mijar û gelşen cur bi cur rawestin, derkevin. Wekî kovarênu ku xebat û vekolînên dîrokî, felsefi, ziman, sosyolojîk, folklorîk, muzîk, helbest, etnografîk û antropolojîk..... Ku her yek ji wan bi serê xwe di warênu xwe de weşanê bikin.

Baweriya min ew e ku, bi vê yekê dê hem zimanê me bi pêş bikeve, xwe dewlemendtir bike û bibe sedem ku her dîsîplînek, zanîstek ji xwe re lîteratûrekê biafrîne û hem jî ji wan kesan re rê vebe ku karîbin xebat, vekolên û lêgerînên xwe bidine weşandin, nirxandin û xwe bigihînin xwendevanên xwe.

Çi qeder hejmara weşanên bi kurdi zêde bibin-naveroka wan li ser ci dibe bila bibe- ew çend hejmara xwendevanên kurdi jî pirtir dibe û ziman û berhemên bi kurdi dikevine rewacê.

**Zana FARQÎNÎ
23 Adar 1996**

Ji bo bersivîn te em jî sipas dikin. Rûpelên kovara Helwestê her tim ji te re vekiriye.

ROJNAMEYA AZADIYA WELAT

Li stenbolê bi navê Azadiya Welat rojnameyek nûh, xwerû bi Kurdi derket. Hejmara wê ya yekem di 21 Kanûna Paşîn de hate weşandin. Rojname 16 rûpel e. Bergên wê û herdû pelên wê yên navîn bi reng in. Rojnameya Azadiya Welat bi şîara "Hêvî Nayê Kuştin" dest bi weşana xwe kiriye. Hejmara wê ya yekem ji alî naveroka xwe ve gelek qels e. Lî hejmaren wê yên din hinek baş in.

Azadiya Welat dê her tim 16 rûpel be. Di nav rûpelên wê de, dê nivîsên li ser çand, huner, edebiyat, dîrok û nûçeyên aktuel bê weşandin ê. Rojname dê bi zaravayê Kurmancî, Soranî û Zazakî jiyana xwe ya weşanê bidomîne.

Di nav nivîskarên ku dê di rojnameyê de binivîsin, kesen naskirî ev in: Abdulmelik Fîrat, Altan Tan, Dilbixwîn Dara, Zana Farqîn, İsmâîl Goldaş û Fîrat Cewerî ne.

Rojnameya Azadiya Welat jî di forma rojameya "Welat" û "Welatê Me" de ye. Wek têt zanîn ev herdû rojname li Stenbolê hatin weşandin û paşê ji alî dadgeha ewlekarî ya Tîrkan ve hatibû qedexekirin û girtinê. Rojnameya "Welat" 115 hejmar, "Welatê Me" jî 46 hejmar derketibû.

Di rojnameya Azadiya Welat hejmar 5 de li ser anonsa kovara Helwestê heye. Li ser pirtûka Lokman Polat jî nivîsek danasîn û analîzê heye.

Wexta ku rojnameya Azadiya Welat dest bi weşana xwe kir, me bi ser navê kovara Helwestê mesajek pîrozkirinê ji wê re şiyand. Em vê meja jî lî jîr diwesînin.

JI ROJNAMEYA AZADIYA WELAT RE

Em nûh derketina rojnameya Azadiya Welat pîroz dikin. Gelek pêwîste ku kovar û rojnameyên Kurdan xwerû bi zimanê Kurdi derkevin. We kareki pîroz kiriye ku we rojnameyek xwerû bi Kurdi weşandiye.

Em jî Azadiya Welat re jiyanek dûr û dirêj dixwazin. Em di kar û xebata we de serkefîtin dixwazin.

Bi silavên germî yên biratiyê.

**HELWEST
Kovara Çand û Edebiyata Kurdî**

Cîhana Nivîskarên Kurd – 4

**EHMED ŞERİFÎ
Ü
BERHEMÊN Wî**

*L*e salî 1946 le şarî Mehabad le dayik buwe. Her le Mehabad dersî xuwendûwe. Diplomî le edebî Farisî da wergirtuwe. Le salî 1963 da be Farsî destî dawete nusîn le ser dozî Kurd le govar û rojnamekanî Iranî da. Eelîn nusirawî wî be Kurdî şîeik buwe, kele rojnameî deng û bas da le Bexda çap buwe. Be hoy kizi şîreke eîtira wazî le şîer hêname. Ew şîere bote xezelî xuda hafizî.

Sedan guitarî be Farisî le ser meseleî Kurd le Iran da bilaw botewe. Le salî 1963 da pertûkî "Eşâîrî Barzanî" le ser jiyan û xebatî Mela Mistefa Barzanî û Komarî Kurdistan da weşanduwe. Em kitêbe zor zû le layen rijêm şawe qedexen buwe û cem kirawetew. Le salî 1970 da pertûkî "Eşâîrî Şikak û Simko" çap kirdiwe. Em kitêbe helîn pertûke ke le ser jiyanî xelî Şikak û Culaneweî Simko weşaw. Le salî 1978 da kitêbî "Şoreşekanî Kurdanî Mukiri" weşanduwe. Em pertuke diyardeyeke bo culanewakanî Kurdekanî Iran le salî 1880 het 1965.

Le salî 1979da kitêbî "Rojnamenîgarî Kurdistani" weşanduwe. Em pertuke wergêrawî kitêbî rojnamegerî Kurdî Cemal Xeznedar e û wergêr zor şitî lê ziyad kirduwe. Le salî 1980 da kitêbî "Navî Kur û keçanî Kurdi" weşanduwe.

Êsta çendin berhemî bo çap heye, wek: Mêjû Hesen Wîhiyekanî Kurd ke le Kirmanşah û Hemedan û Loristan û Xuzistan da hezar sal lem û pêş hikmetîyan kirduwe.

— Sefernameî Rawlinson bo Kurdistan.

— Jiyan û beser hatî gewre piyawanî mukirîyan.

— Dîyarî Mukirîyan 5 cîld. Birîtiye le deq û tikstî cur be curî Mem û Zîn - Xezal - Dimdim - û beytekanîtîrî nawçêî Mukiryan.

Gutar û nusirawekanî Ehmedî Şerîfî be Farsî de govar û rojnamekanî Iranda deweşen. Herwa gutare Kurdiyekanî de govarî Sirwe - Awê - Mamostaî Kurd - Jinî Nuy - Rewşen - Welat - Berhem - Wan - Hîwa - Xirmane - Nûbihar - Nûdem - Nûserî Kurdistan û govar û kovarêñ dî da weşan û deweşen. Ehmed Şerîfî le kongire û simînargelî cur be cur da le ser ziman, ferheng, edebiyat û mêtû Kurd xebatî kirduwe û gotarî xuwendotewe weki;

Kongireî Cihanî Ferdewsî le zanîstegaî Tahran ke basî şanamî Kurdi kirduwe.

MIHO

Suleyman DEMİR

Gava Remo telefon da min û xwest ku em hevdû li bajêr bibînin, kahwakê bi hevdû re vexwin, hîna nabêra nîro û bêriyan bû. Rojeke xweş derketibû, bi dinyê re dikeniya. Ez li balqona me rûniştibûm û min xwe li ber rojê germ dikir. Germa rojê, wek melhemê li bedena min dihat. Hîna nû roj xweş bûbû. Li van welatan wilo ye, roj dereng xweş dibe.

Ez serê we neêşînim, ez rabûm min dev ji rûniştina li ber rojê berda, min bi a Remo kir û me hevdû li ciyê her carê dît. Ciye min û wî, kahweke xweş e. Em çûn me kahwe ji xwe re kirrî û em li ser masa xwe ya her carê, bi merdî rûniştin. Hîna gava telefon dabû min, ji axavtina wî kifş dibû ku Remo dîsa tiştinbihîstine. Piştî me li halê hevdû pirsî, Remo dest bi çîroka ku bihîstibû kir.

"Birayê Silêman, ma te bihîstiye ku Reşo, Şêxo û Misto girtibûn?"

Na welleh, girtina ci gidî? Ma çûbûn welêt... ma li wir hatibûn girtin?

"Na bavo welatê ci, halê ci... li vir girtibûn."

Li vir?

"Erê kurro, li vir girtibûn. Tu dibê qey tu di guhê gê de yî, mala te ava be, tu jî bi tu tiştan nahisî..."

Ma ji bo ci girtibûn? Hersêyan bi hevdû re ci kiribûn? Him... min îcarê fam kir... vê demê gellek banqe têzîkirin... tu çîma nabêjî wana jî banqe tazî kirine û serê xwe kirine belan.

"Na bavo na. Banqên ci, tazîkirina ci. Ji bo goşt û mirîşkan bû!"

Goşt û mirîşk?...

"Erê welleh, goşt û mirîşk."

Goşte ci? Mirîşkên ci? Dizî ne, firoti ne, ci kirine?

"De ka raweste, ez ê çîroka wana jî serî ve ji birayê xwe re bibêjim. Ma ne tu Mihoyê gundiyyê wana jî nas dik?"

Erê lo, ew ê simbêlmezin û diranzêr, ew ê ku jê re Mihoyê Derengketiyan tê gotin...

"Erê hah, rehmet li bavê te, ew bi xwe."

Ê! Ma ew jî girtibûn?

"Na heyrana çavê te, wî li wana dabû. Wî ew bi girtin dabûn. Ne ji min be, tu dê tu tiştekî nizanibî û tu tiştekî nebihîzî. Berî bi du rojan ew berdane."

Te got li wana dabû?...

Erê bavo li wana dabû...

Wax wax wax, tiştên wilo jî li vir dibin!

"Heyran çîroka wana dirêj e. Ev camêr hîna li gund berberêñ hevdû bûn. Ji xwe gundê wana hew du malbatêñ mezin e. Her malbatekê bendek e. Miho bi xwe ji benda Derengketiyan e û ên din ji benda Diranketiyan in. Karê wana berberî û li ber hevdû xerakirin bû. Li gora ku tê gotin ji sedsalan ve nav wana wilo ye. Bi mesela milkêñ xezînê jî, nav wana kûrtir bûbû. Diranketî bi her awayê xwe ji Derengketiyan xurtir bûn. Çend xortêñ wana dibistan xwendibûn, bi zimanê Tirkî zanîbûn, li bajêr xelk û mamûr nas dikirin. Lê heta van çend salêñ dawiyê jî tu kesan ji mala Derengketiyan bi Tirkî nizanîbûn û li bajaran û li daîrêñ hukûmetê tu kes nas nedikirin. Mala Diranketiyan bi zimêñ û bi bertîlê û bi jîrîtiya xwe, gihabûn ku gellek milkê xezînê li ser xwe tapo bikin, lê mala Derengketiyan tu tiştek ji xwe re negiribûn. Ëdî nav wana gulpa şîn bû, li ber hevdû bûn. Silava xwedê jî li hevdû nedikirin.

Ëdî piştî ku Miho hat vir, hinek ji berberiya wana jî hat vir. Miho, li vir, wek ku li gund be berberiyê dike. Reşo, Şêxo û Misto xwe jê dikirin, xwe jê diparêzin, lê ew her wek xwe dike. Dibêja "ez ê bikim ku we ji vî welatî derxin, ez ê bikim ku hûn ji hepsan dernekevin. Heger ez nekim ku hûn bêñ ber nigêñ min û ên we yêñ li welêt jî herin ber nigêñ malbata min, ez ne ji pişta bavê xwe bim."

Wax wax wax, ev henek in, rastî ne.

Erê kurro. Rastî ne. De ka guhdar bike. Dema Miho nû hatibû vir, rast çûbû ba polisan û gotibû "Misto, Şêxo û Reşoyê Diranketiyan ne Kurd in û li ser navê Kurdan rûniştin girtine. Lê hersê jî bi esilê xwe Ereb in. Rehmetiyê kalikê min digot "bavê min digot tê bîra min ku malbata wana ji ciyekî nav Ereban hatin gundê me û dema hatin bi Erebî diaxivîn, qet bi Kurdî nizanîbûn. Bi dû re ji me fêrî Kurdî bûne." Ev gotin, gotina bavê kalikê min bi xwe bû. Îcarê heger kaxet maxet dabin we û gotibin ku Kurd in û firarêñ dewletê ne, derew e. Çengê wana û ê çawîşê qereqola gundê me û ê midîrê dâra tapoyê, her roja xwedê di ê hevdû de bûn. Hemû dostêñ hevdû bûn. Heger kaxetin dabin we, bawer bin li ba wana bi çêkirin dane û ne rast in.

Li ser bextê min be ne firar in û ne jî tu kesan ew digirtin. Ew Ereb in. Loma jî ez daxwaz dikim ku hûn wana ji welatê xwe derxin û bişînin ciyekî nav Erebêñ wana."

E?

"De ka guhdar bike. Polîsan gazî kiribûn hersêyan û ji wana re gotibûn ku giliyekî wilo li wana bûye. Ma gelo ji bo vê yekê çi dibêjin."

E?

"Ma wê çi bêjin! Gotibûn ku tiştekî wilo ji bapîrên xwe nebihîstine û Miho derewan dike. A firarbûnê jî... "wellehî esker û polîsan her rojê digirtin ser gundê me û li me dixistin, Miho bi xwe jî bi me re digirtin û li wî bi xwe jî dixistin. Em mecbûr bûn û em ji gundê xwe derketin, em bi bajaran ketin. Piştî ku em ji gundê xwe derketin û ji ber çavêñ wana wenda bûn, îcarê emrê girtina me derxistin. Ew kaxetên ku me dabûn daîra biyaniyan, emrê girtina me bûn û ji nefsa tûxaya bajarê Mêrdînê derketibûn. Miho rûyê xwe reş dike" gotibûn. Ew gili, wê çaxê wilo di erê nayê de mabû. Lê polîsan, piştî wê bi çend mehekî, ji her yekî ji wana re namak şandibûn û gotibûn ku wê nekevin dû tiştekî wilo û guh nadin tiştên wilo û ji xwe ne karê wana ye."

Ma Miho bi zimêñ zane?.. çawa çû ev tişt hemû gotin?

*D*e ka guhdar bike. Tercumanek bi xwe re biribû. Polîsan namak wilo ji Miho bi xwe re jî şandibûn û jê re eskere kiribûn ku wê nekevin dû giliyê wî. Miho "Diranketiyan ên vir jî bertîl kirine û girtine destê xwe. Wana xwe berî min gihandiye vir. Polîsan pere ji wana xwarine, loma jî ji min bawer nakin. Ji xwe polîs hemû ên gepan û bertîlan in. Ez ê xwe bigihînim cendirman, heger ew ji min re tiştekî nekin, kûçikêñ polîsan tiştekî nakin" gotibû. Îcarê Miho çûbû li vî alî û li wî aliyê bajêr li qereqola cendirman geriyabû, lê tu qereqol nedîtibûn. Di vê xiroşıya gerra wî û çûn û hatina wî de, xelk pê hisiyabûn. Hinek pê keniyabûn û xêrxwazan jî, "Miho, li van welatan qereqolêñ cendirman tune ne, ma te rojekê yek li sûkê diye, malixerab... tu çi dawê dikî, de li mala xwe rûnê û hişê xwe berde ser fêrbûna zimêñ" jê re gotibûn. Lê Miho "de herin lo, hûn jî ku zanin, ma welatên bê qereqol û bê cendirme hene" gotibû û her li vî alî û li wî alî ketibû. Çend rojekî ev gerra xwe kiribû lê tu qereqol peyde nekiribûn. Bi dû re, rojekê ji bo peydakirina qereqolekê çûbû ba daîra alîkariya civatî. Wana jî jê re gotibûn ku tiştekî wilo li welatê wana tune ye. Lê Miho ji wana bawer nekiribû. Li gora ku tê gotin, her rojê çûbû û pirs kiribû bê ma derxistine bê qerekol li ku ye, an

na. Hingî çûbû ba wana, rojekê karmendên wir ew li tirimpêla xwe suwar kiribûn û biribûn ciyekî derveyî bajêr, ciyê leşkeran. Li gora ku tê gotin, yekî du metroyan dirêj û ser milên wî tije stêrik hatibû pêşîya wana û ew biribûn daîra xwe. Dema çavêن Miho lê ketibûn, di ber xwe de "beranê sor, mîrê mîr kifş e, welleh tu dê li ber bayê min rabî. Simbêlêن mîran bi te ve tunene, lê mîr, ji bejin û bala xwe jî kifş dibin. Xuyaye ku tu ne ê bertilan i, tu zilam i û bi qedrê zilaman dizanî" gotibû. Ë serbaz xêrhatin dabû wana, kahwe ji wana re xwestibû, bi wana re keniyabû, henek û dostanî kiribûn û xweş-bêş kiribû. Piştî kahwê, dema dor hatibû guhdarî kirina li derdê Miho, Miho bi alîkariya ê tercuman, giliyê xwe pirr eşkere jê re gotibû. Reşo, Misto û Şêxoyê Diranketiyân, ne Kurd in, Ereb in. Milkêن me jî bi hîlan û bi bertilan li ser xwe tapo kirin. Îcarê ez dixwazim ku tu wana bigirî û bişînî nav Erebêن wan, gotibû. Miho tiştekî kêm nehiştibû. Dema wî digot, ê serbaz bi baldarî lê guhdarî dikir û hemû tiştên ku tercuman jê re digotin, li kaxeta ber xwe dinivîsî û carê serê xwe dihejand. Miho didît, pirr këfa wî dihat û bawer dikir ku îcarê, xwe bi carekê re ji mala Diranketiyân xelas kiribû. Lê dema Miho gotina xwe gotibû û dor hatibû ê serbaz, "Miho can, li vî welatî, em leşker xwe tev karêni wilo û hemû karêni civatî nakin. Em xwe tev li tu bûyeran nakin. Ne li gundan û ne jî li bajaran em xwe tev karêni wilo nakin. Ew karêni wilo, karê polisan e..." Dema ê tercuman gotina wî heta vir jê re tercume kiribû, Miho di ber xwe de "tew, polîs... me polîs jî dîtin heyrana çavê te, ne hêjane pîvazekê, hemû bertîlxwir in" gotibû. Ë serbaz gotina xwe domandibû û "em leşker nikarin xwe tev li karêni nav welêt bikin. Em him nikarin û em him jî naxwazin. Em, heger xwedê neke rojekê welatê me bi welatin din re têkeve şerekî, em wê çaxê radibin, em hew ji bo wilo ne. Loma jî, bawer be tiştekî ku em ji te re bikin tune ye" gotibû. Miho hêvişkestî bûbû û bêdeng rûniştibû. Li ê serbaz dinerî û di dilê xwe de "ji qama xwe jî şerm nake û rû di rû de em nikarin dibêje, digot." Piştî ku bi dorê gotina xwe kiribûn û bi xoşbêşê kahwa xwe jî vexwâribûn, dema îcarê dor hatibû çûnê, ê serbaz heta ber deriyê derve jî bi wana re derketibû û ew bi rê kiribûn. Mazûvantiyeke baş kiribû. Lê Miho memnûn nebûbû. Heta hatibûn malê jî, di ber xwe de "heyfa wan stêrikan... ma ku ez bûma, roja ku min ê deh neavêtina nav daran, wê tune ba. Min ê bikira dema xelk min bibînin, bi xwe de bimîzin... ji qama xwe û ji stêrikên ser milên xwe şerm nake û dibêje em nikarin" gotibû."

Tu çîma nabê Miho dîn e, Remo!

"Dîn? Welleh li gora ku dibêjin û qala hilandina perên wî dikin, qet ne dîn e, wilo fêr bûye, dibistan nexwendiyê, di nav berberiyê de mezin bûye. Piştî

wê, Miho dîsa çûbû ba polîsan. Îcarê gotibû "li ser bextê min be, li welêt eh-liyetên hersêyan jî tune bûn, ên hersêyan jî sexte ne..."

Wax wax wax!

"Ê de ne him dijmin in û him jî dema dibîne ku xortêna mala Diranketiyen bi tirimpêlan dirin bi vir de û bi wir de, ew çavnebar dibe. A wî bi xwe tune ye, loma jî xuyaye bêtir har dibe. Erê welleh, ez serê te neêşînim, radibe diçe ba polîsan û dibêje "li ser bextê min be ên hersêyan jî sexte ne. Berî ku bêñ vir, ji xwe re ehliyetên sexte çêkirin dan û hatin. Mohra li ser ehliyetên hersêyan jî, mohra daîra tapoyê ye. Midîrê wir dostê wana bû, wî bêbavî bi destêna xwe ji wana re mohr kirine. Wî segbavî, milkêna xezînê jî bi wê mohrê li ser wana tapo kiribûn û em jê bêpar kiribûn. Ew çû, me wê çaxê bi wana hîkaribû. Lê bi ehliyetan, teriya wana îro di nav destêna min de ye. Bawer bin hersê jî li welêt cîranêna min bûn, ji gundê min bûn û ez vê yekê wek dînê xwe zanim" dibêje. Polîsan, çend carekî ji bo vê yekê gazî wana kiribûn, baş li wana guhdarî kiribûn, kopya ehliyetên wana girtibûn, nivîş şandibûn heta Tirkîyeyê û li rastiya vî tiştî pîrsîbûn, lê tiştek ji vê jî derneketibû. Polîsan soxî bela xwe ji wana vekiribûn"

Wax wax wax! Ev ci hawe ne gidî, bavo ev Miho dîn e. Tu van tiştan hemûyan ji ku dibihîzî Remo?

"Ne tu nahêlî ez bêjîm! Min şevê din telefon da Îskoyê Devrêşan, wî ev tişt hemû jîm re gotin ha. Li bajarekî ne"

Tu nabê ji ber wilo carê heqê telefona te nîvî meaşê te digire! Karê te telefon e.

"**G**uhdar bike... ji xwe ku ne ez bim, tu bi tiştekî nahisî. Heger heqiyek li vê dinê heba, ji xwe gerek nîvî heqê telefona min, te bi xwe bida. Ez telefonê didim û tiştêna ku ez dibihîzim jî, li xwe û te par vedikim. Ê, em li ku mabûn... Heyran qurban, berî bi mehekê, hersêyan mala Diranketiyen Miho li kahweke bajêr dîtibûn. Du camerêna din jî, -xwedê dizane Kurdêna başûr bûn- li ser masa wî bûn. Reşo, Misto û Şêxo dirin silavê li wana dikin û li ba wana rûdinin. De ne Reşo mezinê pismaman e, ew diaxive û dibê "Miho, heyran, tiştêna ku te heta aniha kirin, bila xatirê xeribiyê bin, xem nake... lê ez tika dikim bela xwe ji me veke, ji xwe re karekî, xwendinekê bike. Em gundiyan hevdû ne, heger me li welêt zikê hevdû hinekî êşandibe jî, me mîr ji hevdû ne kuştine, mirov li van welatan jî berberiyê nake." Lê Miho "himmm, li we teng bûye ha? Ji xwe hûn wilo ne, kengî ci lazim be, hûn wê dikin, hûn him nêr in û him jî mî ne. Dema hûn xurt bin, hûn

bêhnê li mirov diçikînin û dema qels bin jî, têñ li ber mirov digerin. Lê heta ku li we teng nebe, hûn xwe nadin ber tu dar û bazaran. Welleh ez ji ser pişta we danakevim. Lê heger ên we yên li welêt herin xwe bavêjin ên me, nîvê erdan li ser me tapo bikin, ez ê di we bibuhurim" dibêje wana. Şêxo radibe li wir xwe radikişîne Miho, lê him Reşo û him jî herdu camêrên din, wî digirin."

Ê, bi dû re?

"*D*e ka guhdar bike! Tu nabê Misto û Şêxo, bi dû re her li Miho geriyane û xwestine lêxin. Berî bi bîst rojekî, êvarekê derengê şevê wî li ber mala wî digirin. Bawer be herdu baş lêdixin. Du diranêñ wî yên pêşî dişikînin, zêr bûn. Miho di vê derheqê de deng ji xwe dernexist. Mêrik li xwe dananî ku here û "li min xistin" bêje. Li wana neçûbû gilî jî. Ji mereqdaran re "ez ketim" dibêje. Ji daîra alîkariya civatî re jî "ez ketim, diranêñ min ên zêr şkestin, divê hûn ji min re dîsa çêkirin bidin" dibêje. Ew jî "baş e, here doktorekî ku bikaribe diranêñ te çêbike bibîne, em ê heqê diranêñ te bidin" jê re dibêjin. Lê ji bo diranêñ xwe diçe ba kîjan doktorî, jê re, "bavo welleh ez nizanim diranan zêr bikim, em li vî welatî nema tiştêñ wilo dikan" dibêje. Her cara ku Miho efendî ev yek ji wana bihîstibû, xeberên dinyakê ji wana re dabûn û derketibû: "çawa hûn nizanin diranan zêr bikin, ev ci derew in, welleh hûn hemû bûne hevalbendêñ mala Diranketîyan" dibêje. Lê tu zanî ku li van welatan xeberdan û bêhn tengkîn tiştekî baştir nakin, diranêñ wî wilo man. Miho radibe simbêlêñ xwe mezintir dike û bi ser devê xwe de berdide, diranêñ xwe bi wî awayî hinekî vedîşere. Lê li gora ku Îsko ji min re got, ci cara ku Miho li malê diçe ber mirêkê, simbêlân hildide û diranêñ xwe dibîne, ricfeke bi jan digire bedena wî. "Diranketîyan ev yek jî bi me kirin" her carê ji xwe bi xwe re dibêje û hartir dibe. Hîna du hefte bi vî halî naçin, Miho diçe ba tercumanê xwe û namake békemasî ji ên welêt re lêdike. Her tiştan di namê de lêdike û ji rîhspiyêñ Derengketîyan daxwaz dike ku herdu birayêñ wî yên bicûk û Eloyê pismamê wî zû kar bikin û bişînin hewara wî. "Ez li vir tenê me û ez bi Diranketîyan nikarim... hersê bi hevdû re ketin pêşîya min, ez ji kuştinê filitîme... Tûjo, Üso û Elo zû bişînin... hûn ciqasî jî li wana bidin, xem nake, ez li vir tenê me. Heger hûn wana bişînin, em dîbin çar û ew dimînin sê. Em ê wê çaxê nigêñ wana di zikê wana xin. Heger hûn jî li wir li wana bişidînin, belkî Diranketî xwe bidin ber bazaran û para me ya milkan bidin me". Çend roj bi vî awayî diçin. Lê bi ci roja ku diçe re, diranêñ wî jê re dîbin derdekî mezintir. Di

rêyên çekirina diranan dirame û her dirame. Tu nabê bi dû re tê bîra wî ku qereçîyan li ba me diran zêr dikirin. Mihoyê min û te radibe diçe vê yekê, ji daîra alîkariya civatî re dibêje û daxwaz dike ku wî bibin ba qereçîyan. Lê daîra alîkariya civatî xwe nade ber ku peran bide qereçîyan û diranêñ wî zêrkirin bide. "Ji xwe nizanin" dibêjin. Heftakê li ber hevdû didin, lê Miho dike nake, daîre xwe neda ber vê hellê. Diranêñ wî dimînin di stûyê wî de..."

Ê?

"Guhdar bike... Li gora ku tê gotin, du malêñ qereçî cîranêñ wî ne. Miho êvarekê radibe û rast diçe li deriyê malekê ji wana dixe. Tu nabê jinika malê tenê li malê ye û tu tiştan ji Miho fam nake. Lê dema Miho peran derdixe û şanî jinikê dike, jinik bi xışûşa ku Miho tiştêñ xerab jê daxwaz dike, dike. Jinika tenê, dikeve tırsê û şıkê. Dema jinik wilo ji jêr ve li Miho dinere, şıklê wî û rewşa wî ji xwe bi xwe re tercume dike: "ji xeraban pê ve ne tu kesêñ din e û ez bi serê xwe tenê me, ez pê nikarim" dibêje. Wê bîstikê hew rîyeke xelasiyê tenê tê bira wê. Zû ne dereng gazî kûçikê xwe yê schäfer (Ingl. alsatian) dike û berdide Miho. Îsko ew kuçik diyê. Li gora ku Îsko digot, kuçikekî piştşîn e, wek gurekî zozanan e. Dikare gayekî cot bavêje erdê. Dema jinik, "rahîjyê" dibêje, kuçik radibe ser herdu nigêñ dawî û xwe diavêje Miho. Ji Miho re, hew rev dimîne. Lê reva ji ber kûçikekî wilô, tu xelasiyê nade mirov û rûyê mirov spî nake. Heta ku Miho canê xwe xelas dike, kûçik şalê wî ji paş ve zîvar zîvarî dike û wî didirre, xwînê û xwêdanê pê dixe. Li gora ku tê gotin hîna jî nikare bi hesanî li ser qûna xwe rûne. Ew ji wir baş dîrrîbû. Lê xwedê rîha bavê wî sitirandiye ku jinikê ji mîrê xwe û ji êla xwe re negotiye. Heger ji wana re bigota, divabû Miho ji wî bajarî bar bike. Lê ew yek nehat serê wî."

Tiştêñ ku hatine serê wî, zêdeyî wî ne... ma bila hîna ew jî bê serê wî?

"Ezbenî, ew tîne serê xwe... çîrok, heta vir wilô ye... îcarê em bêñ ser girtina wana. Ez zanim tu anîha bêsebir bûyî."

Erê welleh, pirr. De ka were ser girtina wana.

*H*eyran berî bi çar ya jî pênc rojan, Miho tiştekî din dike û îcarê digihije mexseda xwe. Mala Diranketîyan di ciyekî teng de digire. Tu nabê Miho ji hinekan dibihîze ku Reşo, Misto û Şêxo ji bo kirrîna goşt û mirîşkan çûne gundekî. Bê kê ji Miho re gotiye ku mirov li van welatan nikare heywanan bi qaçaxî serjê bike ez nizanim, lê xuyaye hinekan jê re gotiye û dizane. Miho radibe diçe li sûkê li yekî îstîdacî dipirse. Li sûkê rastî Kurdêñ Maraşê

tê û ji wana pirs dike bê ma li ku heye. "Kûçikên polisan, bertîlxur in û cendirme jî bizdiyayî û di xwe re nedîtî ne, bikêr nayêñ. Newêrin ji ciyêñ xwe derkevin. Ji xwe ne wek tu cendirman in, ew bi xwe ji mirov ditirsin. Ka cendirmêñ ba me... lê soxî, hûn ka îstîdaciyekî şanî min bikin, bila ew ji min re lêke... ez ê herim derkevîm ba mude-î ûmûmî" dibêje. Xelkê Maraşê dixwazin wî ji kirina wî vegeŕînîn, lê Miho bi a xwe dike û digere. Li vir dikeve û li wir dikeve, lê tu kesêñ ku rêya ba îstîdacî şanî wî bikin, peyde nake. Miho yekî Tirk bi xwe re dibe û bê dilê xwe û bê hêvî, ji bêgavî dîsa diçe ba polisan. Ji wana re ta bi derziyê vedike. Polîs îcarê zû radibin ser xwe, du kûçikan jî digirin ba xwe û dikevin rêya gundan. Dema diçin ciyê cî, ci bibînin... qet ji çavêñ xwe bawer nakin. Heta wê çaxê Diranketî di axoyekî de gihabûn dor sed mirîşkekî ser jêbikin, dor pênciyekî jî hîna li bendî dora xwe bûn û ji ber tîrsê di ser hevdû re diquliptin. Dema rebenêñ mayî didîtin bê serê hevalêñ wana bi ci awayî ji gewdê wana tê birrîn, çawa bi ser hevdû de diperpitin, ji tîrsa canê xwe re qîjîniyeke xemgîn û bêrawest dikirin. Li gora ku tê gotin, qîjîniya wana, wek dengê giriyê pîrekêñ li ser tirban bû. Şêxo daketibû nav wana û carê bi stûyê duduyan digirt û didan destê Reşo û Misto; wana jî ser jê dikirin û diavêtin ser loda ên serjêkirî. Wê hemû serjêbikirana, bi dû re li havdû par bikirana û di kîsan xistana. Dema bihatina malê, wê jînêñ wana yek bi yek di serşokê de biperitandina, bişuştina û di dolava qeşê de hilanîna û bi dû re bol bol bidana zarokan. Du golik jî li wir bûn, ew hîna li bendî heta ku mirîş xelas bibin bûn. Wê ew jî ji bo mîvanan û rojêñ şaiyê bûbûna şîvîn taybetî. Li gora ku tê gotin, dema ku polîseke pîrek vê rewşê dibîne, xwe nagire û hêstir wek baranê ji çavêñ wê diherikin ser dev û lêvîn wê. Rewşa ku didît, wêneyeke xemgîniyê bû. Heta gihabû wî emrî, kirineke din wilo bi zalîmî nedîtibû. Şêxo bi xwe di nav mirîşkan de bûbû wek ku mirov çoyê xwe di dims dake û bi dû re jî di nav perîkan rake. Ji serî heta nîgan di nav perîkan de mabû. Reşo û Misto jî di nav xwîn û xwêdanê de mabûn. Kêrên wana yêñ bixwîn di destêñ wana de diçirisandin.

Wê carê mala Diranketîyan teng hatibûn girtin.

Polîs radibin hersêyan û xwedîyê mal dikin tirimpêlekê û dibin bajêr. Li gora ku tê gotin, nehiştibûn ku destêñ xwe jî bişon. Li polîsxanê destêñ xwe dişon. Polîs radibin ifada wana digirin û wana berdidin. "Herin, wê dadgeh bi dû re gazî we bike" dibêjin. Pêr gazî wana dikin, diçin dadgehê. Dibêjin ku mude-î ûmûmî, sê meh heps û bi hersêyan jî, bi buhayê kîloyeke zêrê

zer, cezayê perên welatê xwe ji wana re dixwaze. Lê wilqase ceza ji mîrikê xwediyê mal re jî dixwaze. Li gora ku Îsko dibêje, mîrik dostê Kurdan e. Kurdên me her salê diçûn ba wî, qûtê xwe yê salê jê dikirrîn û dihatin. Mîrik erzan dida, lê ji ber ku bi qaçaxî bû û tu bac nedida dewletê, ji bo wî bi xwe, dîsa jî pîrî baş bû. Mîrik payîzê û zivistanê jî diçû nêçîra pezkovian. Bawer be heta roja îro Kurdên me ji wê jî bêpar nedikirin. Lê êdî bavê mîrik şewitî. Îcarê daîra bacê jî xwe kiriye nav vî karî. Şika ku mîrik gellek mal bi dizzî firotiye û bac nedaye dewletê jê dîkin."

Wax wax wax! È...

"De ka guhdar bik... Miho di dadgehê de jî derdikeve şahdebûnê li wana dide. Tiştê ku ji destê wî tê di Diranketiyen dike. Wê wan baş bilebikîne. Li gora ku tê gotin, Miho radibe ser xwe û "ev li welêt jî wilo bûn, camêran fêrî xwarina goşt bûne... hew xwedê û pîra dêya min zanê bê çend elok û çend dîkên me xwarine... wana qet bernedin. Roja hûn wana berdin, wê herin dîsa wilo bikin" dibêje.

Wax wax wax! Ma vana mîr ji hevdû kuştine?

"**D**e ka guhdar bike. Mîrên ci lo. Miho wilo fêr bûye. Bavo tu nabê ew bûyer belav dibe, digihe heta rojnaman û komelên dostên heywanan jî. Roja ku hersê xortêna mala Diranketiyen û xwediyê mal derdixin dadgehê, hemû rojname di derheqa vê bûyerê de dinivisin. Èn dostên heywanan jî xwe kar dikirin û têna li hewşa dadgehê pankartan vedikin û qirikê li xwe diçirînin. Daxwaza ku cezayê hepsê yê giran bidin dîkin. Dema dadgeh xelas dibe û Kurdên me derdikevin, ew bi xwe hîna jî li wir in. Tercumanê Miho jê re dibêje bê ew xelk hatine wir ci û ci dibêjin. Miho radibe diçe ba wana û "min ev sûc eşkere kiriye" dibêje. Wî pîroz dîkin û qedirê dînyakê didin Miho. Pirr kîfa wî tê. "Xuyaye mala Diranketiyen xwe hîna negihandine vana, ev baş in, dostên mirov çiqasî pirr bin, wilqasî baş e" ji xwe bi xe re dibêje.

Grûpeke nijadperest jî hatibû wir. Ew jî, dema dibihîzin ku biyaniyan tiştîkî wilo kirine, têna pankartên xwe li wir vedikin û dixwazin ku sûcdaran ji welêt bavêjin. Tu nabê ji rojnaman dixwînin. Tercumanê Miho, mexseda wana jî jê re dibêje. Miho baş di meselê narame û baş ji hevdû dernaxe û tercumanê xwe bi dû xwe de dikişkîşîne û diçe ba wana jî. "Hûn çavên min bin... xebera we ye, ma mala Diranketiyen li vir ci dîkin, wana bavêjin nav Ereban" dibêje."

È?.. bi dû re?

"Diranketî hatin berdan... wê dadgeh karê xwe bike û bi dû re ji wana re bibêje bê gihaye çi biryarê. Lê bawer be li gora ku Îsko dibêje, wê wana têxin hepsê. Pirr xerab hatine girtin, sucekî giran e. Serjêkirina heywanan jî wek kuştina mirovan e"

Ê?... wê ev kar çawa bibe? Êdî nema karin di hevdû bibuhurin, êdî tore anîne serê hevdû. Ma ev karên mirovan in Remo. Uffff!...

"Wellehî ez nizanim bê karê kî ne. Mirov ne mirov, lê em hîna ev in. Hîna ên wek Miho di me de pirr in.

Dibêjin ku îcarê Miho di bin parastina polisan de ye."

Îcarê ew ji bo çi ye?...

"Ez benî, Şêxo, hîna li dadgehê ji Miho re "Miho wellehî dema ez ji vir derkevîm, ez ê te bikujim" dibêje."

Miho radibe vê yekê jî bi alîkariya tercumanê xwe, ji dadgehê re tercume dike û dike dosyayê. Tercuman mecbûr e, tiştê jê tê xwestin, dibêje: "welleh Şêxo, "ji Miho re, ez ê te bikujim dibêje" dibêje." Îcare ev gotin ji bo Şêxo bûye derd û súcekî din û daweke din. Polîs û endamên dadgehê bawer dîkin ku wê Şêxo, bi rastî Miho bikuje. Loma jî Miho ji Şêxo diparêzin. Wilo ye ezbenî, gotina ez ê te bikujim, li van welatan gotineke giran e; kirin û gotin wek hevdû ye, mirov ji bo gotineke wilo dikare di hepsê keve û emrekî di hepsê de bîmîne. Polîs bi xwe di vê derheqê de bêşik in. Polisan, tiştên ku Şêxo û herdu pismamên xwe li gund kiribûn, bi çavêن serê xwe dîtibûn. "Mirovên ku sed mirîşkan serjêbikin û hîna negîhabin pênciyê din û du golikan jî serjêbikin, bi hesanî karin zilamekî jî bikujin. Loma êdî Miho diçê bi ku de, du polîs deh metroyan bi du de ne û wî ji Diranketîyan diparêzin."

Bavo ev sîneme ye. Xelkê me li van welatan, wek berî bi sed salan dijîn.

"Erê kurro. Tu ka bise bê wê hîna çi bînin serê hevdû!"

Ê?..

"Ê tu sax. Êdî nema şûr simbêlên Miho dibirin. "Min bi serê xwe tenê him zora Diranketîyan bir û him jî zora polisan bir. Îcarê bûne peyên min" dibêje û li sûkan bi qapanî digere."

Haa... haaa... haahaa... hooo weh!

"Erê, tu bikene...tu ken bi xêra min dikî, lê heqê telefonê ji min tenê re tê..."

JI EDEBIYATA NÛJEN HELBESTÊN KURDÎ

AGIR Û JÎYAN

Kazim POLAT

AGIR

Ji hezar salan wir ve
dişewite
li çiyayêñ welat
di kozikekê de
Di ber singê zinarekî de
dibarê ser malên Dehaqan
carna bi niftikek
carna bi du keviran
carna bi stêrkekî
û carna
carna bi canekî
pêdikeve
û dişewite

Nisan 1993

JÎYAN

Hêdî
Hêdî
Seriyên
Xwe
Rakirin
Ji berxwe
Mêrên kal bûn
Jinên pîr bûn
û rabûn
wek xorêtê bîst salî bûn
û rabûn
gotin:

“ev jiyan jiyan nîne”
û fikirîn:
“Jiyan serîhildan e
û berxwedan e”
wek agir
wek brûsk
ku carêk pêket
tiştêk
nîne.

Nisan 1993

TIŞTÊN ME

Genimê zerik di bin potînê
leşkerande
nîskên sorik di bin lepêñ tankan
de
nokên heşîn di bin bombêñ bala-
firan de
hêñ jî, ji van zêdetir tiştêñ me, di
bin destan de
xweşik
rindik
bedew
û bi rûmet
di bin
talan
qirkirin
û mirin de

Tirmeh 1995

Rojnamevan-nivîskarê aşûrî Jan Bet-Şawoce: Têza kurd ya dîrokî xwedî gelek xeletîyan e

Hevpeyvin: GABAR ÇIYAN

Jan Bet-Şawocê: 1955 de li Midyadê hatiye dinyê. Heta lîsê li wir dixwîne. 1975 de derdikeve derveyî welêt. 1987 de kovara lêkolînî "Nsibin" di bin berpirsiyariya wî de dest bi weşana xwe dike. Di wê salê de "Weşanxaneya Nsibin" ava dike. Heta niha 40 pirtûkên weşanxanê li ser dîrok, ziman, çand û toreya aşûriyan, bi tirkî, aşûrî, erekbî û kurdî derketine. Jan gelek pirtûk nivîsandine û ew endamê Yekîtiya Nivîskarêne Swêdê û Yekîtiya Rojnamevanê Kurdistanê ye.

- Zimanê aşûriyan zimanekî kevn e. Kovara we ne tîpêñ kevn, lê yên latînî bikar tîne. Ev jî dibe sedem ku zimanê kovarê bête rexnekirin. Çima ne tîpêñ we yên kevn, lê tîpêñ latînî hatin hilbijartîn?

Jan Şawoce: Raste. Em xwedî zimanek dewlemend in. Zimanê me bi navê kildanî, aşûrî, sûryanî tê nasîn. Ew bi sê cûre alfabe tê nivîsin; kildanî, estrangelo û sûryanî (sérto). Alfabeya Kildanî ji 22 tîpan pêk tê û ji aliyê Dêra Kildanî û ya Nasturiyan tê bikaranîn. Tîpêñ bêdeng ji jêr û jora xwe ve têñ noktekirin û bi vî şeweyî dengan distînin. "Şedde" ya erekbî, jibo hişkkirina tîpan bikar tînin. Alfabeya sûryanî li Dêra Sûryaniyêñ-rojava tê bikaranîn. Yanî ev jî teref sûryaniyêñ ortodoks, marûnî, sûryaniyêñ katolîk û li hin deveran jî rom- ortodoks û katolîk ji pê dinîvisînin. 22 tîpêñ wê hene. Tîpêñ grekî yên bideng li ser jêr û jora tîpêñ wê yên bêdeng têñ siwarkirin û bi vî şiklî dengan distînin. Di vê alfabê de tîp nayêñ hişkkirin. Tîpêñ biquncik estrangeloyo ji teref tevayê aşûriyan tê bikaranîn. Sernivîs û nivîsên taybetî, bi wan estrangeloyo têñ neqîşandin. Kesêñ zimanê me zanîbe, bi hêsanî dikare wan tîpan bixwîne. Ji bilî wan, zimanê gerşûnîce jî heye. Berhemêñ bi vî zimanî, tîpêñ xwe aşûrî ne, lê ziman tirkî, kurdî, farisi û erekbî ne. Weke tê zanîn, cih û warekî fermî yê gelê me tûne ye. Mîna Watikanê dêrêñ me yên hemdem, federasyon û komele anjî komîteyên pêve girêdayî tune ye. Lewmaye ku weke gelek pirsên me, pirsgirêka zimên jî yek ji wan probleman e ku li benda çareserkirinê ye. Dem derbas dibû û ji awira zimên ve rewşa me xeraptir dibû. Min jî dest avêt tîpêñ latînî. Sedema wê ev e: Sûryaniyâ klasîk ya rojava anku zimanê Rihayê, piştî Mesîh bû zimanê nivîsinê. Di pêşveçûna ola Filehî de ev ziman hat bikaranîn û piştre mîna zimanê lîtûrji hate hejmartin. Di dema niha de ev ziman bi

tenê ji aliye hinek oldarên me û rojhilatnasan ve tê zanîn. Li dêra, di dema nimêj û hwd. de pirtûkên olî pê tê xwendin. Ji bo xelk tê bighêje, tiştên tê xwendin ji aliye oldaran ve tê wergerandin bo zimanê peyivandinê. Ev nakokî bû û ev nakokî cara yekem di salê 1960 de ji teref zimanzanayê elmanî Prof. Helmut Ritter ve hate dîtin. Ritter pir caran diçû dêran û li oldar û xutbêñ olî guhdarî dikir. Wî gotibû: Li dêrên súryaniyan du zimanêñ cewaz têñ bikaranîn...

*L*i ser bikaranîna tîpêñ latînî gelek kesan ez rexne kirim. Li gorî wan, ne pêwîste ku mirov tîpêñ latînî bikarbîne. Ji ber ku alfabeşa me dewlemend e. Lê çend gotinêñ min ji wan kesan re hene: Gava hûn karîbin li ser tîpêñ kevn xelkê îkna bikin û di dûv xwe de bikşînin, fermo. Lê bi rastî tu kes ev kar neda ber xwe. Kesêñ kar dikin pir kêm in. Ji xwe gava qala mesrefê tê kirin, her kesek bi alîyekî ve diçê. Bazdidin. Federasyon, komele û dêrên me, li hemberî tîpêñ latînî ne. Lê tiştekî alternatif jî çenakin ku zimanê me hêsan bike; pê bê xwendin û nivîsin û gel karîbe li zimanê xwe vegere. Ez pir caran diçime dêr û federasyonêñ me. Li dêra, zarok stiranêñ olî distirînin. Ji bo ku stiran di bîra zarokan de bimîne û wan jibîr nekin, zarok, stiranan bi alfabeşen zimanêñ ewropî dinîvisînin, not digrin. Wesan jî dixwînin. Federasyon û komelêñ me, di dan û standinêñ xwe de, nameyêñ xwe bi zimanê xwe nanivisînin. Protokolên kongre û civînan, bi zimanê wan welatêñ ku lêne dinîvisînin. Di peyvîn xwe de dibêjin: Em ji bo gelê xwe kar dikin. Heta doh bi çavekî nizm li zimanê xwe temaşe dikir in. Ji ber ku min alternatifek baş anî, gazinan dikin. Lê niha ev gazar şûna xwe dane xwendina tîpêñ latînî. Ev jî pêşveçûnek baş e.

Çanda devkî ya gelê me; çîrok, stran, gotinêñ pêşîyan û hwd. ku dewlemendbûna gelê me li Tora Evdînê ye, tev bi wî zimanî ye. Çanda me ber windabûnê diçê, lê ev bala me nakşîne. Gelê me bi tevayî nikare bi alfabeşa kevn bixwîne û pê binîvisîne. Li welêt ev çand û adet ji nesîlekî bo nesîlê din dihate dayîn. Lê li derveyî welêt neslêñ nûh ji çand, adet, ziman, dîrok, cîh û gelê xwe her ku diçê bidûr dikeve. Hilwêsandinek ecêp û kesînedîtî her roj tê pêşîya me. Ev di dema niha de ne malkambaxî be, ma çiye?

Di rastiya xwe de súryanîya nû ya rojava li beramber ku li Torê tê qisekirin, pir dewlemend e. Gava mirov bi zimanekî nexwîne û nenivîsîne, ew ziman çiqasî dewlemend be jî, wê jî hêza xwe bikeve. Ev 20 sal e ku em li Ewropa ne. Heya niha bi tevahî 10 pirtûk bi wî zimanî nehatine nivîsin. Bi vê çûnê ew ziman çawa dikare pêş bikeve? Gava nivîskarêñ me bi zimanê xwe li ser felesefe, edebîyat, dîrok û hwd. nenivîsînin, mirov nikare qala pêşketina zimanî bike. Li Ewropayê em dikarin li her cihekî dibistanêñ taybetî vezin. Lê ev nayê kirin. Dezgehêñ me, ji bo windabûna me kar kirin/dikin. Ji ber van sedeman zarokêñ me ku li welatêñ cewaz mezin dibin, bi zimanê dayika xwe nikarin bi hevre bidin û bistînin. Li hemberî vê çûnê, kes û dezgehêñ me bêdeng in. Ez rewşenbîrek jî vî gelî me. Min helwêsta xwe bi vî şeweyî nîşan da...

- **Gelek kes rewşa aşûriya ya îro meraq dike. Li Mezopotamyayê hejmara aşûriyan çiqas e? Hejmara aşûriyên li derveyî welêt pir e?**

Jan Şawoce: Welatê aşûriyan xwedî gelek navêن cewaz e; ew nav ev in: Mezopotamyâ, Asurîstan, Aramîstan, Kildanîstan, Sûryanîstan û Babîlîstan. Aşûrî ji Basrayê heta Kafkasyayê belav bûbûn. Berî Mesîh û piştî wî gelek kes hatin qetkirin û ji ber vê yekê hejmara aşûriyan pir kêm bû. Li Tirkiyê hejmara wan ya îro ji 20 hezarî derbas nabe. Li Sûriyê jî 500 hezar in. Li Iraqê bi qasî 1 mîlyonî, li Îranê 60-70 hezar, li Lubnan, Misir û Urdûnê jî hejmarek baş hene. Berî Şerê yekem yê cîhanê, ji Edenê gelek sûryanî derbasî Grekê bûn. Ew li Argosê li du-sê gundan dijîn. Li wir mîna qerecan dihatin naşîn û di bin tadeya rûniştvanêن wir de bûn. Li Kafkasyayê hejmarek baş aşûrî hebûn. Li Azerbeycanê piştî dijitiya etnîkî, hejmara aşûriyan kêm bû. Li Rûsyâ û welatêن Asya-navîn jî gelek aşûrî hene. Lê hejmara wan ne diyar e. Gelek kes ji aşûriyan, berî û piştî şerê cîhanî li Emerîka û Latîn Emerîkayê bi cîh bû. Wan ziman û çanda xwe jibîr kirîne. Li Emerîka 500 hezar, li Latîn Emerîka bi qasî 100 hezarî hene. 10 hezar kes jî li Kanadayê dijîn. Ew ci demî çûne wir em nizanîn. Li Awustralyayê jî 20 hezar kes hene.

Gelê me yên li Ewropa pêşî li Ingilîztan û Fransayê bicîh bûn. Wan herdû welatan li Rojhilata-navîn gelek welat dagîr kiribûn. Ji sûryanîyên-rojava û rojhilat gelek kes bûbûn leşkerê wan yên kirekîr. Piştî ku karê wan bi dawî hat, gelek ji wan kesan li wan welatêن Ewropa bicîh bûn. Karkerên aşûrî di destpêka 1960 de hatin Elmanyayê. Heta serê 1970 hatina karkeran berdewam kir. Piştî gelek kes li welatêن Iskandînavya û cîhîn din, bûn penaberên polîtîk û li wan deveran bicîh bûn. Îro 200 hezar aşûrî li Ewropayê hene.

- **Ez dixwazim tu bi çavekî rexneyî nêzî vê pirsê bibe. Pirsgirêkên aşûriyan yên li derveyî welêt ci ne? Ji bo çareserkirina van, ci kar û xebat heye? Çiqasî dikarin biser bikevin?**

Jan Şawoce: Di serî de bêrêxistînî, bêserokatî, asîmîlasyon, bêarmancî, nezanî, bêhisî, bêexlaqî, bêfelsefeyî, dirû û dizimantî, nedirustî tê. Ji Rojhilata navîn bi gelek pirsgirêkan xwe em hatine vir. Mîrasa me ya tékoşîna polîtîkî zêde tunebû. Mêjîyê feodalî pir bihêz e, herku diçe ne ber bi windabûnê, lê bihêztir dibe. Dêrên me nikarin reforma çêbikin, di xebatêن xwe de li paş dimînin û rojbiroj endamên wan kêm dibin. Xelk diçin dibin endamên dêrên Ewropiyan. Dêrên me bi mîlyonan peran mesref dikin û dêrên nûh ava dikin, lê kêm kes diçine wan dêran. Rêkxirawên li dêran, ji hêza muxtarekî gundan bêhêztir e. Exlaq, adet, mirovantî, felsefe, aşîhezî û mêvanhezîya xwe jibîr kirîne. Kesên ku eleqata wan ji nêz ve bi karê ruhanî re tune ye, dikin keşe. Bi vê ji adet û toryeyîn li dêran ber bi xerabiyê ve dibin. Mîsal; pêşî hevdûberdana di navbêra jîn û mîrande, ne hêsan bû. Lê niha pir hêsan kirîne. Berî niha kesên nexwende, dirû û diziman û bêhurmet nikarîbû karên olî li dêran bikira. Niha li gelek deveran mirov rastî kesên wesan dibe. Û weke hercar ku ez di Kovara Nsîbin de qal dikim: Dêrên me ber kîjan deverê ve diçin? Ji bilî vê, di navbera dêrên me de dan û standin pir kêm in. Ji jor ve, ji teref

petrik têñ îdarekirin. Ji bo başkirina eleqatêñ di navbera dêran de, danûstandin pir kêm in. Fedarsyon û komelên me, mîna dêrêñ me ne. Ji doza netewî, demokrasî û dîtinêñ hemdemî pir dûr ditêkoşin. Mirov dikare wan ne bi navê dezgeh, lê bi navê çayxaneyan binav bike. Li wan çayxaneyan, du (2) karêñ esasî têñ kirin: Pêşxistina lîstikêñ qaremaçan (kaxez) û di bin navê lîstika futbolê de xire-cirek bêwate û bêarmanc. Car carna jî li ser navê welathezî (!) şev têñ lidarxistin, dîlan têñ kişandin û eraq tê vexwarin...

Gelek pirsgirêkên me yên wisan hene. Lê tu kesêñ me ku li ser van pirsan lêkolînan bikin, tune ne. Kes lê napisre, ka çîma em ketine vê rewşê? Riya felatê ci ye?

- **Weke ku tu jî zanê, di van rojan de salvegera jenosîda ermeniyan ya 1915 ne.** Em şehîdêñ rizgariyê bihurmet bibîr tînin. Bi qasî ku ez zanim, aşûri gelek caran dîrokzaneyan rexne dikin ku qirkirinêñ aşûriyan naynin zimên. Hûn dikarin me li ser wan jenosîdan ronî bikin?

Jan Şawoce: Raste gelek kes jî gelê me hatin kuştin. Ji ermenî, kurdan harin qetl-kirin. Ez jî, wan bihurmet bi bîr tînim. Rîhsipîyêñ me bêhtir qala pişti qirkirinêñ 1914 dikin. Pişti ku ez hatime derveyî welêt û hinekî bi karê lêkolînî daketim, diyar bû ku li gelek aliyen; li Irak, İran, Suriyê, Kafkasya û Lubnanê gelek kes hatine kuştin. Buyerêñ di wan salan de lêkolînêñ taybetî dixwazin.

Mışyonerên emerîkayî, ingilîzî, fransî û Rûsî ji bo ku binaxeyêñ xwe li welatêñ rojhilate deynin, di destpêka 1800 de hatin navçê. Çûn û hatina wan bi xurtî heta serê sala 1900 berdewam kir. Mışyonerên ku nûh hatin hewil dan ku me baş nas bikin. ew ziman, adet, tore û dîroka me baş fêr bûn. Tê gihiştin ku di destpêkê de kesêñ ku karin wan bihewînin aşûri, ermenî û Rom in. U ew li wir bicîh dibin. Ji bo ku hatina xwe nîşan bidin, dest bi avakirina hinek saziyan dikirin û di berde jî ola filahîyê belav dikirin. Hinek gavêñ pozitif avêtin. Yanâ dirûbûna wan gava di serî de derketiba holê, wê cihê wan li nav me çenebûba. Weke mîsal 1840 de li Urmiyê nivîsên bi súryaniya-rojhilat çap kirin. Kovara yekem ya aşûriyan li wir çap bibû, paşê dibistan, nexweşxane û dêrêñ ku bi mezhebêñ cewaz ve girêdayî, ava kîrin. Xelkê bîr û bawerî bi mîsyoneran anîbû. Mîsyoner jî pir jîr bûn. Her ku diçû dijminantî û nakokiya di navbêra gelên li mintîqê xurttir û bibertir dibû. Mîr Bedirxan di sala 1843 û 1846 de çû bi ser aşûriyan de. Gelek kes li Botanê hatin kuştin. Belgeyêñ nûh nîşan didin ku di dema çûn û hatina mîr de, di navbera Xerpêt û Torê de gelek gundêñ li ser rê, hatibûn wêrankirin. Qirkirin, ji sala 1850 heta 1880 nesekinî. Di wan salan de Elmanya dixwest cihê xwe yê di navçê de fi-rehtir bike. 1891 û 1895 de qirkirinêñ sultanê Osmanî Evdilhemîd dest pê dike. Evdilhemîd pir fenek bû. Gelên navçê berda hev. Paşê ji kurdan Alayêñ Hemîdî ava kir. Bi taybetî ji bo ku jenosîda 1895 ya li Amedê vesêre, bi derewa "serîhildanê" belav dikir. Li Amed, Riha, Torê, Botan, Wan û Colemêrgê gelek kes hatine qetlkirin. Li wan deveran bi hezaran aşûri hebû. Niha şopekî jî ji wan

nemaye. 1909 de Evdilhemîd dîsa derdikeve holê. Li der û dora Edenê 30 hezar ermenî û aşûrî hatin qetlkirin. Gelek kesan berê xwe dan Kafkasya, Emerîka û Latîn Emerîkanê. Bi salan li wir man. Hinek bi paşve vege riyan. 1910 de Ermenîstanâ Tirkîyê kete bin kontrola rusan. Ew bûbû hêviyek mezin ji bo rizgariya ermene û aşûriyan. 1914 de li Torê seferberlik hate şlankirin û mîrên wir tev birin eskeriya romê. Paşê em pê hisiyan ku ew tev hatin kuştin. Piştî ku Torê bêmîr û parastin ma, riya qirkirinê ji tirkan re vebû. Berî jenosîda Torê, Ittihat û Terakîyan wesan dan xuyanîkirin ku şer li hemberî ermanîyan tê kirin. Lewmaye ku li Torê tu kesî amadekariya şerî ne dikir. Paşê tirkan dest bi qetlkirina grubê bêhêz kir. Kesêni dihatin kuştin mîna sîxurên hin ji welatêن Ewropî û Emerîkanîyan nîşan didan. Piştî avakirina Komara Tirkîyê ji, qirkirin nesekinîn. Lî bi awayekî modern dihatin kirin; dibistanê me hatin girtin, rewşenbirê me avêtin zîndanan anji nefîkirin. 1920-21 de li Rihayê di hundirê çend rojan de hejmarek mezin ji sûryaniyan bi zora Kemal Paşa hatin sirgonkirin. Gelek rewşenbir bidarvekirin. 1924 de Serîhildana Nasturiyan hat perçiqandin û wahşeta artêşa tirkan bi salan di hundirê Iraqê de domiya. Gelek kesan barkir û çûn Misir, Lubnan û Kibrisê. Rewşenbir hatin bêdengkirin û gel hat tirsandin. Paşê ji şaxê CHP li Tora Evdinê hatin vekirin û politîka tirkkirinê bi xurtî domand. Û dewlet bi tevayê hêza xwe ev dever xiste bin kontrola xwe.

1933 de li Asûristana Iraqê, li hemberî rejîma Iraqê aşûriyan serî rakir. 7 ê tebaxê artêşa Irak bi piştgiriya balafirê RAF yên ingilîzan çûne ser aşûrî û kurdan. Wezîre Iraqê yê hindurû berî wê diçe Tirkîyê û li gorî belgeyên di dest me de, plan li wir ji tirkan re tête gotin. Berî qirkirinê leşkerên tirkan li ser sînor têb bicîhkirin. Piştî qirkirinê kesêni ku ji destê wan rizgar dibin, bi destê leşkerê tirkan têb kuştin. Nâvenda serîhildanê Sîmîl û Suraya ji holê radikin. Ew bûyer di dîrokê de bi "Qirkirina Sîmîl" tê navkirin.

Berî şerê cîhanê yê duwê, Tirkîyê carekî din berê xwe da gelên nemisulman. Wê carê İsmet Paşa dixwest ku dawiya wan bîne. Lî balyozxaneya rusan li Stembolê pê hisiya û plan tête rawestandin. Paşê gelek kes ji aşûriyan di bin navê ihtiyatî de kîrin leşker. Ew kes venegeriyan malên xwe. Tev li Enedolê tî û birçî man û mirin. Di duv wê de, xela hat. Xelk ji birçîna dimir. Ew derd ne bes bûn, di ser de ji baca "Varlik" hate danîn. Kesêni ku baca xwe nedida, ew sirgonî Enedolê dikirin. Li navçê, hunermendan dev ji karên xwe berdan û gelek kes bûn penaber. 1950 de pirsa Kore û Kibris derket holê. Gelek kurd û aşûrî hatin şandin. Lî mixabin li ser wê bûyerê ti lêkolîn nehatin kirin. Ez hinekî lê kûr dibim û di derheqa wê buyerê de dokumentan didime hev. Salê 1960 çûna Elmanya dibe hêviyek mezin. 1964 de li Torê MIT (rêkxistina polîsi a tirkan) û hin feodalên kurdan xwestin tirs û revê têxin nava gelî. Armanca wan ew bû ku xelk bar bike û malên wan talan bikin. Di wê demê de serokê belediya Midyadê Zîwer Midyat bi MITê re kar dikir û rola serekî dileyist. Cemîl Îşlerê Estili, M. Alî Arikan, H. Abdulkerîm Gûven yê ji

MHPê ji alîgirê wan bûn. Lê divê bête gotin ku gelek kesên kurd, mîna malbata Nehroza ji alîkariya sûryanîyan kirin. Dr. Rifat yek ji wan kesan bû ku divê navê wî ez bi başî bînim zimên. Wî li dijî xeraban hemû tiştên qanûnî kir û moralek mezin dabû sûryanîyan... 1974 de dagîrkirina Kibrisê bû sedem ku li dij sûryaniyan hinek plan bêñ çekirin. MIT û kesên li jor ku hatine binavkirin, carekî din bi rola xwe ya xerab rabûbûn. Şerê navxweyî yê Lubnanê ji pir tesîr li me kir.

- Tu di pirtûka xwe ya dawî, "Kürt Milliyetçiliçi ve Ulusal Inkarcılık" de gelek rewşenbîr û serokên partiyên kurdan rexne kiriye. Di nav wan kesan de Cegerxwîn, M. Anter, Barzanî, M. E. Bozarslan, K. Burkay, M. Baksî, M. Yetkîn, E. Xemgîn ji heye. Armanca we ci bû? Rewşenbîr û rêkxirawên kurdan, aşûriyan baş fêmdikin an na? Mirov dikare ci bike?

Jan Şawoce: Min gelek ji lîteratura Mezopotamyayê berhev kiriye. Beşa kurdî yek ji wan e. Ez wan berheman yek bi yek dixwînim.

Mixabin mîna têza dîrokî ya tîrkan, ya kurdan ji xwe di wan berheman de dide der. Bi salan e ku ez radiwestim. Lê heya niha ez pêrgî ti nivîskarekî kurdan nebûm ku wan berheman rexne bike. Dawî min biryar da ku ez wan xeletiyan berhev bikim, pêşî di Kovara **Nsibin** de biweşînim û paşê bikim pirtûkek. Min wesan kir. Nivîskarêñ şoven û neteweperest yêñ tîrkan ji ber talankirinêñ xwe herdem bûne hedefa me û ew hatine/têñ rexnekirin. Qet nayê pejirandin ku rewşenbîrêñ kurdan li ser navê pêşverûtiyê, mîna wan bikin. Hinek ji rewşenbîrêñ kurdan ketine vê xeletiyê. Gava min ev şâşitî dît, ez ecêp mayî mam. Çawa dibe ku kesên pêşverû, şoreşger û demokrat dikarin wesan bikin. Dawî min biryar da ku ji wan re bêjîm: bes e, bisekinin...

Bi vê pirtûkê min xwest ez bêjîm ku; aşûrî ji li navçê, mîna kurd û ermenîyan gelek vegetandî û kevn e. Wan gelek caran di nava şerê netewî yê kurdan de cihê xwe girtîye û şer kiriye. Ew danûsatandinek enternasyonalistî bû. Neyarêñ aşûrî û yên kurdan yek in. Aşûrî bi yekê zanin, lê kurd xwe ji vê tastiyê dûr dixînin. Di serîhildana Şêx Saîd de gelek aşûrî û ermenî cîhêñ xwe girtin. Di serîhildanêñ din ji aşûriyan bi kurdan re li dij neyarêñ xwe şer kiri. Di destpêka şerê Barzanî de, aşûrî pêre bûn. Di avakirina Komara Mehabadê de, aşûrî bi kurdan re bûn. Di Tudehê de, di avakirina partiyêñ komînist yêñ Suriyê, Lubnan û Irakê aşûrî rolêñ pir mezin dabûn ser milêñ xwe. İdeologên herekata netewî ya Filîstînê aşûrî bûn. Divê ev bêñ dîtin. Nivîsandina van pêşî wezîfa me ye. Spas ji we re.

JI NAV EDEBIYATA SWÊDÊ — 1

AUGUST STRÎNDBERG

*A*ugust Strînberg (1849 - 1912) li bajarê Stockholmê, di nav malbatke burjuva-piçûk de hatiye dinê. Wî cêrgek kar ceribandine — mamostetiya xwendegha bilind ya gel, artisti û rojnamevanî kiriye— heta ku nivîskarî jêre bûye meslekê daîmî, sê caran zewiciye û çend caran bi periyodê dirêj li dervayî welat jiwaye.

Strînberg, wek pêşevayê edebiyata Swêdî ya nûjen (modern) nav û deng daye, wî di warê navnetewî de jî dengê xwe daye bihîstin. Wî, ji sala 1870 heta mirina xwe, xwe tenê daye nivîskariyê, qasî 55 berhemên wî hene: Roman, piyes, berevokê serpêhatiyan û nivîsên zanistî (ilmî).

*D*nîvê dawiya sedsala nozdan de pêşketina îndustriyê bi xwe re guh-randinê mezin anî nav civata Swêd. Refgirtinê hêzên çînî û mezinbûna şerê çînî xwe gihadibû merheleke bilind. Di nava van şertan de, wek endamekî çîna burjuva-piçûk, Strînberg, di navbera radikalîzm û konservatîzmê de, û di navbera olperestiyê û ateîstiyê de diçû û dihat. Ew ji fîkrîn dereke ra vekirî bû. Ji gelek aliyan ve bi gelşen (problem) hevdemî re eleqeder dibû. Darwîn, Marks û gelek alimên din dixwend. Di huner û edebiyatê de li rêçen nû digeriya. Wî, intiba mezin ji nivîskarên ewrûpî wek: Dickens, Zola û Dostojevîskî girt. Di pirtûkên wî da hemû pirs û gelşen demî, hatine nitirandin. Lê rêçeve wî ya zelal û sabît tune ye di berhemên wî da. Di salên 1890î de, çîma ku li dijî dêrê nivîsîbû, li ser wî dawa hatibû vekirin. Dadgehê ew serbest berda, lê piştî vê bûyerê, ew li Swêdê nema, çû dervayî welat, bi salan li Elmanyayê û fransayê jiya. Lê di dawiya emrê xwe de dîsan giranî da olperestiyê û li aliyê hêzên radikal cî girt.

Jin, di civata nû de rola jinê, babeteke sereke ye di piyes , roman, û hel-bestêñ wî de. Di vî warî de jî fikreke wî ya sabît tunebû. Carna azadiya jinê diparêze û carna jî jê nefret dike.

*A*liyê wî yê taybetî ew bû ku, wî zû dinivîsî, dramatîze dikir û berî hertiştî wek yekemîn nivîskarê romana Swêdî ya realist xwediyê xezîneyeke peyvan ya gelekî dewlemend bû. (Gothe 26 hezar, Strîndberg, qasî 21 hezar peyv-kelime- bi kar dianî.) Wî bi çavêkî objektîv, her eşiyayek yan jî dîdemek bi hemû detayên wê dida. Aliyekî wî yê din jî ew bû ku, heta derketina wî, tu nivîskarekî Swêdî qasî wî babetên munaqaşa û gotubêjan neajotibû pêş.

*D*u salan berî mirina wî, di 63 saliya wî da, ew bi daxuyanî û meşeke mezin hat pîrozkirin. Xaniyê ku têda mir niha wek muze, bi navê Muza Strîndberg ji xelkê re vekiriye.

Berhemên Strîndberg yêñ meşhûr ev in:

- 1— Kurê Jinika Xizmetkar —Otobiyografi
- 2— Dizewicin —Berevoka Serpêhatiyan
- 3— Bav —Piyes(trajedî)
- 4— Odeya Sor — Roman
- 5— Welatê Nû — Roman
- 6— Runiştvanê Gravê — Roman

LI SER NÎV PARÇE KAXEZ

August STRÎNDBERG
Werger : X. LEZGÎN

*B*arê malbarkirinê yê dawiyê jî çûbû, mala xwe ji binîva bar kiribû; mîrekî ciwan, qeytanekî reş ya şînê li dora fotorê wî alandî, carekî dîsan li hundirê xanî doşbû, çavê xwe gerand, ji bo ka gelo tiştek jibîr kiribû yan na. —Na, tu tiştek jibîr nekiribû, hîç; û ji hundir derbasî sivderê bû, biryara xwe dabû, ku hîç li ser jiyanâ xwe ya di vî xanî da nefikire. Lê belê li sivderê li ba telefonê, kaxezekî nîv-par, bi dîwar va pît hatibû zeli-qandin; û seranser bi destnivîsên qelema hêşîn zelal bûn, dihatin xwen-

din, yên din jî bi qelema reş yan jî sor, bi stîleke xerab hatibûn nivîsandin. Hertişt li ser vî kaxezê bû, hemû ew dîrok û serpêhatiyên wî yên du salan, ku di vî xanîda jiyabû, hertiştê ku wî dixwast jîbîr bike, li ser vî kaxezî nivîsandî bû; demeke dirêj, ji jiyana mirov li ser nîv parce kaxez.

Wi ew kaxez ji wir rakir anî xwarê; ew ji wan kaxezên destnivîsên musvede yên zer bû ku wek rengê tavê dibriqî. Wî ew danî ser pêxirikê û xwe di ser da xûz kir û gişt xwend. Pêşiyê navê wê hebû: Alîse, ev nav, bedewtirîn nav bû ji bo wî wextekê, ji ber ku ev navê dergistiya wî bû. Ü numra 15 11. Wek hejmareke li ser încilê di dêrê de, xuta dikir. Li ser nivîsandibû: Banqe. Ev iş û karê wî bû, işê muqeddes, ku nan, mal û jin dabû wî, bingehê hebûn û jiyana wî. Lê li ser çixêzek hatibû kişandin! Vê banqê iflas kiribû û ji ortê rabûbû. Lê ew zû hatibû xelaskirin, derbasî banqeke din kiribûn, piştî demekî gelek kurt, yê ku wî bi bêhizûrî û bi tirs derbas kiribû.

Wisa dor bi dor li du hev dihatin. Dikana gulfiroş, fayton (ku wê demê wek texsiyên niha dixebeitin-werger) Roja nîşaniya wî bû, wê çaxê berîka wî ji peran tijî bû.

Paşê: maxaza mobîlya, hostayê kaxezên dîwaran: ew hêlînê çêdike. Buroya barkêsiyê: ew jî ji bona malbarkirinê.

Bilêtxana operayê 5050. Nû zewicîbûn, ew jî ji wan kesan bûn ku rojêن yekşemban diçûne operayê. Dema wan a herî xweş ku bêdeng rûdiniştin û xwe di nav xweşî û hizûrê de didîtin, li welatên çîrokan li aliyê din ê rîdoyê (perda tiyatroyê, yan jî sînemayê).

Dura navê mîrekî tê, di ser vî navî ra jî çixêzek hatiye kişandin. Ev hevalekî wî bû, ku di civatê da xwe gihadibû ciyekî hinekî bilind, lê bê ketin û rabûn nikaribû serfîraziyê bi dest bixe. Ü gelek caran mecbûr bû ku li ciyêن dûr seyahet bike. Ci karekî pûç e!

Li vir tiştekî nû xuya kir, ku ketiye nav jiyana wan. Bi destê berdestiyê (qewraşê) û bi qelema hêşîn hatiye nivîsandin: "Xanim" kîjan xanim? Ew! eva ku bi mantoyê fire, bi rûyê melûl, ku wisa bêdeng dihat û tucar di nav salonê ra derbas nedibû, tenê di riya korîdorê ra derbas dibû diçû oda razanê.

Li bintara navê wê navê doktor L. hebû.

Yekem car e ku navê miroveke wan li wir xuya dike. "Dayê". Xasiya wî ye ev, ya ku her tim xwe ji wan dûr digirt, nedixwast vê cota nûzewicî aciz bike, wê dixwest wan bi tenêbihêle. Lê niha roja tengasiyê bû, bang li wê jî kiribûn, ji ber ku hewceyî wê bûbûn.

Dûra destniviseke bêtewş, bi qelema sor û hêşîn destpêdike. Buroya komîsyonê: berdestiya (qewraşa) malê derketiye yan yeke nû tê tayînkirin. Dermanxane. Him! dunya li wî tarî bû, li ber çavên wî reşeve hat! Dikana şîr. Li vir şîrê bê tuberkoloz tê firotin. Dikana ku baharatan difroşê, quesab û yd. Hemû işen vê malê ne li ciyê xwe ne. Na, pir mixabin ew nexweşê nava nivînan e.

Edî nedikanî rêsê mayin bixwîne, mîna ku di deryakî da noq be û di binê ava şor da binhêre. Buroya definkirinê jî li ber çavê wî ket. Qise jî dike—Yeke mezin û yeke biçûk, ango: tabût. Û di nav parantêzê da nivîsandî bû; ji axê.

Paşê êdî hew nivîs hebû li ser vê kaxez! Bi axê dawî anîbû. Û maxwe rastî jî ne wisa ye.

Wî ew kaxez hilda, ramûsa û xiste berîka pêşîrê.

Di nav du deqîqan da, du salêni jiyana xwe dîsan careke din jiyabû.

Dema derkete derva, ne pişta wî xûz ne jî serê wî di ber de xwar bû. Serda jî serê xwe bilind girtibû, wek mirovekî dilşa û serbilind, çimkî tiştê herî xweş ji wî re pêk hatibû. Ew jiyan bi destê çend rebenan ketibû! Têbinî: Ji kovara ROJA NÛ hejmar 15/1987 hate wergirtin.

Anton Çexov

MIRINA KARMEND

Kurteçîrok - Weşanê Welat

“Hêz û rizgariya gel di destê rewşenbirêñ wî de ye; rewşenbirêñ bi namûs, ramanwer, şîyar û xebatkar.” A. Çehov

Nivîskarê Rusî Anton Çexov, ne tenê di welatê xwe de, li Cihanê bi nav û deng e. Berhemên wî di nav klasîkên edebîyata Cihanê da ye. Yênu ku ji xwendina roman û çîrokan hez dîkin, ji berhemên Çexov pirr hez dîkin. Berhemên wî hatine wergerandin bi zimanê pirrêñ netewêñ Cihanê.

Ez bi xwe ji ji kurteçîrokêñ wî pirr hez dikim û ez di ser rêça wî da dimeşim. Min vê rastîya xwe di pêşgotina pirtûka xwe ya Kurdi. A yekem “Evîn û Jîyan”ê de weha dabû diyarkirin:

“Di nivîsandina kurteçîrokan de min “Çexov” ji xwe re kirîye rêç û didim ser vê şopê. Dema min kurteçîrokêñ Çexov xwend, di bin tesîra wan de mam û min ji xwest weke wî, hînêk mesaj bi rêya kurteçîrokan bidim gelê xwe.”

Min ji, wek Çexov, heta ku ji destê min hatiye, çîrokêñ xwe kurt û hindik nivîsiye, (Binêre hersê pirtûkêñ min yên kurteçîrokan) û bi wan gelek tişt daye xuyakirin.

Kurteçîrokêñ Çexov, yên ji alîyê Hesenê Metê, Batal Azîz, N. Kirîv û M. Alî K. ve hatine wergerîn, wek pirtûkêke di nav weşanê Welat de bi navê “Mirina Karmend” hate weşandin.

Di pirtûkê de 24 kurteçîrokêñ Çexov hene. Sê hebê wê N. Kirîv, çar heb M. Alî K. pênc heb Batal Azîz û duwanzde

hebê wê ji Hesenê Metê wergerandiye. Wergerwanan çîrokêñ Çexov li ber wergerêñ Swêdî, ji yên Tirkî wergerandine.

Ev pirtûk 141 rûpele. Pergala berg û rûpelan N. Kirîv çêkiriye. Di pirtûkê de li ser jîyana Çexov û danaşına wî nivîsêkê neh(9)rûpel bi îmza Weşanê Welat hatîye nivîsandin. Weşanxaneya Welat karekî hêja dike ku berhemên klasîk ji edebîyata Cihanê werdigerîne Kurdi.

Ne hewcye ku ez livir pesnê Çexov bidim. Divê xwendevanêñ Kurd berhemên wî bixwînin û mamostetiya wî ya edebî bi xwe bibînin.

Wek ku Yurî Bondîrev dibêjê:

« Çîrokêñ Çexov wek neynikekê ye. Meriv dikare gelek alîyê xwe û cîvata îroyîn tê de bibîne.»

Çexov di jîyana xwe ya nivîskarîyê de, zêdeyî heftsed(700)çîrokêñ kurt û dirêj nivîsiye. Çexov ji bo ciwanekî ku biryara xwe ya nivîskarîyê daye, van gotinêñ zérîn dibêjê:

« Binivîsinin, heta ku ji dest we tê pir bini-visin. Tiştêñ hûn binivisin ku hemî ne baş bin ji, xem nake. Her ku biçe ew ê baştıbibe. Xortanîya xwe û zîrekîya serê xwe li avarê ne buhurînin.... Binêrin, ku serê pêñusa we tûj, lê ferhenga we teng be, wê çaxê divê hûn bêje û metelokêñ nû hîn bibin. Ji bo vê yekê ji divê hûn hertim binivisin.... Jîyana min, fikra min û tiştêñ ku di serê min de hatine, divê di çîrokêñ min de xwe bidin xuyakirin.... Kurteçîrok divê kwîr û dagirtî be.»

L. Polat

JI NAV EDEBIYATA CÎHANÊ — 1

ALEKSANDR SERGEYEVÎÇ PÛŞKÎN

A. Puşkîn mirovekî navdar yên edebiyata klasîk a Rusî ye. Ew ji vir 198 sal berê li Moskovayê ji dayik bû. Puşkîn kurê mirovekî arîstokrat bû. Malbata wî malbatek arîstokrat bû. Wî ji çanda Ewropayê gelek hez dikir. Puşkîn ji alî Çarê Rusî ve sîrgûnê Kafkasyayê û Kîrimê bûbû. Ev salên sîrgûniyê ji puşkîn re gelek bi kêt hat. Wî li sîrgûnê çîrokêñ xwe yên bi navê "Mahkûmên Kafkas", "Novedarê Qesrabexçê" nivîsand. Piştê demêk Çarê Rusî Nîkolay wî hanî qesra xwe. Di qesrê de Puşkîn li ser gelek projekstan xebitî. Di wê demê de, di qesrê de Puşkîn "Dîroka Petro yê mezin" amade kir. Dîsa di wê wextê de çend pirtûkêñ edebî nivîsand. Navê wan pirtûkêñ wî ev in: "Çîrokêñ Byelkîn", "Dubrovski", "Keça Maçayê", "Keça Karmend - Ev pirtûk bi zimanê kurdî hate werge-randin û di nav wesanêñ Welat de, li Stokholmê hate weşandinê".

A. Puşkîn wexta ku 30 salî bû bi keçikek 16 salî re zewicî. Navê jina wî Nataliya bû. Mirovek Fransiz xwest e ku jina wî Nataliyayê ji rê derxe. A. Puşkîn bi yê Fransiz re duelo kir û ew hate kuştin. Jiyana Puşkîn gelek kin derbas bû. Ku ew jiyanek dirêj bijiyana dê hîn berhemêñ edebî yên gelek giranbiha biafirandana. A. Puşkîn bi nivîsandina berhemêñ xwe ve ji ziman û edebiyata netewa Rusan re xizmetek hêja kir. Nivîskarekî Rusan yên din ku ew jî gelek navdar e, Gogol ji bo Puşkîn weha dibêje: "Dewlemendiya zimanê me û hêza wê, zelaliya wê, di berhemêñ Puşkîn de ne."

Li jêr em nivîsek dirêj li ser jiyan û berhemêñ Pûşkîn diweşînin. Vê nivîsa li jêr **Hesenê METÊ** amade kiriye.

Kovara HELWEST

ALEKSANDR SERGEYEVÎÇ PÛŞKÎN (1799 - 1837)

Aleksandr Sergeyevîç Pûşkîn di 27ê gulana 1799an de li Moskvayê ji diya xwe bûye. Lawê malbatek dewlemend û rewşenbîr e. Wek hemû zarokêñ malmezin û dewlemendêñ wê rojê, Pûşkîn jî di piçûktiya xwe de

bi hîmgîriya klasîkên fransî mezin dibe û pirtirîn li ser lîteratûra yewnanî û fransî disekine. Hîna di heştsaliya xwe de, Pûşkîn zimanê fransî wek zimanê xwe û zikmakî dizane û ji hêla din ve, Pûşkîn dadêyek heye ku gundiye kîris e. Herweha tev zimanê ûrisî metelokên ûrisan jî ji vê dadêyek xwe hîn dibe.

Di duwanzdesaliya xwe de, Pûşkîn di dibistana bi navê Tsarkoye Selo (*1) yê de dixwîne. Ev dibîstan bi destê dewletê hatiye avakirin û bi mamostêن herî zane û xwende ye. Ew péjnên ku li malê li Pûşkîn rana-bin, li vir lê dicivin. Ji ber pêwendiyêن xwe yên germ, di nav hevalên xwe de tê hezkirin. Ji van hevalên wî, gelekan ev hevaltiya xwe ya jidil, heta mirina wî jî domandine.

Di dema xwe ya xwendekariyê de wek gelek hevalên xwe, Pûşkîn jî dest bi nivisînê kiriye. Helbestên wî xweştir û hêjatir in, ji ber ku hevalên wî, tenê bextreşî û tengasiya jiyanâ xwe ya buhuri dinivisin. Lê Pûşkîn xweşî, şadî û hêviya rojane di helbestên xwe de tîne zimên. Herweha di navbera salên 1813 û 1815an de bi nivisîna van helbestên xwe yên xweş deng dide.

Piştî ku di sala 1817an de dibistana xwe tewaw dike, li Petersbûrgê di arşîva wezareta derveyî de wek karmendekî dest bi kar dike. Ev kar heta derekê jê re dibe alîkar ku ji bo nivisandinê ji xwe re mijaran berhev bike. Lê ev kara ne kare-kî ber dilê wî ye. Raman û armanca wî her nivisîn û edebiyat e.

Berhemâ wî ya pêşîn Rûslan û Lûdmîla di sala 1820an de diweşe. Dema ev berhemâ wî belav dibe, mamoste û helbestvan û bi nav û deng Zûkovskî ji Pûşkîn re portrekî xwe dişîne û bi nivisa li paş portra xwe, pesnê vî helbestvanê ciwan dide.

Di vê navberê de Pûşkîn dest bi nivisîna helbestên politîk dike. Giraniya naverokên wan li ser nakokiya xulam û dewlemendan e. Ev mijarên ku ew bi lêv dike, ne tenê di nav radîkalan de, lê li derûdora dewlemen-dan jî belav dibe. Malmezin û dewlemendên wê rojê, ji van helbestên wî yên politîk gelek nerihet dibin. Di vî warî de Çar bi xwe weha dibêje: «Nivîsarên Pûşkîn, li seranserê Ûristanê dibe sedema tevlihevî û aloziyê.» Herweha xebata efserên radîkal, rêxistina Dekabristan(*2) jî derdikeve holê. Li ser vê yekê hemû malmezin û dewlemend peyva xwe yek dikin ku ji bo çareseriya vê yekê hêrişekê bibin ser radîkalan.

Ji van radîkalan gelek rewşenbîr û zana têne kuştin û pirî wan bi ber tawana dûrandinê dikevin û heta Sibîryayê têne şandin. Pûşkîn bi xwe jî di nav wan de ye. Lê ji bo xatirê ciwaniya wî û ew bandora ku ziman û şarizatiya klasîkên fransî li wî kiriye, ew tê bexişandin û ji dêla Sibîryayê ve wî dişînin başûrê Ûristanê, cem generalekî kevn û bi navê Însov ku çavdêriya wî bike.

Ev dûrxistina ji Petersbûrgê, ji bo Pûşkîn dibe rûkeniyek jiyanê. Lewra li vir pir dixwîne, rastî gelek kesan tê, xuşîna pêlên Behra Reş û bilindîya zinarêni Kirimê bi çavê xwe dibîne. Rewşa xelkên van deverna li ber çavên wî wek pêşmalek pînekirî rengoreng dixuye. Ev hemû jî ji Pûşkîn re dibin mijar û sedem ku ew binivîse.

Di sala 1824an de wî dûrdixin navcê Pskov, li wir di wargeha diya xwe de, li Mîkaylovskoyê dimîne. Heta sala 1826an li vir dijî û xwe bi tevayî dide nivisîna Yevgenî Onegîn û beşê mezîn û vê berhemma xwe li vir tewaw dike. Di tenêtiya van salêن wî de mijara berhemma wî ya Borîs Godunov jî xwe dide ber.

Bi nivisîna van berhemêن xwe, Pûşkîn digêhije bandewa babetê vê nivîsê. Pûşkîn, Byron û şopêن wek wî xwend, xwe gihande wan û ji wan derbastir jî bû. Lê ew her birçiyê zanebûn û nûyinê bû. Ji ber vê yekê derbasî babetê nivisarêن dîrokî dibe, pirî caran kat dike û dixwaze gelek kes bidin ser şopa wî.

*D*ema Nîkolaûs I. ji bo wergirtina taca serê xwe tê Moskvayê, ew Pûşkîn banî dadpirsiyê dike. Li wir Pûşkîn bi awakî vekirî pê dide zanîn, ku di serhildana Dekabristan de ew li Petesbûrgê bûya, bê şik wî ê di nav wan de cî bigirta. Li gel vê gotina xwe divê Pûşkîn pûçiya vê tevgerê jî jê re bi lêv kiri be. Lewra Nîkolaûs piştî peyivîna xwe dibêje: «EZ bi baqtitîrîn meriv û Ûristanê re peyivîme.» Ji bo ku Nîkolaûs wî bide hêla xwe, soz û bext dide Pûşkîn ku ji vir û weha ew ê bi xwe li nivisarêن wî binêre. Lê dûre Nîkolaûs vê berpirsiyariya sansorê dide şefê polîsên politîk. Her-weha ev azadiya Pûşkîn jî dibe wek azadiya çûkeke şaperkirî.

Ji vir û şûnde siyek bêwext û tarî dikeve ser jiyana Pûşkîn. Edî ew pêjnîn wî yêن nivisînê, wek hertim ranabin. Kêm caran, ew jî li demsalêن payizê kela dilê wî radibe. Payiza sala 1830î jê re dibe demsala herî berhembar. Û dest davê nivisîna çarçova berhemêن xwe yêن dramatîk; Siwarê Deqdar (1829), Mêvanê Kevirîn (1830), Mozart û Salierî (1830). Û dûre jî Çirokêن Biyelkîn (1830).

Lê Pûşkîn ji dilêriya xwe nakeve û ji dîtinêne xwe nayê xwarê. Helbastêne wî yên berê jî, yên li ser kûştin û dûrxistina hevalên wî jî dide xuyakirin ku dilsozê doza xwe ye. Wexta Çar bi pêşniyara ku wî bike helbestvanê qesrê, tê ba Pûşkîn, bi rûreşiyek mezin ji ba wî diçe. Ji ber vê yekê, dijîtiya di navbera Pûşkîn û desthilatan de dijwartir û hişkîr dibe. Lewra êdî pirsgirêk ji ser dîtinêne politîk xericiye û bûye dozek şerefê.

Di sala 1831î de Pûşkîn bi evîndara ber dilê xwe, Nataliya Gonçarovnayê re dizewuce. Ji ber xweşikî û sersivikiya xwe, ev jinika ciwan bi derûdora qesrê re tavilê dikeve nava pêwendiyêne fahşekî. Dema Nataliya dibîne ku Çar bi xwe jî bi wê re li ba dikeve, ev bextiyariya wê li serê wê dixe û xwe wenda dike. Pûşkîn bi her awayî dixwaze ku wê ji qesrê vekêşîne. Lê Nataliya guh nadî wî û her bi ya xwe dike. Û heta ku rojekê Baron Heckerend Antes ji jina wî re nameyek xirab dişîne.

*H*erweha kul li ser kulê di dilê Pûşkîn de vedibe û jiyan lê diherime. Hevalê wî yên ku hatin kuştin, yên ku ketin bendîxanan, yên ku ji warêne xwe hatin dûrxistin û bi karê zorê hatin arihandin; ev hemû li ber jiyana Pûşkîn dibin astengêne reş û tarî. Di vî salî xwe î ciwan de xwezila xwe bi mirinê tîne. Piştî navnotiya jina xwe jî, êdî nikare li ber xwe bide û Baron banî duelloyê dike. Di roja 17 çelê zivistana sala 1837an de, di duelloyê de ji zikê xwe birîndar dibe. Û bi du rojan piştî vê birîna xwe ya giran, di ciwaniya sî û heştsaliya xwe de dimire.

* * * *

*B*eriya hertiştî Pûşkîn di dema xwe de di edebiyata ûris de helbestvanekî mezin e. Heta dem xwe digêhîne Pûşkîn jî, edebiyata ûris li ser riya klasîzm û romantîzmê ye. Ev jî pirtirîn ji bandora niviskarêne roavayî dihat.

Pûşkîn bi xwe jî gelekî van klasîkan dixwîne û heta demekê jî li ser riya Byron, Shakespeare û Walter Scott dimeşe. Lê ew vê riya wan, ji bo xwe wek ronahiyekê bi kar tîne û di dawiya dawîn de ji xwe re babetê hune-rek taybetî peyda dike. Û ev babetê hunera ku tê gotin, riyek realist e. Ji xwe berhema Keça Kapitan jî xweş dide xuyakirin ku Pûşkîn li ser riyek realist bûyerek dîrokî bi pêjnêne evînek piçûk dide. Ev babetê nivîse jî ne tenê ji bo wî, herweha ji bo hemî niviskarêne wê rojê jî dibe şopek nû. Hêj di pey wî re jî li Ûristanê niviskarêne mezin wek Tolstoy û Dostoy-

evskî, car bi car vege riyan e ser berhemên wî û xwendine ku bizani bin ka çarçova çîrokêñ weha çawa ne û bi ci awayî têne hûnandin.

Li Ûristana wê rojê gelek niviskar li ser şopa wî, xwe digêhînin daraxa berhemên baştır. Rexnegîr i mezin Bielînskî berhema Pûşkîn ya bi navê Yevgenî Onegin wek ansiklopediya jiyana ûris bi nav dike.

Pûşkîn, Keça Kapîtan salekî beriya mirina xwe dinivise (1836). Piştî ku ev werdigere gelek zimanan, bandorek mezin li edebiyata dinê dike. Ü dibêjin ku Tolstoy ji ber vê bandorê, berhema xwe ya bi navê Şer û Aşîtî nivisiye. Lê Dostoyevskî di nameyek -ji birayê xwe re dişîne- xwe de li ser Pûşkîn weha dibêje: "Ew helbestêñ narîn û herikbar yêñ Pûşkîn ji çend rêzikan ne zêdetir in. Ev narîn û herikbariya wan jî ji tiştekî tê ku, niviskar her li ser hûr bûye û guherîn lê çêkiriye."

Ji bo Keça Kapîtan Gogol dîtinêñ xwe weha vedike: "Roman û çîrokêñ me yêñ dirêj li ber Keça Kapîtan xav dimînin, ku em wan bidin ber hev. Saxikî û nermokî digêhîje daraxek wusa bilind ku rastî jî wek tiştekî li-hevhanî û karîkatorîzeyî dixuye. Cara yekem e ku bi rastî jî karekterên ûris derdi kevin holê."

Reng e, ew dema ku Pûşkîn tê de dijî, di bin çavsoriya Çar û dewlemadan de ye. Rewşa gundî û xulamên wê rojê bala radîkalan û rewşenbîran dikêşîne. Bi pêşengiya Dekabristan rêxistînek dîzî tê damezrandin. Li hemberî dewlemandan, Dekabrist di sala 1825an dikevin amadeviya serhildanekê. Pûşkîn bi xwe ne di nav wan de ye, lê ji nêzîk ve gelekêñ wan dinase û bi hunera pênuşa xwe vê nakokiya desthilat û xulaman li ber çavan radixe. Lê Pûşkîn ne niviskarekî gundî ye. Ew niviskarekî pêşverû û netewî ye. Gelek Dekabristên wê rojê, di dadgehan de li xwe mikûr têñ û dibêjin; me dîtinêñ xwe yêñ şoressgerî cara pêşîn ji Pûşkîn û berhemên wî girtine. Ev jî dide xuyakirin ku di warê dîtinêñ politîk de, çarçova bandora berhemên Pûşkîn di dema xwe de gelek fere û rolekî mezin lîstine.

(*1) — Tsarkoye Selo: Ev dibîstan nuha bi navê Dibistana Pûşkîn tê bi-navkirin.

(*2) — Dekabrist: Dekabri bi rûsî navê meha zivistana pêşîn e. Radîkalên wê rojê, ji ber ku di vê mehê de serhildanek li dar xistine, loma ev nava li wan bûye.

D
a
n
a
s
î
n
a

Danasîna Pirtûkên Kurdî
BİBLIYOGRAFYA KURDISTANÊ
1903 — 1995
Berhevkar : Dr. Abdulla Ghafor

P
i
r
t
û
k
a
n

Dr. Abdulla Ghafor ji Kurdistana başûr e. Wî navêن gelek weşanêن Kurdî (pirtûk, kovar û rojname) berhevkiриye û navêن wan di pirtûkeke de weşandiye. Her çiqas wî nenivîsiye berhevkar û navê xwe wek nivîskar li ser pirtûkê xistiye jî, ji bo pirtûkên weha rastî ev e ku navê mirov wek **berhevkar** bête nivîsandin.

Dr. Abdulla Ghafor tenê navêن pirtûk, kovar û rojnameyan nivîsiye. Naveroka pirtûkan nenivîsiye. Navêن pirtûkan bi beş, beş nivîsiye. Beşê yekê, beşa giştî ye. Di vê beşê de tenê navê 10 pirtûkan nivîsiye. Ev kêm e. Xuya ye ku haya wî ji pirtûkên din tunebûye. Ne deh, em dikarin jê re navê sed û deh pirtûkan bibêjin.

Beşê duyem, li ser zimêن e. Di vê beşê de navê hinek (ne temamî) pirtûkên li ser zimêن

(fîrbûna zimêن, rîziman) û yên perwerdekirinê nivîsiye.

Beşa sêyem, beşa edebiyatê ye. Di vê beşê de jî navê gelek pirtûkên edebî nenivîsiye, tenê navê çend pirtûkan nivîsiye. Di beşê civat de jî navê çend pirtûkan nivîsiye. Navê rojname û kovarêن Kurdî yên li Ewropa jî, ji ber nivîsa **Lokman Polat** a ku di kovara Nûdemê de hatibû weşandin gitte.

Di pirtûkê de gelek şâşî û xeletî jî hene. Navê pirtûkek roman di beşa helbestan de hatiye nivîsandin. Di amadekirina pirtûkê de metodek bi zanistî nehatiye bi kar anîn. Bi şeweyek gelek amatorî pirtûk hatiye amadekirin. Lî, digel van hemû kêmanîyan, baş e ku navê 390 heb pirtûkan di cihek de hatiye nivîsandin. Pirtûkên weha di pêşerojê de ji bo lêkolînvanan dibe alîkar.

C. Nûjen

LI SER PIRTÜKA EVÎNDAR

Mezher BOZAN

EVÎNDAR

Lokman POLAT



C.N.
Weşanen Çanda Nûjen
(Modern Kultur Förlaget)

Lokman Polat pirtûkek bi navê "Evîndar" nivîsiye. Ev pirtûk jî, ji kurteçîrokan amade bûye. Min li ser pirtûka Lokman Polat, ya bi navê "Xwîn û hêstirê çavan" nivîsî bû. Di navbera herdû pirtûkan de cudahîyekî heye. Dema ku me pirtûka "Evîndar" jî di ber çav re derbas kir, dê em ê vê cudahîyê bibînin. Lokman Polat di vê pirtûka xwe de metodek nûh bi kar anîye.

Dî vê pirtûkê de çîroka yekhem "Du dili" ye. Behsa jiyana Narînê dike. Di vê çîrokê de evîn û xebata ji bo welêt bi hev re dimeše. Narînê ji Mahsûm hez dike. Herdû bi hev re dikevin xebatê. Bêyî zewac, Mahsûmî û Narînê bi hev re radizên. Narîn hemîle dimîne. Paşê Mahsûmî di şerekî li Kurdistanê şehîd dikeve. Narînê bi zikê mezin şerm dike. Narîn hamîle ye. Hevalên wî yên rîexistinê pê nizanin ku ew hemîle ye. Paşê bebik ji ber Narînê diçe. Narîn, ji nava xebatê derdikeve û diçe mala bavê xwe. Mesaj: Dema zikê Narînê mezin dibe, du rê li ber Narînê dimîne. Yan kuştina zaroka di nava xwe de, yan jî wê bîne jiyanê. Navê "Du dîlî" ji vir derdikeve. Narînê bîryar dide ku zaroka xwe bîne jiyanê.

Dî nivisîna vê çîrokê de nivîskar metodek wisan bi kar anîye ku nayê bîr û xiyala mirov. Narîn bi bebika di zikê xwe re dipeyive. Ew bi bebika di zikê xwe re diyalogek yek alî, hîsî, manewî, datîne. Bi bebika xwe re diaxîfe û gotinê gelek girîng dibêje.

Giroka duhem "Xezal" e. behsa keçeve Swîsrî, Krîstîn, dike. Keçeve rind û delal e. Pirsa kurd bala wê dikişîne. Dikeve nava kurdan. Pir jîr e. Kurd ji wê re dibejin Xezal. Xezalê diçe Kurdistanê. Kalekî kurd nas dike. Li ser pirsa Kurd û Kurdistanê diaxifin. Dibê mîhvanê Kaloyî. Xezalê li kurdan rexne digire. Dibêje ew xwe kurd dibînin, lê her tiştên wan bi zimanê tirkî ye. Rexneyeka wê ya din jî li ser mîrên kurda ye. Wan doxînsist dibîne. "Lê jînên kurd êdî binamûs in" dibêje. Lê car din jî Xezalê dema ku vedigere welatê xwe, bi xortekî kurd re dizewice. Mesaja vê çîrokê bi kurtahî ev e: Pirsa kurd li Ewropa jî di rojевê de ye. Biyanî jî dikevin nava tekoşîna gelê kurd. Krîstîn, Xezalê, yek ji wan e. Herku çendî kêmâsiyêñ kurdan hebin jî, Xezalê di vê tekoşînê de cihê xwe xurttir dike. Di vê çîrokê de mirov dikare assîmîlasyona tirk ya dijwar û şowenîstîya tirkan jî bibîne.

"**Dîtinêñ Xeter**" di rêza sisiyan de ye. Xelîl Îbrahîmî mamoste ye. Dikeve meşa cenazê hevalê xwe. Tête girtin. Polês li wî işkence dike. Dixwazin ku lê heq bikin ku ew jî di rêexistina çepê tirk de ye. Lê ew dibêje ku ew kurd e. İşkence bêhtir dibe. Dîtinêñ Xelîl Îbarahîm ji wan re xeter e. Dawîyê Xelîl Îbrahîmî derdixin qata pêncan û wî davêjin

xwarê. Xelîl Îbrahîmî namire, lê felc dibe. Mesaja vê çîrokê ev e: Tehem-mila dewleta tirk ji dîtinêñ cuda re tuneye. Di rastiyê de, li Tirkîyê netewa kêm, tirk bixwe ne. Lê îdeolojîya fermî hemû gelan tirk dihesibîne û bi vî awayî tirkîtyê diparêze.

Ya çaran "**Wahşet**" e. Hesen jî mamoste ye. Pir çaran tête girtin. Ji zordaran hew e ku gerîllayêñ ji wî gundî derdi Kevin tev esera Mamoste Hesen e. Rojekê leşkerêñ taybet davêjin ser mala wî. Dibêjin ku ew gerilla ne. Lê Hesenî dizane ku ne ew in. Direve. Jina Hesenî U zarokêñ wî dikujin û dixin sitûyê kurdan. Ji xwe mesaj jî ev e ku dewleta tirk kurdêñ welatparêz dikuje dixe sitûyê kurdan. Lê kurdêñ xwenas bi vê yekê zû dihisin.

"**Xalo Hesen**" di rêza pêncan de ye. Xalo Hesen mirovekî welatparêz e. Leşker gundê wî vala dikin. Li wî işkence dikin. Xalo Hesen mala xwe bardike Stenbolê. Li wir jî welatparêziya xwe berdewam dike. Xortekî kurd dibe mîhvanê wî. Xort pir pesnê xwe dide. Paşê diçe. Piştî çendakî bi çend polisan re tête mala Xalo Hesenî. Wî digirin. Mesaj: Welatparêzî bi her awayî berdewam dike. Kesêñ welatparêz divête ku di axaftinêñ xwe de dirist bin.

Giroka şesan "JI kalê heftê salî ci dixwazin" e. Xalê Seîd mirovekî we-

latparêz e. Hevala kurê wî Xezalê tê li mala wî dibe mîhvan. Paşê Xezalê tête girtin. Xezalê xeber nade. Lê dema ku polês li birayê wê îşkence dike, navê Xalê Seîd dide. Xalê Seîd û kurê wî digirin. Li wan îşkence dikin. Xalê Seîdî berdidin. Lê piştî du rojan Xalê Seîd dimire. mesaj: Zilma dagîrkeran e. Dema ku nikarin yekî bidin xeberdan , li merivên wî îşkence dikin. Eva wehşet e.

"*Dayika Niştiman*" di rêza heftan de ye. Behsa jineke kurd dike. Welatparêz e. Leşkerên zordar gundê wê vala dikin, lê ew terka gundê xwe nake. Gerilla têñ cem wê û diçin. Mesaj, berxwedan û welatperweriya jineke kurd e.

"*Xirtiko*" di rêza heştan de ye.

Behsa dayikeke kurd dike. Bi xirtiko ketiye. Diçe kurê xwe yê li zindanê ziyyaret dike. Li ser şehîdan diaxifin. Mesaj: Xirtiko bi xwînrijandinê derman dibe. Pirsgirêka kurdan jî disibihe xirtikoyê.

Di rêza nehan de "Evîndar" heye. Li ser jiyana du gerîllayêñ leheng e. Şîrwan û Sîpan ji hev hez dikin. Ser dikin. Şehîd dikevin. Mesaj, evîna du gerilla bi dîsîplîna gerilla çawa dimeşe ye.

"*Wax li min li Xerîbîyê*" çiroka dehan e. Malbateke kurd koçber dibe ji ber zilma dagîrker. Lê li

koçberîyê xaniyê wan dişewite û sê zarokên wan dişewitin. Mesaj, zilma zordar û lixweheyrîmayîna li xerîbîyê ye. Sosyal e.

Ciroka Yanzdehan "*Mixara şejhîdan*" e. Şîmal xortekî jîr û romantîk e... Dibe gerîlla. Musademe di navbeyna leşkeran û gerîllan de derdikeve. Gerîlla Şîmalî û hevalên wî nabin şer. Wan dişînin nig xrûbeke din. Li ser rê di şikeftekê re derbas dibin. şikeft pir dirêj e. Pir kes di vê riyê de gangren bûne. Şîmal jî nigê xwe wenda dike. Mesaj: Li pêşîya gerîlla pir asteng û dijwarî hene. Lê gerîlla hemû tiştan dide ber çavêñ xwe û dibe şervanê azadîya gelê kurd.

"*Nijadperestîya Dixtor*" di rêza duwanzdehan de ye. Şîrzad û Şîlan ji ber zilm û zordarıya leşkerên tirk koçber dibin, diçin Ankarê. Li wir milê Şîlanê dişikê. Diçin nig doktorekî. Doktor dibîne ku Şîlanê kurd e. Xwe nebaş dike. Milê Şîlanê şaş girêdide. Paşê Şîlan li ba doktorekî kurd baş dibe. Mesaj: Herku çendî doktorê tirk sunda Hîpokratê xwendibe jî, şowenîstê di nava wî de derdikeve pêş. Zilma dewleta tirk li her derê xwe nişan dide.

Ciroka sênzdehan "*Kûçik Nehewtiya*" ye. Ev çîrok mînanî pêkenokekê ye. Kûçikê gunde Begêrêş her tim dihewte û biyanîyan dide dest. Leşkerên

tirk ji kûçik bawer bûn û di qereqolê de bi rehetî rûdiniştin. Lê gerilla kûçikî dixapînin û davêjin ser qereqolê û pir leşker dikujin. Paşê leşker xwedîyê kuçikî, Heqoyî, digirin û lê işkence dikin. Mesaj zilma leşkerên tirk xuya dike. Şaşîya kûçikî dibe sedema zilma li ser xwedîyê wê.

"*Kêçika Jîr*" di rêza çardehan de ye. Zîlan gerilla ye. Nexweş dikeve û ji çiyan dadikeve bajaran. Lê zû deşifre dibe û bi çend hevalên xwe re car din diçe ciyê. Bûyerek di navbera wan û cerdevanekî bêzirar de derbas dibe. Mesaj: Gerilla ne tenê ji şer re, lê belê ji pîlan û proxram çêkirinan re jî jîr e.

Cîroka çardehan "*Xezeba Dijmin Wê Dîn Kir*" e. Sakîne, jina kurd, hersê zarokên xwe jî wenda dike. Kurek û keçekê wê di refen gerilla de şer dikan û şehîd dikevin. Kurê wê yî din jî li bajêr bi zilm û tadeya dijminî tê qetilkirin. Sakîne aqil davêje, paşê ji qehran dimire. Mesaj: Zordariya dijmin weke hertim li pêş e. Çirokeke sosyal e.

"*Xapandin û Kuştin*" kurteçiroka panzdehan e. Behsa bûyera Mîrzayî dike. Welatparêz e. Dikeve zîndanê. Piştî ku ji zîndanê derdikeve bi xurtî dixwaze ku here serê ciyê. Zemanekî dirêj li hêviya bersiva gerilla dimîne. Paşê xrûbekî

kontrgerilla tê gundê Mîrzayî û wî dixapînin û wî û çend mîlîsên di gund de dikujin. Mesaj: Dewleta zalim vala nasekine. Her tim bi lîbasên gerilla gundiyan dixapîne. Divête ku welatparêz li xwe miqate bin.

Cîroka dawî "*Qederê Bigewirînin*" e. Meyase û sê zarokên wê ji ber hovîtiya dijmin ji gund direvin. Li cihê ku diçinê dergûşa wê çê dibe. Navê wê dike Qederê. Mesaj: Dijmin har e. Gundan dişewitîne. Gundiyên bêguneh dikuje. Her xerabî jê tê. Ev çîrok jî vê barbarîya dijminî dide ber çav.

Çend gotin: Ez birêz Lokman Polatî ji bo vê xebata wî pîroz dikim. Di pirtûka Evîndar de bûyerên sosyal cih digirin. Şoreşa Kurdistanê di her çîrokê de xwe dide pêş. Ez hêvidar im ku Lokman Polat vê xebata xwe bidomîne. Bi silavên germîn.

Lokman POLAT

MÊRXAS
(Serpêhatiyênd Kurdi)
Derket

TÎRÊJÎN HÊVIYÊ
Derdikeve

Romanek giran û girîng
BÎRA QEDERÊ

Senar ŞAHÎN

*M*in ji sala 1975an hetanî niha gelek roman xwendiye. Di nav wan romanê ku min xwendibû de du roman mirov bi balkêşî dikişand nav rûpelên xwe. Yek jê ya Çernîşevskî “Çi Bikin?” bû, ya din jî ya Erebê Şemo “Dimdim” bû. Ev romana sêyem ku min kişand nava xwe, di despêka xwendinê de min bi xwe ve girê da romana Mehmed Uzunî “Bîra Qederê” bû.

Romana bi navê “Bîra Qederê” romanek girîng û gelek giran e. Romanek bi awayê şêweya modern hatiye nivîsîn. Bûyerê di romanê de bi hostatî li hev hatiye honandin.

“Bîra Qederê” romana jiyan û têkoşîna têkoşerê navdar, westayê rîzmanê Kurdî Celadet Bedir-Xan e. Mehmed Uzun bi hostatî teknîkeke nivîsê bi kar anije ku, mirov dibêje qey ew(Mehmed Uzun) û Celadet Bedir-Xan li cem hev runiştine û li rûqalê hev bi hevre axifiyane û bi hevre vê romanê nivîsîne. Diyalogên di nav herduyan de (gotinên Celadet Bedir-Xan bi stîla nivîsê ya piçûk hatiye nivîsîn û yên Mehmed Uzunî bi stîla mezin hatiye nivîsîn)

wisan germ e û bi hevûdu ve girêdayî ye ku mirov qet ferq naake ku ev roman ji alî mirovek ve hatiye nivîsîn. Nivîskarê romanê û qehremanê romanê bi şirîkatî ev roman nivîsîne. Ji xwe yekî ku ji Celadet Bedir-Xan hayîdar nebe û Mehmed Uzun nas neke, yan jî ev roman bê wergerandin bi zimanekî din û biyaniyek bixwîne, dê bibêje van herdu zilaman bi hevre çi romanek xwes afirandine. Ev metod di romannivîsê de metodeke nûh e. Metodeke nûh ya din jî ev e; roman ji ber wêneyan hatiye afirandin. Nivîskar li wêneyan dinêre û li gor teswîra wan wêneyan romana xwe dihone. Ev jî hostatiyek bi serê xwe ye.

Mirov gava ku dest bi xwendina romana “Bîra Qederê” dike, êdî mirov naxwaze ku dest ji romanê berde. Jiyan û têkoşîna Celadet Bedir-Xan di dîroka neteweya Kurd a nêzîk de cihek gelek girîng digire. Divê her Kurdê welatparêz pê bizanibe. Malbara Bedir-Xaniyan û bi taybetî jî Celadet û Kamuran Bedir-Xan xizmetên ku kirine, ji alî gelê Kurd ve tu car nayê jîbirkirin. Mezinahî û rumetiya kar û xebatên wan, girîngiya berhemên wan di dilê we-

latparêzên Kurd de dijî. Têkoşîna wan a ji bo azadiya gel û rizgariya welêt, xizmetên wan ên bi fedakarî, xebata wan ên çapamenî û xizmeta wan a ji bo fîrbûna rastnivîsîna zimanê Kurdî hêj jî ji bo ronakbir û nivîskarêñ Kurð ronahiyek e, zelaliyek e, rîzaniyek e. Ew kar û xebatêñ wan îro jî rî nîşanê welatparêzên Kurd dide. Ji bo vê yekê, nivîsandina dîroka kar, xebat û têkoşîna wan, nivîsandina romana wan gelek girîng e û pêwîst e, karekî bi rûmet e. Mehmed Uzun yek ji van nivîskarê Kurd e ku vî karê bi rûmet haniye cîh.

Romana “Bîra Qederê” romana tradejiya ronakbîrêñ Kurð e. Jiyana ronakbîrêñ Kurð ên dramatîk hêj jî dom dike. Ronakbîrêñ Kurð ên li sîrgûnê duh jî gelek zehmetî kişandin û îro jî gelek zehmetî dikişînin. Dîrok dubare dibe. Duh, jîvir 50 sal berê Celadet Bedir-Xan ji bo ku kovara Hawarê derxe, biweşîne, zêrê jina xwe difroşe. İro, 50 sal paşê hinek nivîskar ji bo ku kovar û pirtûkên xwe derbixin, biweşînin, ew jî zêrê jina xwe difroşin, ji qirika zarokêñ xwe dibi-rin, bi pereyêñ zarokêñ xwe berhemêñ xwe diweşînin. Helbet ev jî fedakariyek bê hempa ye, welatparêziyek giranbiha ye. Trajediya pêvajoya jiyana ronakbîrêñ sîrgûnê berdewam e. Loma jî romana “Bîra Qederê” bi van gotinêñ Goethe «Mehr lich (hinekî din ronahî)...» dest pê dike.

Romana “Bîra Qederê” ji 15 wêneyan, yan jî ji 15 beşan pêk hatiye. Wêneya pêşîn, an jî beşa yekem bi ji dayikbûna Celadet dest pê dike. Piştê têkçûna serîhildana Bedir-Xaniyan a li Cizîra Botan, sultanê Osmaniyan malbata Bedir-Xaniyan ji Kurdistanê sîrgûn dike, wan dibin di Stenbolê de bi cîh û war dikin. Vegera wan a Kurdistanê li wan qedexe dikin. Emîn Alî Bedir-Xan (bavê Celadet Bedir-Xan) li Stenbolê dijiya. Jina wî Semîhe hemîle bûye. Wexta ku Semîhe Xanim diwelide, jê re Celadet dibe. Lê Celadet mirî dibe. Piştê ji dayikbûna Celadet çend saet derbas dibe rih û can bi Celadet re zindî dibe. Mehmed Uzun bi metodek gelek balkêş û bi hostayî qala (behsa) welidandina Semîhe Xanimê dike.

Di romanê de gelek teferuat hene. Agahdariyêñ girîng hene. Qala malbata Bedir-Xaniyan, qala Kamuran û Sureya Bedir-Xan tête kirin. Ez dê behsa wan nekim. Tenê behsa Celadet (li gor honandina romanê) bi kurtahî bikim.

Celadet ku mirî ji dayik bûye, paşê dibe zindî û roj bi roj mezin dibe. Ew bi hîs û ramanêñ welatparêziyê mezin dibe, digihe, dikemile. Celadet zarokê sîrgûnê ye. Li xerîbiyê ji dayik bûye. Wî hêj Kurdistanê bi roniya çavê xwe nedîtiye, hesreta Kurdistanê di dilê wî de ye.

Celadet li Stenbolê mezin dibe. Ew û keça Alî Siûd Begê (ku bi eslê xwe Arnawid e) Canan hevûdu dinasin, dibin hevalêñ hevûdu. Ew bi hevre

rojêñ xweş û bextewar derbas dikin. Mehmed Uzun, hevûdu dîtina Celadet û Cananê û bi hevre razana wan bi zimanekî edebî gelek baş qal dike. Nivîskarê romanê, zimanê erotîk gelek baş pêk aniye. Celadet û Canan dibin destgirtiyêñ hev, lê ji ber gelek sedemên rewşê bi hevûdu re nazewicin. Evîndariya wan di dilê wan de didome.

Celadet dibe xortekî jîr. Di wê demê de şerê Cihanê dest pê dike. Ew jî diçe di ordiya Osmaniyan de serleşkerî dike. (Di beriya wê demê de di Stenbolê de gelek bûyer çêdibin. Li Stenbolê Kurdek, paşayek Osmanî dikuje, Siltanê Osmaniyan Ebdulhemîd hemû malbata Bedir-Xaniyan û sê hezar Kurdêñ din sîrgûnê cîhêñ din dike. Min behsa wan nekir. "Bîra Qederê" romanek berfireh e. Ji alî pirbûna bûyeran û naveroka xwe ve gelek xurt e. Divê xwendevan romanê ji serî hetanî dawî bixwînîn ku honandina bûyeran bizanibin.)

Đu birayêñ Celadet li Almanyayê ne. Celadet û Kamuran dicin cem herdu birayêñ xwe. Celadet û Kamuran demeke dirêj li Almanyayê dimînin, li wê Unîversîteyê dixwînîn. Ew di jiyanâ xwe ya Almanyayê de gelek zehmetî dikşînin. Di nav feqîrî û xêzaniyê de dijîn. Celadet cil û libasê xwe difroşê.

Aştê demeke, Celadet ji Almanyayê diçe Misirê. Di rîwîtiyê de Celadet hinek Cihû dinase. Ew bi hevre diaxîfin. Yekê Cihû jê re dibêje: "Ziman ruhû me Cihûyan

e." Ev gotin gelekî tesîr li ser Celadet dike. Paşê gava ku Celadet Bedir-Xan kovara Hawarê diweşîne, di hejmarek de serpêhatiya Cihûyan û zimanê wan dinivîse. Celadet ji Misirê jî diçe Libnanê û paşê jî diçe Suriyê. Li Suriyê Memduh Selîm Begê dibîne. Memduh Selîm Beg, wek ku tête zanîn, qehremanê (lehengê) romana "Siya Evînê" ye. Celadet li Suriyê Mewlanzade Rîfat Beg û çend dostêñ xwe yên din jî dibîne. Mewlanzade Rîfat Beg, berê li Stenbolê rojnameya "Serbestî" weşandibû. Celadet jî di vê rojnameyê de demek xebitibû.

Celadet, Memduh Selîm Beg, Sureya û Kamuran Bedir-Xan, Mewlanzade Rifat Beg û hinek kesêñ din damezrandina rîexistina "Xoybûn" ê pêk tînin. Li Libnanê damezrevanê rîexistina Xoybûnê civîn çedikin û li hev wezîfe parve dikin.

Celadet Bedir-Xan bi wezîfe diçe Kurdistana başûr û rojhilat. Li wan deran gelek bûyer têne serê wî. Mixaberat li pey dikeve, wî teqîp dike. Celadet bi hezar zehmetî xwe ji destê rejima Îranê xelas dike. Celadet vedigere Suriyê.

Celadet Bedir-Xan ji bo weşana kovarek dest bi amadekirina xebata kovarê dike. Celadet weha dibêje: "Ez fikirîbûm û bi tecrûbeyên xwe jî hîn bûbûm; dermanê cehaletê ne leqelaq û gotinêñ qelaw ên fiş û paşgotiniyêñ der û dorê bûn. Derman berhem û eser afirîn û avahî bûn."

Celadet bi vê bîr û baweriyê biry-ara xwe dide ku kovareke çandî û edebî ya xwerû bi zimanê Kurdî biweşîne. Di meha Gulanê ya 1932an de, kovara Hawarê hejmara yekem derdikeve. Kovara Hawarê di rojnamegerî û weşanvaniya Kurdî de cîhekê xwe yê girîng heye. Hawar kovarek gelek giranbiha ye, bi qîmet e. Kovara Hawarê bi weşana xwe dibe dengê zanînê, dengê xwenasînê. Celadet di her hejmarî de gelek nivîs dinivîse. Celadet ji bo gelê Kurd dinivîse. Piştê demêke dirêj Celadet û Canan li Suriyê hevûdu dibînin. Canan bi yekî diplomat re zewiciye. Piştê hevûdu dîtina wan, nivîskar wan herduyan dîsa bi hev dide razanê. Li gorî têkiliyên Celadet û Cananê ên erotik, mirov difikire ku di wê dema berê de Canan ji keçen Swêdî yên iroyîn jî comertir bûye. Canan hem wextaku keça bakîre bûye bi Celadet re radizê û hem jî wexta ku zewicandî bûye bi Celadet re radize, bi hefre eşq dikin. Celadet û Canan 33 roj di odaya otelê de bi hevre dimînin. Paşê Canan bi keştiya Piere Lotî diçe Stenbolê û terka Celadet û terka Mêrê xwe dike.

Hêtanî livir ku min qal kir, hinek besên ji bûyerên romanê bûn. Min naveroka romanê bi temamî qal nekir. Yênu ku dixwazin bi temamî xebat û têkoşîna Celadet Bedir-Xan bizanibin divê vê romanê bixwînin. Romanâ “Bîra Qederê”, wek ku

min berê jî gote, romanek gelek giran û girîng e. Bûyerên ku di romanê de derbas dibin perçeyek ji dîroka Kurd û Kurdistanê a nêzîk e. Di dîroka Kurdan de cîhê xebat û têkoşîna Bedir-Xaniyan gelek girîng e. Weşandina kovar û rojnameyên wek Hawar, Ronahî, Sîr û Roja Nû bi serê xwe kar û xebatek gelek pîroz e.

Mehmed Uzun bi romana xwe ya dawî dide îspatkirin ku ew her diçe xwe pêşte dixe, xwe dikemilîne. Di awayê şêweya nivîsê de xwe nûh dike. Romana wî ya bi navê “Bîra Qederê” ji romanên wî yên berê çêtir e û baştir e. Ev roman bi her awayî ji yên berê çêtir e. Mirov wexta ku romana wî ya yekemîn “TU” û ya dawîn “Bîra Qederê” bide berhev ferfqeq gelek mezin di navbera herduyan de heye. Pêşveçûnek heye. Mehmed Uzun ji dema weşandina romana “TU” hatenî niha gelek mesafeyên pêşveçûnê qat kiriye. Xwenûhkîrin, guherandin, û pêşveçûn zagonek diyalektîkî ye. Ev zagona diyalektîkî di Mehmed Uzun de baş tête xuya-kirin. Ji bo ku Mehmed Uzun romanek weha baş, romanek giran û girîng li pirtûkxaneya Kurdî zêde kire, ez wî pîroz dikim. Ez hêvî dikim ku edebiyatnasên Kurd vê romanê bixwînin û bi hawayekî ilmî-zanîstî binirxînin. Ew kesên ku dibêjin romana Kurdî tune ye, bila destê xwe bidin ser wijdana xwe û hendî dev ji wê dîtina xwe ya çewt berdin.

CÎHANA BERHEMÊN EDEBÎ

(Danasîna Pirtûkêñ Kurdan Yêñ Bi Tirkî)

Romana

“ HADES LI SER KAR È ”

Romana bi navê “Hades İş Başında”

“Hades Li Ser Kar e” bi zimanê Tirkî ye. Romanek baş e, naveroka romanê balkêş e. Nivîskarê romanê Medenî FERHO nivîskarekî Kurd e. Gelek berhemên wî yêñ bi zimanê Kurdî hene. Wî du roman bi Kurdî nivîsiye.

Ev romana wî ya bi Tirkî, li ser lêdan û şkencê, li ser zîndanê ye. Nivîskar gelek caran hatiye girtin, şkence dîtiye û pişte 12 İlônê demekê direj (7 sal) di hepisxaneyê de razaye.

Romana “HADES LI SER KAR E”

berhema jiyana di zîndana şkencexaneyê de ye. Di vê romanê de zilm û zordarî, tehda û barbarî, û bi her awayî hovîtiya wê demê bi zimanek edebî hatiye nivîsin. Roman 283 rûpel e û di hepisxaneyê de hatiye nivîsandin. Ev pirtûk li Stenbolê, di nav weşanêñ KORA de hatiye weşandinê. Wateya (maneya) HADES ev e: HADES efendiyê welatê tarî ye.

Naveroka romanê bi kurtahî weha ye: Qehremanê (lehengê) romanê Murad weşanvan e. Ew di weşanxaneya xwe de kar û xebata weşanvaniyê dike. Li ser çand û edebiyata Kurdî, li ser çîrok, metelok û efsaneyên Kurdan pirtûk diweşîne. Pirtûka dawî ku daye çapxaneyê, pirtûkek li ser efsaneya


KAWA ye. Pirtûk hêj di çapxaneyê de ye, derneketiye, polîs têñ davêjin ser weşanxaneya wî û wî digirin binçav.

Wexta ku Murat dibin dixin zîndana şkencexanê liwê yekî din ji heye. Diyalogên nava wî û Murat gelek balkêş in. Ew ji bi rojane ku di zîndanê de şkence dibîne. Ew mirov bi gotinêñ xwe moralek mezin dide Muradî. Şkencevan dest pê dikin bi Muradî şkence dikin. Jê pirs dikin, dibêjin te dirav (pere) ji ko haniye û vê weşanxaneyê ava kiriye? Te kompîtora xwe çawan stend? Tu çima çûbû Bulgaristanê? Te liwê çek (sîlah) kiriye, ev sîlah li ku ne? Te wan çekan ji Barzanî re bir e? Tu alîgirê Barzanî yi? Te di kîjan rê de wan çekan ji Barzanî re dibir? û hwd bi sedan pirs jê dikinin. Murad bersîva wan nadî, ew di şkencexaneyê de, di berxwede dide. Murad 45 roj di şkencexaneyê de dimîne. Her roj bi wî şkence dikin. Ev roman hem wê dema tarî û hem ji 45 rojên şkenceyê dinirxîne. Nivîskarê ku bikaribe romana 45 roj şkenceyî 283 rûpelî de binivîse, pir bi hêsan dikare romana 7 salêñ hepisxaneyê ji binivîse. Divê nivîskarê romana “Hades Li Ser Kare” jiyana qehremanê romanê, yanê jiyana Muradî ya hepisxaneyê ji bi zimanekî edebî, li gor stîla romanê binivîse.

K. Helwest

ÇEND GOTIN LI SER PIRTUKA LOKMAN POLATÎ “MÊRXAS”

Z. ŞÊXMÛS



*D*i van mehêن dawî de pirtûkeke bi navê "Mêrxas" derket. Nivîskarê pirtûkê **Lokman Polat** e. Ew di nav weşanên Çanda Nûjen de hat weşandin. Nivîsîna kurteçîrokêن Polatî mîna kurteçîrokêن realist hatine nivîsandin. Yanê bûyer çawa diqewime wisan derbasî li ser kaxizê dibe, avadike. Pêkhanîn û avakirina wan xwe li gorî bûyeran ava dikin. Nivîskar

*P*olat aliyêن fantazî û romantîk giring nabîne, tenê rastiya jiyanê giring dibîne. Di hêla honandina bûyeran de bi hevûdu re girêdana bûyeran, nîvîskarî metodek baş bi kar haniye. Nîrxdan û qedirgirtin, hezkirin û rîzgirtina gerilla ji welêt re, li ber çavêن me radixe. Dema nîrxdan û qedirgirtin, hezkirin û rîzgirtineke me ji bo welêt nîn be, hingê li wê civatê, endamên civakê bi her hawayî ji hev dûr in. Malbat bela-wela ne û ta ku yar ji yar dûr dikeve. Tiştên ku Polat dixe nava vî tiştî rastiya jiyana rojane ye.

*M*edenî Ferho di nivîseke xwe de weha dibêje: "... Nivîskarên kurteçîrokan weke Firat Cewerî û Lokman Polat jiyana rojê, tevgera têr qerqeşûn tênine berçavan." Ev yeka han ji bo nivîskar Firat Cewerî ne rast e, lê ji bo nivîskar Lokman Polatî rast e. Çimkî, kurteçîrokêن Lokman Polatî li ser realîzmê, li ser rastiya jiyana rojane ava bûne. Herçiqas bi nav wekî çîrok bêne navkirin jî ev yeka han tu tiştekî naguhirîne. Kurteçîrokêن

Lokman Polatî bi motîfêن çandî, edebî, netewî û rêzanî hatine honandin, nexşandin û xemlandin. Lê yên Firat Cewerî li ser xewnperestiyê-xeyalê- fantazî û mutîfêن romantikî ava bûne. Eleqederen wan bi pirsa rastiya cîvakî re tune ye. Xeyalperestî, fantazî û realîzm du tiştên cihê ne, yanî li dijê hev in.

Bi baweriya min, di "Mêrxas"

de, tiştekî herî balkêş heye, warê teknîka raxistina temaya bûyeran e. Lewre jî xala giring e ku kurteçîrokên Polatî, ji kurteçîrokên fantazî û romantikî cihê dike; bûyerên siyasî û cîvakî ne. Mêrxas wek nobetdarekî Kurdistanê bûyer û qewimînan dibîne, jê dûrnakeve. Naveroka "Mêrxasî" bi motîfêن çandî, neteweyî, aborî, rêzanî û cîvakî ve hatiye xemlandin û honandin. Ji serî ta dawiyê, "Mêrxas" jiyan û berxwedanekê rojane li ber çavan radixe. Jiyan û berxwedaneke binamûs û bişeref. Ji nav vê jiyan û berxwedana neteweyî, bala min bi gelempêrî çû ser bûyerên dramatîk û trajedîk ên ku li derûdora Amedê(LicE) diqewimin." Ew bûyer û qewimînen ku bi destê dewletê çêdibin bûne sedemên xwîna hezaran. Mêrxas neşterê li vê birîna kûr dixe û li ser pirsa neteweyî radiweste. Naveroka mêrxasî pîralî ye; ew şirove

dike ku li Kurdistanê rojên giran qewimîne, gelek caran bûye reşebayî, bobelîsk û tofan rabûye. Herwisan nivîskar Polat, li ser bûyer û qewimînen li Kurdistanê fikiriye û wan bi motîfêن edebî û neteweyî ve xemlandiye. Diyar dike ku, tovê azadkirina Kurdistanê hatiye reşandin, her sal li dû hev ew tov hêşîn dibe, dibişkive , vedibe û şax dide.

Karê gerîllayî karekî dijwar e, ne karê herkesî ye. Çawa şivanek darê xwe digire û dere ber pez ne welo ye; derketina serê çiyan bi serê xwe mîrxasîyekê vekiriye û jê tu şik nîn e. Heger em bi temamî li naveroka hemû kurteçîrokên wî binêrin, baş bifikirin, em dê bêne ser vê fikirê, ku pirtûkên wî bi bîrûbaweriya xwe ve, bi merem û mebestên xwe ve parve dîbin ser komên jêrîn:

- 1) kurteçîrokên li pêşberî xwefiroşan, muxbîr, sixur; 2) çîrokên li hemberî hovî û jakawiya faşîzmê;
- 3) kurteçîrokên ronahîkirina şerê çekdarî û pêwîstbûna wî;
- 4) kurteçîrokên li pêşberî çavnebarî, dexsî û fesadî;
- 5) kurteçîrokên li ser hevaltî û hevrîtiya rasteqînî;
- 6) li ser fedakarî û xwekuştin ji bo xatirê serxwebûna Kurdistan û parastina karê rêxistinî/;
- 7) kurteçîrokên evîndariyê, dildariyê, xerîbî koçberî, wêrankirin û sîrgûnê.

Pirtûkê de van kurteçîrokên

jêrîn ci digirin:

1. Mêrxas(Mahmûd Cîhan)
2. Qetîlama Navçeya Licê
3. Tirajediyek Ecêp
4. Tîtaleka Darê
5. Li vir Xirab dîkin
6. Mucîze
7. Gerîllayekî Humanîst
8. Hevûdu dîtin
9. Ji sawcî Dawacî Me
10. Reşê Mirtib
11. Mêrikê Bêbext
12. Ez Çek Nagrim
13. Bêbextî Nake
14. Birûsk
15. Rihan
16. Xwe Avêt Nav Agirî
17. keça Elewî

Pirtûka Lokman Polat "Mêrxas"

100 rûpel e. Di bergê wê yê pêşîn de wêneya gerîllayek mîrxas heye. Di bergê wê yên paşîn de jî çend gotinên girîng yên Medenî Ferho li ser nivîskarî û berhemên Lokman Polat hene. Çapa yekem a pirtûkê li Stokholmê derketiye, çapa duyem jî dê li Stenbolê derkevê. Her Kurdê welatparêz divê vê pirtûka bi navê "Mêrxas" bixwine.

EVÎN Û CENG

Bi laleş dilnexweş im ez, tîra eşqê li dil da Dîlberekê bi nazdarî hat û çû û derbek da

Şip û lehî li min rakir, borana eşqê da der Cîhana min tev bû tarî ez dikim ax û keser

Terişande cergê min wê, hinavêñ min tev birîn

Wek Firat û Zap û Dicle dinalim ez dil-bixwîn

Bihara min hemû merez, digerim ez har û din

Ketim ez tora evînê dikim hewar û qêrin!

Şeng û şûxê evîna min, were maç kim te şêrin

Dil li ser te ey dîlberê wek volqan dide rivin!

Zerî hat û bi kemlanî, wê ji burcê xwe berda
Bi wan çavêñ reşûbelek nerî û awir veda

Li ser sênga cîhanê em, xwe palda û ez pê re
Min ser daniye ser zulfan û min dil vekir jê
re

Sor bûme ez weke kulîlk, ji niqurçkan-helperkê

Di gevzeka min û wê de nivîsand xwe dîrokê

Min girtin pêşir û guvaşt, kelya eşqa min fûrya

Herikî xwîn û xwêhdan jê, li ber çêbûn pir derya

Bi ava lêvîn evînê, çerxa zemên min gerand
Cîhan bî gulyêñ wê nav e, min girêda û hejand

Dişkenînim porê zérîn, maç dikim çavêñ belek

Me elastî û buhûrî kenya ye bayê felek

Laleş Qaso

Danasîna Kovarên Kurdî - 2

“ KOVARA GOVEND ” Alî YILDIZ

Lî gor min, kovara Govend di nav weşanên Kurdî de ciyékî xwe yê taybetî heye. Ev kovar li paytextê Kurdistanê, li Amedê(Diyarbekirê) derdikeve. Govend kovara Çandî û hunerî ye. Hetanî nûha 14 hejmar derketiye. Hejmarek ne têde, hemû hejmarên kovarê hatine qedexekirin û ji alî polîs ve hatine komkirin. Kovara Govend ji du mehan carekî derdikeve. Govend 32 rûpel e.

Birêvebirê kovarê Mazhar Kara dibêje: “Ji bo ku di kovarê de nivîs û meqaleyên Kurdî derdikevin, loma xişma dewletê tê ser me. Ji bo nivîsên Kurdî li me dawa vekirin, me dane mehkemeyê”

Mehmed UZUN ji bo kovara Govendê û birêvebirê kovarê Mazhar Kara weha dibêje: “.....Ew û hevalên wî li Diyarbekirê kovareke xwerû bi Kurdî, Govend, diweşînin, bi Kurdî dînîvisin û dixwînin. Li ser edebiyata klasîk a Kurdî hûr dibin. Xebateke weha li Diyarbekir, bi gotina dengbêjan “Diyarbekira xopan” ku ji aliye nivisîna Kurdî, ji mêt ve ye bêdeng bû, pir girîng e. Loma ji hem kovar, hem ji xebat û berhemên amadekarên wê li ber dilê min gelekî ezîz in.”

Xwedî û berpirsiyarê kovara Govendê Mazhar Kara bi nivîskar Mehmed Uzun re hevpeyvînek çêkiribû. Em ji vê hevpeyvînê gotinê ku ji bo kovara Govendê hatiyê gotin li jêr diweşînin. Bi van got nan ji qîmet û rûmeta kovara Govendê baş diyar dike.

Mezhar KARA : Ji bo GOVEND’ê û her wiha dezgehîn çandî û hunerî yê li welat çi difikirî?

Mehmed UZUN : Ji bo min, cîhekî xas ê GOVEND’ê heye. Her meh, bi çend zimanana, bi qasî bihîst kovaran têna mala min. Hinêna wan kovarên herî bedew û muteber ên cîhanê ne. Lê cîhê kovara we cîhê ye. Hîsên min ên GOVEND’ê pir taybetî ne. Ez nikarim bibêjim ku hîsên min rasyonel in, lê kovara we ya biçûk, ji bo min, sertac e. Ji ber ku hûn wê li Diyarbekirê, li dilê kurdan û kurdayetiye, derdixin. Ez rewşa we baş nizanim, lê ez ne bawer im ku îmkanêna we gelek in û însan bi qîmeta xebata we baş dizanin. Ü ez ne bawer im ku li pey we komên nivîskar û ronakbîran hene ku alîkari li xebata we dikin. Lê tevî vê yekê hûn kovarê diweşînin. Li Diyarbekirê bi

karekî weha rabûn hem pir pîroz, hem jî tarîxî ye.

Musa Anterê rehmetî ku di kuçeyeke teng û tari ya Diyarbekirê de hate kuştin, carina ji min re behsa "İleri Yurt" dikir. Wî û kekê Canîp (Canîp Yildirim) rojnama xwe li Diyarbekirê, di dawiya salên 1950-an de diweşandin. Kesên aligir nin bûn, kurdan ji şixulê wan fahm nedikirin, İmkanêñ aborî hema çi bigire tune bûn û dewlet û hêzên dewletê hertim, mîna şûrê Demokles li ser stûyê wan hilawestî bû. Lê wan rojnama xwe diweşandin û digihîstin mebesta xwe. "Hemû Tirkîye, Parlementoya Tirkîyê behsa rojnama me dikir" Apê Musa digot, "lê tiştê heri baş, min dizanîbû ku şêx Seîd, Doxtor Fuat û hevalên wan ku li Diyarbekirê hatin bi darvekirin, di gorêñ xwe yên ne diyar de, kêfxweş bûn. Rojnameyek ku bin destê neviyêñ wan derdiket û li ser şopa wan bû, nefesa wan, siya wan bi kurdan digîhand..." Ez nizanim ka ji vê pê ve gotin divê?

E we ji dil û can pîroz dikim û serfîraziya we, biserketina we dixwazim.

Em li jêr nivîsa **Bayram BOZYEL** ku li ser kovara govendê nivîsibû û bi tirkî di Rojnameya hefteyî **RONAHÎ** de hatibû weşandin, Kurdiya wê nivîsê bi kurtî pêşkêşê xwendevanan dikan. Me vê nivîsê ji tirkî wergerandiye kurdî.

GOVEND

Govend wek sirekî bi mane ye. Di meşa gelan a şanaz da rîtmeka helbestî ya nixamî ye, carna dikeve rengê reşâhiyeka xunavgirtî, dîmeneka ewrî û carna jî rîzbûneka lerzok e Govend. Wek ziman Govend jî, tevî ewqas guherînê li dinyayê, li hember berbabûna însan ên bêhejmar wek hişek pola ye, bêyî ku zeng bigire heyfîyen hezar salan kişandiye rojên îroyîn. Govend wek belgeyek ku ji kovika jîyanê hatibe werivandinê ye. Dîtina însan a lixwen-hêrtinê, li axê û esman-nihêrtinê dide xuyan. Li hember êş û kêfê stîleke dijberîyê ye. Li cîgeha Dicle û Firatê da, sosyo-kultura însan e, karaktera halê rûhî ya ku Hîlalê bîber afîrandiyê ye Govend.

*H*unera narin a destkarî, xwêdana enîyan û nûra çavan ên ku di zanina ronak a însan da hatine hevîrkirin e. Serborîya çanda heri xas di vê cografayê da şîn bû, li ber tava tûj û di nav bagerên dîrokê da hate hûnandin û guherîn. Yêñ ku hatin şewitandin û kambaxkirin, ên ku çûn ji giranîya xwe bêtir bi xwe ra birin û talan kirin, lê qeweta tu kesî negîhîstê ku koka vê darê hilkişînin û bibin. Herweha Govend kokek e, jîyanek e ku ji cîhê xwe, ji kûrahîya heft qat binê erdê nayê hilkişandin.

Însanîn îroyîn bêxem in, ji zanîna

tarîxê bêpar in û ev rewş însanan famekorî dike. Wek pelek ji şaxê xwe kerî, wek qocek ji koka xwe qetandî.

Govend, bi carekî çawa alîyê pûç ê însan derxist meydanê. Bêhtengiya ku komek bêheyecan, bêşahî dide meriv çiqas jî zor e. Hilbet dizanim ku Govend karekî serborîyan e. Wek meriv bi guran ra bi Donkişotî bikeve dîlanê. Li dinyaya Oblomovan û G.Samsayan ji Donkişotan ra cih tune. Dinyayek ku xewn, hêvî û şahî diqedin, pêwist nîne meriv destê xwe bike binê kevir. Gelek ramîyam û giham dawîya tixûbên berxwedanê.

Baş e, Govend hevrikîyek çawa dibîne? Hevrikîyek ku bi temamî li rastîya dinyayê tê. Hevrikîyek Oblomovî, ji nûjeniyê ra bêhest, pişta xwe daye hêvî û beranînê. Xuyaye ku têgîhîstina bêbaldarîya însanên bêcesaret hêsan e. Ez têdigihêm, ziwabûna ku qetlüyama ñonê û hilwesîna sosyalîzma rasteqîn peyda kir û tiştên ku bi xwe ra bir tedigihêm. Xwendin? Çend kes kare ji karên pratîkî demek vala vejetîne? Ziman, huner bi temamî bûye fantazî, bûye karê Teyrên keçelok.

Têgîhîstina Govendê karekî cesaretê ye û ya herî girîng ji zanîn dixwaze. Ger însan jîyanekê li gor xeteran serûber bike, bi vê tirsê dihele diçe. Heta ku emrê wî hebe serdana gundekî herî nêz ji ji xwe ra qedexe bike!. Çi dibe çi nabe, nikaribe rojname jî bibe mala

xwel. Yê ku tabela wî hebe, nikare here sazîyen xeter, rojek ji rojan bi dengekî bilind nikare bêje "Biji, bijî!"

Bi awayekî diyalektîka serdemên beranînê nizane. Gelo meriv kare bi navê kemilandineke çareçar hewldanên beranînê biçûk bixîne û bi vî şêweyî têbigihê? Tê ji bîr kirin ku her kemilandinek çareçar xwedi serdemek zarotîyê, her berhemek girîng xwedi serdemek gîhîstînê û ya herî girîng ji, hemû hêjayîyên mezin bera civînekên biçûk ên bêhejmar in. Wisa xuyaye ku tê ji bîr kirin, lewra ev mekanîzmaya parastinê ya bêberîyê ye. Psîkoza însanê ku nikare xwe bide cehd û xebatên dûr û dirêj dertê holê. Ji ber ku nikare biafirîne, di bin barê neafirandêrîyê da ditewe, lewra qalikê wi vala ye, li vi ali wi ali berba dibe.

Karê beranîn û afirandêrîyê dijwar e, helwest dixwaze, wek ku meriv li ser erda qumbelekirî (mayinkirî) bimeşe û temaşa stêrkan bike. Govend xewnek e, di pêvajoya xeyalkirina cudahîyên zarotî nîşan dide, carna daxwaza însanê nûjen dide ber qamçîyan. Nakeve zeftê, hevrikî nayê famkirin tu caran, herwekî ku Govend nayê têgîhîstîn. Cendekan ji ser rîyan rakin, goştên berate yên hêvînemayı rakin, xwe bidin ali. Bi sînga xwe ya pifdayî, enîvekirî, çavên wî li pişta aso ye û dimeşe, dimeşe ked, berxwedan, zanîn, dimeşe însan, berbi cîhê ku însan dibe INSAN.

HELWEST — Kovara Çand û edebiyata Kurdî

Samed Behrengî
ÇÎVANOKA EVÎNÊ

Pirtûkên Ji Bo Zarokan

Zarokno bi zimanê Kurdî bixwînin. Xwendina
zimanê zikmakî ji bo hemû zarokan pêwîst e.

Hûn jî bixwînin!

RINDO Û MIŞKO – Ulf Löfgren

NÊÇÎRA ROVÎ – Sven Nordqvist

ŞERVANÊ BIÇÜK – Nguyen Than

ZAROKÊN ŞEVÊ – Jack London

MÎRZAYÊ BIÇÜK – A. S. Exupêry

KEÇELÊ KEVOKVAN – S. Behrengî

ALIKO Û BAZ – Baran

EFSANEYA ŞAHMARAN – L. Polat

Hûn van pirtûkan dikarin ji weşanxaneyâ

ÇANDA NÖJEN bixwazin.

Navnîşana Xwestinê : Tensta Alle 43-2tr. 16364 Spanga /Sweden

Tel / Fax : 08 - 7618433

ZAROKNO BIXWÎNIN !

HELWEST
Kovara Çand û Edebiyata Kurdi
Hejmar / No: 4 — Sal / Year - Hezîran - 1996



Lokman POLAT

TÎRÊJÎN HÊVÎYÊ

Derdikeve
Weşanên Çanda Nûjen



Helwest = ISSN - 1400 - 9404